

**MEMÊ BÊ ZÎN**

*MEMÊ BÊ ZÎN*

Helîm YÛSIV

Weşanên Peywend: 33 | çîrok: 8

Edîtorê Kitêbê: Dawud Rêbiwar

Redaksiyon: Peywend

Berg & Rûpelsazî: Peywend

ISBN: ?????

© Weşanên Peywend & Helîm Yûsiv

Çapa Yekem: Avesta, 2003, Stenbol

Çapa Duyem: Peywend, 2016, Stenbol

Çap:

Sadık Daşdöğen – Berdan Matbaacılık

Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.

C Blok No: 215-216, Topkapı / İstanbul

Tel: (0212) 613 12 11

**PEYWEND**

Şemal Medya – Kuloğlu Mah. Sadri Alışık Sk.

No: 16/51 Beyoğlu / İSTANBUL

Tel: 0532 176 93 64

E-mail: peywend@hotmail.com

Sertifika No: 28947

# MEMÊ BÊ ZÎN

---

HELÎM YÛSIV

**Helîm Yûsiv** - Di sala 1967'an de li Amûdê, rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Li Zanîngeha Helebê Fakulteya Hiqûqê qedandiyê û ji sala 2000'î ve li Elmanyayê dijî. Bi dehan gotarên wî yên wêjeyî di kovar û rojnameyên erebî û kurdî de weşiyane. Heta niha berhemên wî bi kurdî, erebî, tirkî û elmanî çap bûne. Ji nivîsên wî bi navê “Komara Dînan”, “Bidarvekirina Pozekî” û “Sol û Serî” wekî listikên şanoyê hatine çêkirin.

**Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

*Mêrê Avis* (çîrok, bi erebî 1991, bi kurdî 1997)

*Jinên Qatên Bilind* (çîrok, bi erebî 1995, bi kurdî 1998)

*Mirî Ranazîn* (çîrok, 1996)

*Sobarto* (roman, 1999)

*Memê bê Zîn* (çîrok, 2003)

*Tirsa Bêdiran* (roman, 2006)

*Gava ku Masî Tî Dibin* (roman, 2008)

*Romana Kurdî* (lêkolîn, 2011)

*Ausländer Beg* (çîrok, 2011)

*99 Morîkên Belavbûyî* (roman, 2015)

## NAVEROK

Hezkirineke Teknolojîk.....	7
Giriyê li Medbexê .....	13
Welatê Sêyem .....	21
Şoreşên Oda Biçûçik.....	29
Çavên Bavê Min .....	31
Sênîka Sincirî .....	35
Xewna Mihemedê Hunermend .....	37
Dema Hezkirin Xwe Dixwe.....	42
Jina Heftserî.....	51
Sînorên Bombekirî.....	54
Meha Sêzdehan .....	61
Gerînok.....	71
Berlîn Bêçav e.....	79
Segbav .....	91
Sol û Serî .....	99



## HEZKIRINEKE TEKNOLOJÎK

Sê mehên wî li Ewropayê derbas bûbûn. Di van sê mehan de sê hezar sal mezin bûbû. Sê hezar carî ji xwe re digot:

- Gelo ev bû Ewropaya ku ji min re bûbû xewn?

Rojê bi kêmanî sê caran ew herdu polisên xwînsar ku ew di rojê de ji xew rakiribûn dihatin bîra wî. Yekî ji wan rûpelekî spî li ber raxistibû û digot:

- Ev zagonên me ne û te tevde bînpê kirine. Em ê îro te vegeînin cihê ku tu jê hatî.

Têgihîşt ku mebesta wan ji “cihê ku tu jê hatî” nav lingên diya wî ye û bi rastî peyva xwe bi cih anîn. Ew avêtin devereke tarî, bêdeng û teng. Ew ji çermekî derdixistin û dixistin çermekî din. Berî ku bê, ji xwe re digot, nîvê tememê min bi kûçkanî derbas bû û aniha dem hatiye ez xwe li van sînorên qedexe xînim û berê xwe bidim warê aramî û xweşiyê. Eger ez sax gihiştim wê derê, ez salên mayî ji temenê xwe qezenc dikim. Jixwe ku ez mirim, ne tiştek li tevgera xelkê li vê dinyaya fireh zêde dibe, ne jî kêma dibe. Weha biryar stand û berî mirinekê gihişt bihuşta mezin. Lê di balafirxanê de dema polisên vê bihuştê ew tazî kirin û lepik xistin destên xwe û li hemû qulik milikên wî û çentê wî geriyan nas kir ku rê şaş kiriye. Piştî şopên tiliyên wî girtin û ew -weke gelekên din- ajotin ber bi vê kampa kev-

nik de. Kamp li gundekî ye. Gund bi sedan kîlometran ji bajêr dûr e, kamp jî hîn li derveyî gund e.

Pê re efrîqî, elbanî, viêtnamî, qereçî, ereb, îranî, efganî û heta bi çîniyan hebûn. Piştî demeke kin ji pirsên karmendekî -an qadiyekî- lê xuya dikir ku wî bi hatina xwe ya vî welatî li talanê bavê wî xistiye, bersiveke neyênî jê re hat. Divê bi salan li benda dadgehê bimîne. Di vê dema dirêj de derketina zêdeyî sîh kîlometreyî jê re qedexa ye. Çawa li welêt ji ber Muxaberat û polîsan **qûna qûna** dimeşiya, li vê bihuşta mezin jî diviya xwe ji ber polîsan bide alî.

Polîs man, polîs û lingên li hewa her man li hewa. Li vê bihuşta mezin jî bihostek erda hişk têra lingên wî tunebû. Dema serê mehê li kampê, li ber wî deriyê hesinî, di rêzê de li benda pera dima, sê hezar car di sê deqeyan de dimir, lê dikarî çi bikira? Êdî ji bo her tiştî dem qediyabû û dereng bû. Tenê telefon ji welêt re vedikirin û telefoneke destan weke her penaberî ji xwe re kiribû. Li welêt, diya wî li nav cîranan belav kiribû ku lawê wê saxlem gihîştiye bihuştê. Erê, weke xeynî xwe pera naşîne lê dîsa perê wî hene. Bi cih bûye û telefona wî ya destan jî heye! Diya wî weha peyvên xwe bi dawî dikirin:

- Jixwe li wê derê hema qe nebe Muxaberat tune ne.

Hevalekî wî, li bajarekî din telefon jê re vekir da ku bê serdana wî. Hemû agahiyên pêwîst jê standin û bi kêfxweşî ji hundurê sîh kîlometrê ne qedexa derket. Li welêt jî weha bû, dema her tişt li welatekî dijî mirov be, xweşiya herî mezin dibê bînpêkirina zagon magonên weha şeloşetî yên wî welatî. Nemaze ku hevalê wî yê zarotiyê li stasyona bajarê ku lê dimîne li benda wî be. Wê jê re berî her tiştî behsa vê buyerên dawiyê bike. Herdu polîsên xwînsar çawa ew ji xwe veciniqandin û xwestin wî vegehrînin cihe berê (...) wê hevalê wî jî bikene. Wê bibêje:

- Cihê berê, nav lingên dê, di destê bav de ye bavo.

Wê ji havalê xwe re bibêje çawa ew avêtin wê oda biçûk, tarî, teng û genî ku têra sê mirovan nedikir, sîh mirov tê de dihepişandin. Ji piya radizan. Ji bêhna hev zivêr dibûn. Bi xwe û bi her tiştî dikufirîn. Xwekuştin bi dest tu kesî nediket. Lê va ye ew sipîsax gihîştiye bihuştê. Hetanî kete trêne jî bi peyva “bihuştê”, bi xwe û bi aqilê



xwe yê berê dikeniya, lê niha piştî ku serê xwe rakir û li keça li ser kursiyê hember xwe rûniştî nihêrî bawer kir ku êdî ev der bihuşt e û ev firîşteya çavkesk, rû spî û sor, lêv tenik, devliken, por zêr û xwînşêrîn horiyek ji horiyên vê bihuştê ye. Hingî keçik jê re paqij xuyanî dikir, ji ber cilên xwe fedî kir. Di xwe û wê de diramiya. Ev çi qeder e ku du dil tenê di van hemû kursiyên vala de anîne cem hev. Kurpîna dilê wî zêde bû gava keçika xweşik bi du çavên spehî, sert, kesk, germ û dijwar bi awireke tûj lê nihêrî. Xwêdan pê ket. Xwe ji çîrokeke evînî û efsaneyî re amade kir. Hate bîra wî ku bi zimanê wê nizane. Dilê wî di nav tiliyên kalekî mirî yên hişkbûyî de dihate guvaştin. Zimanê min ê îngilîzî ne xerabe. Çend gotinên min hene ez ê lê xerc bikim. Wê têra naskirinê û soza hevdîtineke dî bikin. Jixwe evîn mîna muzîkê zimanekî gerdûnî ye. Va ye çavên me bi hev re dipeyivin. Du giyan bi hev re ketine têkiliyê. Du dil bi kenê sivik yê ser lêvên wê kulîlka spî û sor belav dibûn. Gelo bi min re dikene yan bi hinekên din re? Li derdora xwe zivirî, ew tenêbû. Germayîyeke seyr xwe berdabû xwîna wî. Dilek li hemberî wî bû. Kaniyên jiyana ku sê çar metroyan dûrî wî diteqiyen ew şerpeze kiribûn. Keçikê xwe dirêj kiribû. Her lingên xwe sipartibûn piştî kursiyê li hember xwe û destên wê di nav kabokên wê de winda bûbûn. Ji wî we ye ku pirtûkê dixwîne, lê tu pirtûk tune bû pê re, ji ber ku carna destekî xwe dirêjî biskên xwe dikir û bi nazdariyeke ku şewt û jan berdida nava wî. Bisk ji ser dêmên gulgulî didan alî. Ev çawa duh ji min re digotin kêfa xelkên vê derê ji biyaniyan re nayê. Naxwe ev çi ken e ku ev horiya hember min dike û bi awirên şermokî serê xwe berdide ber xwe. Helbet dizane ez biyanî me û porên min ên reş ji kîlometrekê xuya ye. Lê ez ê ji ku derê dest pê bikim? Ez ê bêjim, ez kurd im. Dibe ku kurdan nas neke. Ez ê bêjim ez ji Kurdistanê hatime. Eger pîrsa welatê min kir, heta ku têbigihîje divê ez qala dewletên din bikim. Iraq, Îran, Tirkî û Sûrî. Ez ê bêjim ez ji beşekî ji vî welatê perçekirî me û bêyî ku ez serê te biêşînim ez ji mîna bi sedan kesan reviyame. Min tiştêk qenc an xerab kiriye ez nizanim, lê tenê ez dizanim va ye ez sax gihîştîme vir û va ye Xwedê weke xelateke buha tu ji min re şandî. Ango heta nas bike ez ji ku derê me divê ez dîroka kevn û nû ya Kurdistanê jê re bêjim. Ez hinekî rewşa siyaseta Rojhilata Navîn

û eeeew, serê min êşiya. Çi kambax e mesele, bi Xwedê hema ne tu hal e û hew. Cênîkên min ji siyasetê diêşin û heta yek min nas bike divê ez jê re qala siyasetê bikim. Ev nekete serê min, lê ji sedî sed wê bi bipirse ka ez kî me û ji ku derê hatime. Wê çaxê divê yekser ez berî siyasetê berê wê bidim evînê. Çi heqê min lê heye ez ewqas tiştên xemgîn jê re bêjim. Ew guhên tenik tenê ji bo bihîstina helbestan û ji bona lêvên min çêbûne. Tenê ez ê li hejmara telefona wê bipirsim û ez ê di nava telefona xwe ya dest de binivîsînim û mesele qediya. Keçka devliken serê xwe dihejand û dikeniya. Trên difiriya û pê re ew jî dibû bi bask. Jinika kontrolê hat, ew ji nav xwêdan û xeyala wî derxist. Keçikê gava ku karta xwe da destê jinikê dîsa di bin çavan re lê nihêrî. Ji hatina jinikê zivêr bû weke mêvanekî bêyî ku li derî xîne derbas be nav cihê wî û yara wî ya tazî. Jinik çû, ew pê re vejeriya hevpeyvîna dijwar ya çav, lêv, mijank, giyan û dilan. Keçik bi kêf bû. Deryayek ji spehîbûnê û pûtekî bilind ji evîneke bê nav bû. Dema keçik dikeniya û serê xwe berdida ber xwe li nav kabokan dinêrî ew jî pê re diheyirî. Gelo ev çima ewqasî fedyok e? Dibe ku wê pel bi dest xwe ve girtiye û jê re hinek hevokên xweş dinivîsîne. Serê wî tevlihev bû. Di temenê mirov de dibe ku carekê li derfeteke weha rast bê. Divê ji dest neçe. Destê xwe xiste bêrîka xwe û telefona xwe, weke ku destê wê be, bi tiliyên xwe eciqand da ku dilê xwe di cih xîne ku êdî telefon pê re ye û dikare li hejmara telefona wê bipirse û yekser binivîsîne. Diya wî hate bîra wî, wê jê re bêje. Dayê rast e, ev der bihuşt e û va ye li horiyekê, tu ne bixwî ne vexwî, tenê ji xwe re lê binêrî, rast hatiye. Li ser jinên spehî diya wî weha digot. Pê re keçik him destekî xwe datanî ser sînga xwe û him destê dî di nav kabokên wê de bû û diramiya. Keçik bi xeyala xwe re dûr çûbû. Di her deqeyekê de pêncî carî hewl dida xwe ji bo rabe biçê cem. Kêlîka ku lingên wî rahiştin wî û ji nav derya evîn, xeyal û xwêdana xwe rabû da ku here cem keçikê bi lez destên xwe ji nav kabokên xwe derxistin. Mesaja dawî ya di telefona xwe ya dest de xwend û weke birûskê ji trêna rawestiyayî daket û bêyî ku bizîvire.. çû. Vî dîmenî destê wî li telefona wî ya dest şidandibû. Dihat ku telefona xwe mîna hevîrekî kevn di nav tiliyên xwe de biperçiqîne. Di kêlîkekê de her tişt fêh kir. Naxwe vê keçika hember min mesaj bi telefona xwe ya

dest ji dostekî xwe re dişandin. Weha jî bersiv dixwendin û dikeniya. Naxwe qet haya keçikê ne ji wî ne jî ji lehiyên evînê yên di çavên wî de şax dabûn de hebû. Naxwe... Naxwe... hema bilez pencera trêne vekir û telefona xwe ya dest, heta ku jê hat dûr avêt û di cih de rûnişt. Nema zanibû çi dika. Di nav mijeke reş de winda bûbû. Hate bîra wî ku divê biçe cem hevalê xwe, lê nema zanibû gelo trêna gihîştîye wî bajarî yan na. Li wan deveran çû û hat. Pêjna kesekî nedihat. Tikî tenê di wê trêna vala de, di wê şeva sar de, rêwîtiya wî dûrûdirejî hev bûbû. Trêna nema disekinî û rewrewkên reş nema pencên xwe ji çavên wî û ji mejiyê wî derdixistin. Nema zanibû ne xewn e ne jî rastî ye. Hemû wêneyên jiyana wî mîna filmekî tirsê serê wî zivirandin û weke qurmê dara ku ji binî de bê birîn hate xwar. Piştî sê saetan, weke ku di mirineke sê hezar sal dirêj de be, veciniqî. Du polîsên xwînsar ew ji xew rakirin û pelekî spî li ber raxistin. Yekî ji wan got:

“Ev zagonên me ne û va ye te tevde binpê kirine. Tu zêdeyî sîh kîlometrî derketî. Ev ji bo te qedexe ye. Em ê îro te vegehin cihê ku tu jê hatî.”

Ew jî mabû heyirî û ji xwe dipirsî. Gelo ev jî, weke wanên din, li nav lingên diya min dibêjin yan li ser devereke din?

Hîn di trênan de, li ser riyana, li bersivê digere.



## GIRIYÊ LI MEDBEXÊ

Diya wî di sed sala şazdehan de miribû. Ev çar sed salên wî derbas bûne ku tê serdana vê goristanê. Navê wê kiribû **Şermola**. Ne ew û ne tu kes wateya vî navî nizanin. Lê tiştê ku dizane ew e ku termê diya wî li ser sicada nimêja nîvro dirêj bûbû û ew li ser laşê wê civiya-bûn. Şeş dest bi hev re ketibûn bêrika laşê wê. Li kilîta sebeta wê ya kevin digeriyan. Berekat veciniqîbû. Herdu destên wî weke herdem dilerizîn, ji bo girî berê xwe dabû medbexê. Nizanîbû çima wilo bi serê wî dihat û çima li medbexê bi xwe digiriya. Pazdeh tiliyên ku xwîna reş ji wan diniqutî ji bêrikê derketin. Li her sê destên bi xwîn dinêrî. Wî digot qey ew dest li dora qirika wî hatine pêçan û dixwazin wî bixeniqînin. Dema ku strî di bêrika diya xwe ya mirî de dîtin mat ma û ji xwe pirsî:

- Çima berî mirina xwe, strî di bêrika xwe de veşartibûn?

Mîna kurman gav bi gav pirs bi rûyê wî ve hildiperikîn. Bi xwe dihesiya ku ew pirseke mezin e li ser du lingan dimeşe. Di vê jiyânê de, ji bilî pirsan çi li cem wî hebû? Mirina seyr ya bavê wî hate bîra wî. Dibe ku berî zayînê miribe û dibe ku piştî zayînê be jî. Nizane. Tiştê ku dizane ew e ku... law bavê xwe dixwin.

Bav westiyayî vegeriya malê. Dest bi karê xwe yê rojane kir. Ji gava ku dest bi kolana goran kiriye, ev yek jê re bûye kar. Mîna nexweşekî bêhiş ji nişka ve herdu pehniyên xwe didan dîwêr û li ser destên xwe

dimeşiya. Piştî çûn û hatina li ser destan, li hewşê paldayî dima û çend hûrdeman herdu kabokên xwe hembêz dikir û dûr dûr dinêrî. Her ku gora jineke spehî dikola, hişê xwe winda dikir.

Ji kirinên wî yên li malê zarok têdigihîştin, bê ka çi li goristanê qewimiye. Carinan xemgîn vedigeriya malê. Ji jina xwe re li ser rewşa miriyan dipeyivî, digot ku bi hezaran didin dû laşê kûçikekî, lê tu kes nade dû laşê kesekî perîşan û dest bi meşa xwe ya pêlewani dikir. Tevde li ber wî mat diman. Lê hêdî hêdî jin û zarokên wî nema guh didan vê meşa wî ya berevajî:

- Îro ji dêvla laşê jinekê, laşê dêlikê veşartin, min tenê dît. Tenê ez.. dizanim çima wilo dibe. Tenê.. tenê ez rastiya dinyayê dibînim. Tenê dibînim ku cîhan berevajî ye. Jinik bi yarê xwe re reviyabû. Me-sele ev e. Û dawî ev dêlika bêguneh di bin axê de veşartin û digotin me keça xwe ya mirî veşart.

Berê xwe da dîwêr, bi sivikayiya kuliyekî qevazt. Vê carê bi ser serê xwe de ket. Serê xwe danîbû erdê û herdu lingên xwe yên dirêj sipartibûn dîwêr. Herdu zendên wî ji piyên wî ketin. Destên wî, bêxwîn, ji zendên wî dûr ketin. Li ber lerizandina jina wî herdu dest li ser pêçiyên dimeşiyên. Ji nû ve her dest li zendê xwe vegeriya, her destek bûbû darek. Li ber derî du darên bilind şîn hatin, laşê wî yê textikî berevajî mabû. Rojekê wilo ma bêyî ku kes nêzîkî wî bibe. Ji ber tîrsa ku li ber derî cih girtibû, nema jina wî ji nimêjê qut dibû, ji ber hetîketiyê lawên wî li ser vê rewşê nedipeyivîn. Jina wî nêzîkayî lê kir, mîna textikekî kevin laşê wî bédeng hate xwar, şûna çavên wî vala mabû. Dê bi tenê dîtîbû ku çavên mêrê wê ji serê wî yê berevajî dûr ketin û bi banê oda zarokan ve hilkişiyên û mîna du kamerayan li jor vekirî mabûn. Li ber zimanê wî yê ku ji devê wî kişiyayî mat mabûn. Weke ku henekê xwe bi hinekan dikir. Lê tiştê ku hişê wan winda kiribû ew bû ku gava destê xwe gihandin laşê wî, laş mîna ard dibû tozeke spî. Lawên wî li hev du nihêrîn, kî bawer dike ku bavê wan bûye ardekî hûr? Pilindir ji ser şaxê ku di derî re derbas dibû bi lez ketibû erdê. Dê ew nas kir. Pilindir wek destê mêrê wê yê mirî bû. Dê rahişte pel. Têgihîşt ku ev peyvên mêrê wê ne. Mêrê ku bûbû komek ard. Piştî ku xwend heyirî mabû. Wesiyeta xwe bi çend peyvên nîvisandibû:

### *Wesiyeta min a dawî*

Vî ardî têxin teşteke biçûk, bikin hevîr, bistirin. Têxin tenû-reke germ. Wî bikine nanine biçûk û bixwin. Eger hûn min nexwin ez razî nabim. Tiştêk tenê besî min e ku min bi hezaran gor kolan û tu kesî gora min nekola.

Yê ku temen da we.

### **Zarayê Kal**

Dê li zarokên xwe nihêrî. Li gor vê wesiyeta seyr divê ku ew bavê xwe bixwin. Lawê mezin ji wan xwest ku vê rewşa xwe li ber kale-mêrekî dîndar raxînin da bi şêwr û şîretên wî bikin. Lê yekî jî ev nepejirand, çimkî tiştê li vê mala seyr a ku li vî cihê jibîrbûyî avêtiye, diqewime nayê bawerkirin û ev çîrok ji kê re were gotin, wê weke dînekî li wan binêre. Tev bédeng man, wesiyet bi cih anîn. Çêja vî nanî ne normal bû û ew tev hatine guhertin. Wî nanî bandora xwe gehand dil, mejî û rûyên wan. Tiştê balkêş ew bû ku lawan bavê xwe xwarin bêyî ku bi guneh **bihestin**. Ji bilî vî, Berekatê biçûkê birayan dîsa berê xwe da medbexê û dest bi girî kir.

Bira diya mirî didin ber talanê. Ji Berekat re, li ser pevçûna bira û şerê wan ê li ser malê bavê mirî, gelek caran çîrokên **nayên bawerkirin** hatine gotin. Zêdeyî carekê bihîstiye ku birê bira kuştiye. Lê tiştê ku li vê malê diqewimî ji wan çîrokan hîn girantir bû. Û ji ber ku biçûkê bira bû, nikarîbû bandora xwe li tu kesî bike. Xwe didît ku di meydana şer de tazî ye. Birayên wî cihê gora diya xwe ji bîr kiribûn, karê wan bûbû gera li kilîta **sebetan**. Dê û libendemana şînbûna dara bavê. Ew bi tenê her pêncşem weke xeynî xwe ji xwediyan miriyan, li ber gora diya xwe rawestayîbû û her tişt tanî zimên. Hinekan digot ew dîn e. Birayên wî yên ku li ser tu tiştî li hev nedikirin, li ser vê yekê gihan hev û gotin ku ev birayê wan yê biçûk Berekat, piçka bereketê tê de nîne yan na ma ev çima ewqas deyndar tîn û deynên xwe yên li Berekat ji wan dixwazin.

Tev di hewşekê de bi cih bûbûn. Her yekî û zarokên xwe deverek ji hewşê ji xwe re girtibû, ji bilî Berekatê bêjin û bi tenê, yê ku ji xwe re bi darê zorê ev oda piçûk peyda kiribû. Ode bi fotografên

jinên lîstikvan û tazî hatibû xemilandin. Û ji bilî karê daleqandina wêneyên hunermendên cîhanî yên bi nav û deng. Kêm kes dizanin, ku Berekat helbestan jî dinivisîne, tê serdana goran û libên Operval vedixwe. Rojekê ew ji xew rakirin:

- Hûn çi dixwazin?

Ev cara yekemîn e ku her sê birayên wî yekdest in. Weke zarokekî delalî mezinê wan sebeta diya xwe hembêz kiribû. Tevde ji wî xwestin ku berê wan bide gora diya wan. Ji guherîna birayên xwe ecêb mabû û ji xwe dipirsî: Gelo hestên mirovan îro bi wan re peyde bûne ku îro diya wan hate bîra wan.

Ji bandora vê ramanê çavên wî tijî hêsir bûn. Xuya ye ku wê sebeta wê lê vegehrînin û lêborînê li ser pevçûnên xwe ji diya xwe bixwazin. Bêyî ku devê xwe veke birayên wî dabûne dû. Berê wan li goristanê li cihê gora diya wan bû. Bi kêfxweşî giş cihê gora diya xwe nas dikin. Wê rojê Berekat tiştêk fêm nekiribû. Lê tiştê ku pêncşema din dîtibû saweke mezin xistibû nava wî. Dît ku gora diya wî vekirî ye û dewsa kolan, lêgerîn û neynûkan li derdora gora xirakirî diyar e. Wê gavê Berekat her tişt fêm kir. Pê dihesiya ku textikekî kurmî di zengelorka wî de asê maye. Ne derdikeve, ne jî diçe xwarê. Birayên wî gor vekirine û ji bo dîtina kilîta sebeta girtî tabût û laşê dê ji hev xistine. Kilît jî di bêrika wî de ye. Wê roja dûr diya wî jê re gotibû:

- Guh bide min, lawo! Çavên birayên te gişan li sebetê ye, lê ew nizanin çi di hundurê wê de ye. Ez ditirsim ku piştî ez bimirim, eger ne bi te re be, ew ê li ser kilîtê hev du bikujin. Û ji bo yek yê dinê nekuje, bila kilît li cem te bimîne, ne ji ber ku tu biçûkê wan î, na lêbelê ji ber ku tu qencê wan î.

Ji nişka ve Berekat xwe dît ku li medbexê bi şewat digirî. Di rewşa dinyayê diramiya. Kirinên birayên xwe didane hemberî karê diya xwe û qiriktaliya wê ya ji bo wan.

Wax... Xwedêyo! Çawa di malbatekê de ewqas paqijî û ewqes qirêjî tên cem hev? Dayê, gelo rojekê van jî şîrê te vexwarine? Teqreqa sebeta dê, ya ko birayên wî dişkenandin, ew ji giriyê tal û dirêj ya li medbexê şiyar kir. Her sê destên bi xwîn yên ku wê rojê dirêjî bêrika laşê dê dibûn duh xwestin ku tiştên di sebetê de li hev du par bikin.



Îro sebet dane ber çakûçan. Lê pelikên kevin û nivîsên belavbûyî ew vecinîqandin. Birayên li benda zêr û pera li pelên zerbûyî rast hatin. Pend û şîretên dê bûn. Ji lawên xwe dixwest ku li herdu daran Xwedî derkevin. Da riyên xweşiyê li ber wan vebin. Lê eger ziyane bigihînin daran, wê mar û dûpişk li malên wan bizên û wê jehr jiyana wan xira bike. Wisa Şêx Mihdî ji wan re gotibû. Piştî çend rojan darek ji wan rût û zuha mabû, her ku yek ji wan nêzîkî darê dibû, şaxên wê dilebitûn, dixwest şeqaman li wan xîne. Mezinê wan sond xwar ku dar bûye cihê mar û dûpişkan û divê were qutkirin. Lê dema ku Şêx Mihdiyê mezin bihîst ji wan re got:

- Qutkirina vê darê wê koka vê malbatê ji binî de biqelîne û yek wê li dû yê din bimire. Hetanî ku cîran jî ji ziyane nayên parastin. Lê tiştê bala wan kişand ew bû ku her Berekat di ber darê re dimeşe, dar şaxên xwe sist dikin. Gumanan di mejiyên wan de govend gerandin ku ji bilî Berekat tu kes raza vê darê nas nake. Erê ev Berekatê ku piçka bereketê tê de nîne. Di nav xwe de navê wê kirin dara şer. Xwe jê diparastin. Şîret li jin û zarokên xwe dikirin da nêzîkî wê nebin. Nexasim piştî ku kund şev bi şev ev dar ji xwe re kiribû war. Qêrînekê Biro ji ser livînê rakir:

- Kund giyanê diya te ya mirî ye.

Qêrîn winda bû.

Li derdora canê wî balindeyî êşeke kor çiriya. Periyên reş di beyabana canê wî de belav kirin, darên bav, wesiyetên dê û canê wê, balindeyên wê. Gelo tiştên ku di jiyana wan de qewimîn ne bes in? Ji xwe dipirsî, gelo dê û bavên mirî tevde didin pey zarokên xwe? Serê wî di destê zarokekî windayî de bûbû nepox. Berê xwe da medbexê. Ji bo ku negirî serê xwe xistibû nav avê. Wê kêlikê girî êrîş kiribû. Por û rûyê xwe ziwa kirin. Li ser dêmên wî hêsrên germ herikîn. Ev cara pêşî ye ku di giriyê xwe de diramiya, negiha tiştêkî, lê hêrseke reş xwe ji ezmanê sînga wî dabû alî. Vegeriya oda xwe. Fotografên jinên xweşik û tazî û germ bi dîwar ve daleqandin. Devê xwe ber bi çiçikên tazî yên fotograf ve biribû. Xwest serê çiçikê li derveyî bermemikan gez bike. Lêvên wî li ser wêneyê sar, ziwa mabûn. Ji bo helbestekê binivîsîne rahiştibû pênûsê, nikarîbû. Ji nav qutiyên derman ên vala

û pelên helbestên ku tu kes naxwîne çend lib avêtibûn devê xwe, li diya xwe ya mirî diramiya. Diya canxweşik, diltenik û dest pê kir...

Birayê biçûk canê xwe tazî dike:

Dayê, çima canê te bûye kund? Kund? Û nebûye kevok an çivîk? Min tim li wateya herdu daran dipirsî û wateya ku tu bibî birayê kesine ku ji bilî xwe tu tiştî nas nakin. Kê gotiye xwîn nabe av? Kî ye xwediyê vê derewa mezin? Li ber berjewendiyan xwîn dibe mîz jî. Çiqasî bêhiş e ev êrîşa mezin û bê ol a ku ji bo danheva pera li dar ketiye. Kî dizane? Dibe ku mirovê herî bêhiş ez bim, yan na ma çima min xwe ji dehê kolanan bêrî kiriye. Min xwe ji wan qut kiriye. Da ku ez li deyndaran rast neyê. Gelo çima ji her tiştî bêtir ez bi gorê ve hatime girêdan? Û birayên min cihê gora diya xwe, ya ku temenê xwe di ber wan de şewitandibû, ji bîr kirine. Kê gotiye ez ne nexweş im? Nexweşiya min ew e ku ez bi miriyan ve girêdayî me. Çima ez eşkere napeyivim û nabêjim ku ji min re goristan ji her deverê xweştir e. Di nav xelkê de tenê tê min dikuje. Tenêtiya rojê xirabtir e ji ya şevê, li gel ku şev carna hevaleke delal e û ez ji tariyê hez dikim û avjenî di nav reşayiyê de xweş e. Ji ronahiyê hêrs dibim nemaze dema xelk derewan li ser têlên wê radixînin. Û ...û jin... Berekato! Di şevê de jin renekî din distînin. Wa... Xwedê, çima şevîn, her gav di xwîna min de belav dibe? Çima min û vê gora jibîrbûyî tenê nahêle? Şevînê... dev ji min berde, ma ne bes e ku te ez kirime kavi? Ma ez giliyê te li ber vê şevê bikim? Ev şeva ku mîna sêwiyekî ez xistime hambêza xwe. Te ji min re digot, tê li welatekî firehtir û xweşiktir bigerî, tê bîra te!

Min digot, qey tu welatekî Berekat, lê tu li ber çavê min bûyî welatekî biçûk û ez li welatekî digirim ku karibe min hambêz bike.

Min pirsra wî welatî ji te fikir. Te berê xwe dida çiya û te digot:

- Li wir... ez ê şer bikim, heta ku dilê min azad bibe.

Wê gavê min xwe gelekî biçûk didît. Mîna kêzikekê qefilî li ber tîrêjên çavên te dilerizim. Gelo bi rastî ez mêr im? Ew qerebalixa li ser lehengê pozîtîv ê di tore û jiyane de hate bîra min. Dibe... min digot ew tune ye, ji ber ku ez bûme mêrekî ku ji yara xwe bêtir bi gora diya xwe ve hatiye girêdan. Lê te bawer dikir ku ew leheng heye û ji bo baweriya min were, te xwe dida pêş:

- Ji bo welatekî azad ez ê bibim pirîsk, ji bo vî agirê pêdikeve.

Tê bîra min wê rojê, ez keniyam û min ji te re got:

- Tu di bin bandora nimûneyê lehengê pozîtîv yê romanên siyasî de yî.

Ez gelekî keniyam... Tu jî gelekî giriyayî.

Ji bêhişiya xwe ez dikeniyam. Gelo ez bi xwe dikeniyam, yan bi bîra tariyê, ya ku di hinavên min de dihate kolan, ez dikeniyam:

- Tu çiqasî ji xwe hez dikî.

Ez bi te re rast bûm heta kêlîka dawî û niha... Şevîna tenik, ya nazik, mêya Agirî, çima piştî xwe da min û çû? Û ez ji goreke sar û jibîrbûyî re hiştim. Ez ê çawa perçeyên dilê xwe ji van beyabanên fireh bidim ser hev, pistepistên wê yên germ têne bîra min:

- Li ber te bi tenê ez qels im. Ji ber ku tu dilê min î.

Min digot, qey Şevîn tu rastgo yî. Ez ji ser hişê xwe çûm. Kêrên evîna wê çermê min zivar zivarî kirin. Girêk di qirika min de derketin, nema pêjna wê hat. Piştî û piştî demeke kurt bêhna nûçeyên seyr çirîya. Cîranekî wê ew bi mêrekî biyanî re tazî dîtibû. Mêr ji piştve ew zeft kiribû. Herdu gewdeyên tazî bi hev du re bûbûn dirdirk. Cîranan nema dikarîbûn ew ji hev dûr bixistana û Şevîn bûbû benîşteki erzan di her devî de. Têkiliyên wê bi wan re kevin bûn. Şevîn ne ya min tenê bû. Para gelek mêran bû. Bêyî ku ez zanibim, ez yek ji wan bûm. Min gelek caran ji xwe dipirsî, çima di nameyên xwe de ji min re dinivîsand: Ê min tenê. Yekî ji şîrîkên min yên bi dizî ji min re digot:

- Wê dixwest ku di eynî demê de ji min û te herduwan re be.

Wî dizanîbû ku ez evîndarê wê me. Min nizanîbû ku ew evîndara wan e. Naxwe, ne li ber min tenê qels bû û ne ku dev ji min berda, ji ber ku ez welatekî biçûk im û ne ku xwe dida min tenê. Nizanim çima ewqas mijê dabû ser çavê min. Piştî Şevînê darên bavê min wînda bûn, siya diya min jî xuyanî nekir. Ez mame mêrekî tazî û dilê min ji her tiştî hatibû şuştin. Bê hezkirin, bê sembol, bê guman. Ez mêrekî tenê hêjayî xwekuştinê me. Min hêviya xwe bi her tiştî wînda kir. Bêsûdî canê min dikerîfîne, min vedigerîne xeleka pirsan. Pirsra wateya hebûna min û bejna min a di bin ewqas deyn û êşên giran de veşartî. Yê bi tenê, yê ku birayên wî bavê xwe xwarin û gora diya wî

di wê roja dûr de hatibû kolan û vekirin. Axx, ji bilî giriyê li medbexê heta berbangê û ji bilî razana giran piştî vexwarina libên xewa şêrîn. Tu tişt nikare êşa ji ser û canê min ê birîndar derxîne. Na, medbex jî nema bêhna min derdixîne. Nema kesek dikare deriyê rizgariyê li ber min veke. Ji her tiştî tengijî me. Her tişt vereşandina min tîne. Xwezka min zanîba bê kî ye berpirsê vê xirakirina ku hundirê min dixwe. Û kî ye sedema vê şikestinê, vê êşa bê sînor. Tenê xwezka min zanîbûya! Di vê jiyana xwe ya vala, pûç û bê wate de, carekê tenê ez ê bûbûma mêrkuj. Ez ê îşev berê xwe bidim medbexê û wê ev cara dawî be ku ez dê li ser dinyayê, li ser xwe, li ser darên bavê xwe yê mirî, li ser canê diya xwe yê firayî, ez ê bigirîim. Îşev tenê, wê libo libo hêsrên min biweşin ser erda medbexê. Ji ber ku ez dê bigirîm, bigirîm û hey bigirîm. Heta mirinê ez dê bigirîm û ez dê ji Xwedayê bilind û yê wek min bi tenê re bibêjim ku vê kêlikê ji mirinê xweştir û xweşktir tiştêk nîne.

## WELATÊ SÊYEM

### ÇÎROKA MÊREKÎ XWÎNKESK

Wê rojê, xelkên vî welatî, li ser dîmenên xweristê yên seyr, ji xew rabûn. Her tişt kesk bûbû. Keskayiyê seranserê welatê wan dabû ber xwe. Televîzyon û rojname û zanyar û radyo û xelkên wî welatî bi hev re, dest bi şîrovekirina sedemên vê keskayiyê kirin. Kesekî nikarî bû rastiya meselê biçespana. Tenê li vî welatî -yê ku em ê navê welatê sêyem lê bikin- ku ne welatê wî mêrê ku em ê çîroka wî bêjin bû, ne jî welatê wê jinê ye ya ku bi awirekê qedera mêr xistibû destên xwe û jiyana wî serobinoyî hev kiribû. Gelek carî weha bûye ku awirek, peyvek, ramanek an jî kêlîkeke kurt dibe sedema şewitandina temenekî. Dibe ku çîrokê ji wê carê dest pê kiribe. Ew car, cara yekem bû ku jineke bi du çavên weha kesk û zelal li welatê xwe dibîne. Jin pê re diaxivî, ew jî bi xwe re. Ji bo qedandina karekî hatibû wî welatî. Kar qedand û çû, lê çavên wê man. Bi derbasbûna demê re, şopa lingên jina spehî winda kir. Cara duyem, li welatekî din lê rast hat. Jinê jî ew jibîr nekiribû. Çavên wê pêlên agir berdan damarên wî. Ew ji tirsê çavên wê re lerizî. Xwe bi ser hev de mîna jûjjiyekî guvaşt û jin ji lerizandina wî veciniqî û dûr ket. Ji xwe re got:

Hîn ku em li yek welatî ne û berî ku dîsa winda bibe, divê çareyekê bibîne. Du saetan ramiya da ku karibe çend peyvan bibîne, ji bo ku pê re biaxive, nedîtin, lê tev wilo jî, ji jinê ve nêzik bû, beşîşî û got:

- Merheba.

Peyvên li cem wî têra sed salî dikirin ku jê re bêje, lê nikarîbû yek hevok bigota. Jinê ew da ber awirên kesk û bêdeng ma. Mêr xwest berdewam bike:

- Ez, ez... ez.

Jinê lêvên xwe qermiçandin û çû. Sal derbas bûn. Temenê jinê, him jî yê mêr, mîna du trênen bêrawestan, zikê demê diçirandin. Vê carê ne li welatê wî û ne li welatê wê, li welatekî sêyem, ji nişka ve li hev rast hatin. Vê lihevraştatinê, dibe ku bala jinê kişandibe, dibe jî nekişandibe. Lê çavên wê mêr ji desthilañin xistin. Jê ve nêzîk bû, dixwest pê re biaxive, mîna ku bi jineke ji van jinên ku rojê carekê mirov li wan rast tê, pê re axivî. Piştî ku jin çû, him dihat ku ji qehran re bigirî, bê çawa ew hembêz nekir û serê xwe dananî ser sînga wê û raneza, him jî bi xwe dikeniya û dixwest tê bigihêje bê ev hestên giyanê wî dicûn çî ne, ji ku hatine. Her roja ku çavên wê jinê didîtin êş dikete serê wî. Dixwest mîna dema zarotiyê xwîn ji bêvila wî bê û rehet bibe. Di zarotiya xwe de her ku aciz dibû ditengijî û zor lê dihat, xwîn ji bêvla wî dihat.

Bi herikandina xwînê re êş jî pê re diherikî û diçû. Aniha rivînên êgir xwe berdidin dilê wî. Dixwest bigirî, bike qêrîn, hawar, yan jî bişkokên cilên jinê veke û serê xwe yê westiyayî deyne ser germayî û nermayiya herdu memikên tazî, teze û stewiyayî. Yan jî hinek xwîn ji bêvila wî biherike û ji vê êşa bê ser û ber rizgar bibe. Wê rojê di êvareke bêdeng de xwesteka wî pêk hat. Di kêlîka ku jinê çavên wî dan ber tîrêjên herdu çavên kesk, serî û laş lê germ bûn. Pê re, bi şilayiyê germ, di bêvila xwe de hest bû. Nas kir ku xwîna wî ya ku ji bîst salan de neherikiye, a niha herikî. Bêyî ku birame, destê xwe dirêjî desmaleke spî kir. Ji bêrîka xwe derxist û xwîna xwe pê paqij kir. Behetî ma. Desmal hemû kesk bûbû, veciniqî:

- Ev çî ye Xwedê?

Dîsa paqij kir. Çavên wî li rengê sor neketin. Sawê xwe berda dilê wî. Ev çawa xwîna min kesk bûye. Ji sedî sed ev nexweşiyêke giran e. Xwe dît ku li cem dixtor e:

- Ku dera te diêşe?

- Carna serê min tê ku biteqe û xwîn ji bêvila min tê.

- Ha, ez têgihîştim. Tîn e, tîn, xwîna te dikele.

Bi rûyekî zer ê çilmisî, mîna ku yek li benda biryara pêkanî û nepêkanîna bidarvekirinê be. Bi dengêkî lerizî ji dixtor pirsî:

- Lê, xwîna min kesk bûye dixtor!

Dixtor, him mit û mat û him jî nîvkenî lê zivirî:

- Çawa yanî?

- Weke ku te guhdarî kir, xwîna min kesk bûye.

Destê xwe avêt bêrîka xwe da ku desmala kesk pêş wî bike. Destên wî vala ji bêrîkên wî derketin:

- Tu dikarî bi çavên xwe bibînî.

Dixtor serê xwe hejand û dest bi kontrolkirina laşê wî kir. Bi hêviyeke şikestî, li destên dixtor dinêrî, gava jê re navê çend dermanan dinîvisand. Berî ku rahêje reçeta xwe û biçê, dîsa pirsî:

- Tê çî wateyê ku xwîna mirov kesk bibe dixtor?

Dixtor beşîşî:

- Tiştêkî weha nîne, tenê xuya ye ji hêla psîkolojîk ve tu ne rehet î. Bi van dermanan tu yê baş bibî.

Di dilê xwe de biryar da, ev cara dawî ye, ku tê cem dixtor. Ji xwe re digot:

- Dibe ku xebera wî be, dibe jî ez şaş bûbim û weha hatibe ber çavê min. Dibe jî ku korayiya rengan bi min re çêbûbe.

Ji nişka ve li serê wî xist, heta ku xwedîya çavên kesk nas bike, divê cihê ku jê tê bê naskirin. Gelo ev jin çî kes e? Ji ber bêhişîya xwe, heta ku jê hat destê xwe di textikê eniya xwe de lêxist û got:

- Çawa heta niha, cihê ku jê tê, min baş nas nekiriye.

Mêr zend û bendên xwe hildan. Çente ji hûr mûrên ji bo koçkirinê pêwîst dagirt û berê xwe da welatê jinê. Li wê derê, di demeke kin de, bi xwe hisiya ku her tişt fêm kir. Wekî din, ji bilî hezkirina jinê ji mêr re û ya mêr ji jinê re, her tişt serbest e. Jin dema hez dike, tê kuştin an ji welêt tê avêtin. Dema zîrek be dikare ji bo jiyana xwe ji vî welatî bireve. Kesek nizane çawa van zagonan cih girtiye û ji qurbanên têkiliyan mînakên nêzîkî her kesî hene, di hişê wan de

dijîn. Dema evîn dikeve dil, bi her awayî dil ji bo jiyana xwe li ber xwe dide ku kirasekî din ji wê evînê re bidirû da ku veşêre û bêhna wê desthilatdarên zagonçêker şiyar neke. Vê yekê bêtir ramanên di serê wî de li nav hev xistin û çivîkên xeyalên wî basko kirin. Nema zanîbû bêdengî û sarbûna rûyê jinê sûcê wê ye, yan sûcê qedexekirina li welatê wê ye. Herdu li welatekî din dijîn. Her sê welat, di hişê xwe de, dane ber hev. Hemû zarokên welatê jinê berhemên zewacên bê evîn in. Zarokên welatê wî ne weha ne, weha jî zarokên vî welatê sêyem yê ku lê dijîn. Gelo ev çi hêz e ku devê jina çavkesk li vî welatê kesk û dûr jî girtiye. Hat bîra wî, ku li welatê wê keç li kîjan deverê be, li ser rûyê erdê nikare ji desthilatdariya malbatê xelas be. Dinya biçûk bûye û her tişt tê dîtîn û bihîstin.

Dîsa li jina çavkesk rast hat. Silav kir, bersiv neda, tenê serê xwe hejand. Jê re got:

-Tu çima bêdeng î?

Jinê lêvên xwe bê dilê xwe vezilandin û awireke tûj ji çavên kesk têvedan û çû, sergêjiyekê ew li dora hev zivirand. Xwîna kesk herikî, desmal dîsa derxist, paqij kir û ji hevalê cem xwe re got:

- Ev desmal çi reng e?

- Spî ye lê kesk bûye.

- Te dît çawa ew dixtorê ker ji min fêhm nake. Bawer nake ku xwîna min kesk bûye.

- Çi? Xwîna te kesk bûye. Ha ha ha ha.

Hevalê wî pê keniya, wî jî kir qêrîn:

- Mane va ye tu bi çavên xwe dibînî malxerab.

- Mêro, xuya ye xelk rast dibêjin gava qala dînbûna te dikin. Wele xuya ye bi rastî te aqil firotiye.

Vegeriya malê. Rahişt derziyê û kaxezeke spî. Dixwest destê xwe birîn bike û bi xwîna xwe ji jinê re binîvisîne da ku deng jê bê. Gava derzî li tiliya xwe xist, peyva diya wî hate bîra wî:

- Erê lawo, rih şêrîn e.

Çavên kesk ew dorpêçkirin. Xwêdan pêket û bi êşeke mezin, tiliya xwe birîn kir. Dema dest bi nivîsandinê kir, dît ku kesk dinîvisîne. Berdewam kir. Bû sibe, nameya tijî evîneke veşartî da jinê. Bi serê



lêvan xwend û beşîşî, weke ku bêje vî çawa bi gihayê kesk ji min re ev çend peyvên kesk nivîsandine. Serê xwe hejand û çû. Li pey wê çû, heta ku li dîwarekî rast hat, li ber rûnişt û bi ser tiliyan salên temenê xwe jimartin. Di wê kêlikê de nas kir ku çare nemaye. Êdî her tişt qediyaye. Yan divê xwe bikuje, yan jî divê bi dengekî bilind jê re bêje “Ez ji te hez dikim” ji xwe da ser riya duyem. Rûpelekî nû nivîsand, dilê xwe li ser raxist, kêra herî mezin ji medbexa mala xwe anî, xiste nav kaxetê û berê xwe da jinê û li ber wê rawestiya. Jinê fêhm kir ku wê bibe sedema kuştina mirovekî. Rahişt nivîsa wî û xwend, wî jî rahişte kêrê. Jinê serê xwe hejand, mîna herdem û bêdeng ma. Hêdî hêdî serê kêrê ber bi pêşîra mêr de diçû. Mêr hazirîya xwe û xwekuştinê dikir:

- Eger tu bêdeng bimînî, tu dibî sedema vê kuştinê. Jin şaş mabû.  
Çavên wê yên kesk fireh bûbûn:

- Ez ne dibêjim divê tu bêjî erê, ez ne vê dibêjim, tenê tişteki bêje.

Gava jinê dît ku ku kêr dest bi kuştinê dike, lêvên wê lerizîn. Mêr destê xwe derxist. Kêr dûr avêt û li benda dengê wê ma.

Jina çavkesk bi hejandina serî re got:

- Min xwend...

Pê re dilê wî lerizî. Bîst û pênc lempe di rihê wî de şikestin, hûr-hûrî bûn.

- Lê... (Jina dildiz berdewam kir.)

Mîna çivîkeke bê dê ser jê bibe, dilê wî li benda bersivê, diperpitî.

- Lê... xeta te xweşik e!

Bêyî ku li benda bersiva wî bimîne meşiya. Mêr xwîna xwe ya kesk careke din paqij kir û zivirî pêşiya jinê. Kolan lê girt:

- Tu ji min hez dikî yan na?

Mêr hewldana xwe ya dawî kir. Ji ber ku yan erê yan jî na, ji bo wî çareserî ye û nabe bersiv ji bilî van herduyan tişteki din be. Jina çavkesk bi du çavên şikestî, kûr, zelal û tijî pirs lê nihêrî. Ne got ne erê, ne jî na. Hêdîka jê ve nêzîk bû û serê wî danî ser sînga xwe. Mêr jî di xewna xwe ya hezaran salan de ramiya. Ji lew re, bi deh tilîkên sincirî bişkokên gumlekê wê ji qulpikên wan derxistin. Dema gumlek da alî û xwest destê xwe dirêjî du memikên gilover bike û serê xwe

deyne ser sînga tazî, destên wî li tiştin hişk ketin. Mêr pê re veciniqî û zîq li hesinên ku di singa jinê de cih girtibûn dinihêrî. Şîşên hesinî ji binya qirika wê dadiketin ber bi jêr de. Gava xwest serê xwe bispêre sîngê, şewt û jan bi eniya wî ket, bi paş de vegeya, Xwest rastiya meselê bibîne, bi vegeya bi paş de dît ku xwe bi rû ve sipartiyê dîwarekî. Zivirî, jin nedidît, tenê du çavên kesk, zelal û şikestî ji paş dîwêr de lê dinêrîn. Mîna dizekî li ser serê tiliyan lingên wî ew ber bi herdu çavên kesk û dojhê de ajotin. Pê re... ber lingên wî kesk bûn. Dêrdora kolan û avahiyan kesk bûn. Keskayiyê avêt erd û ezmên. Seranserê wî welatî kesk bû. Tenê dara dilê mêrê çavîrê payîzê lê dabû, pel bi pel zer dibû. Hêdî hêdî, pê re keskayî û zelaliya çavên jinê ji xwe winda dikir.

Her weha, ne welatê wî, ne jî welatê wê, belê seranserê welatê sêyem tenê di nav keskayiyê de mabû.

## ÇEND ÇÎROKÊN DIN JI WELATÊ SÊYEM

### 1. Kêr û Gul

Her ku jin bi serê xwe diramiya, destê wê yê rastê diçû ser kêrê. Bi du çavên tijî kîn li hezkirinê dinêrî. Ji hezkirina xwe ya jî mêr nefret dikir. Bêtir bi roj nefretê şûna evînê digirt. Dema şevê rê li ber hest û ramanên dil vedikirin, bi çavên tijî ken li hezkirinê dinêrî, ji hezkirina xwe hez dikir. Destê wê yê çepê diçû ser guleke sor, dixwest gulê maçî bike û weha gulê û herdu lêvên xwe pê re bide mêrê li benda wê. Dema hevdtîninê nêzîk dibû. Him mêr ditirsiya ku neyê yan jî dilê wî bişkîne, him jî jin ditirsiya ku xwe bispêre vî mêrê seyr yê ku hatiye li kaniyekê, di nav çolistanên ji kevîr de, digere. Dem dibuhurî, jinê berê xwe da mêr. Ji dûr de dilên herduyan bi hev re lêdixist. Her ku dil ji hev nêzîk dibûn, dûrayiya di navbera wan de jî kûrtir dibû.

Di wê kêlîka ku hatin hember hev de, mêr li çavên wê dinêrî, wê jî li dûr dinêrî.

Gava çavên mêr hatin ser destên jinê, mêr şaş ma. Jinê bi destê rastê rahiştibû kêrê û bi destê çepê rahiştibû gulê. Jinê bi ziman

pesnê kêrê dida û dida ber çavekî wî, bi destê din gul dida dest û jê dixwest bê tirs di çavên wê de winda bibe.

## **2. Rewrewk û av**

Carekê, li çolistaneke germ tîbûnê zora mêrekî bir. Dema li dût nihêrî, ji kêfan re dihat ku bifire, çavên wî li rewrewkan ketin, digot qey av e. Ber bi asoyan de beziya û hey beziya. Her ku nêzik dibû, rewrewk dût diketin. Dereng, ..... fêm kir ku ne av e.

Ji neçarî, xweziyeke kûr li ser lêvên wî ziwa bû:

- Xwezî ev rewrewk bi rastî av bûna!

Vê carê -li vî welatê sêyem- bi salan e ku pêlên ava hezkirina jina çavzela ew dane ber xwe û di çûn û hatinê de ji xwe re digot:

- Rewrewk in... rewrewk.

Wê rojê, bi çend peyvên jinê, kaniyên avê pê de teqiyên, nas kir ku êdî ne rewrewk in. Dema ku çavên jinê rê li ber pêlên ava ku bi xezeb diherikî vekirin, mêt ji ber êşa dilê xwe, bi ser bêhişiya xwe de tewiya û xweziyeke kûr li ser lêvên wî ziwa bû:

- Xwezî ev pêlên avê bi rastî rewrewk bûna! Xwezî hezkirin tu-nebûya.

Bi vê xweziyê re pêlên ava hezkirineke kor ew dan ber xwe.

Ew winda kirin.

## **3. Zarok û dudilî**

Wê şevê jin ji xew veciniqî, bi tirs li dora xwe nihêrî, çû piyalek av vexwar û vegeriya, di xewna xwe de ramiya. Di xew de, vedigeriya malê. Zarokeke biçûk li oda xwe dît. Matmayî li rûyê zarokê yê kenok nihêrî. Wê kî bawer bike ku ev ne zaroka wê ye. Li vî welatî, wê çawa bê mêt bibe dê. Çareseriyeke bilez û seyr ji xwe re dît. Ji sedî sed, diyekê xwestiye xwe ji zaroka xwe xelas bike, ew avêtiye oda min. Bi hêrseke mezin û kor nêzikî zarokê bû, bi herdu destan xwest wê bixeniqîne, zarok ne ewqasî biçûk bû ku nebîne, pê re zarokê kir qêrîn, hîn tiliyên jinê li hewa bûn ji xew veciniqî. A niha spasiya Xwedê dikir ku xewn bû û ne rastî bû. Gava li tiliyên xwe dinêrî û ji

xwe re digot (mirov çawa zarokê bikuje?) dengê giriyê zarokê hate guhê wê. Tevzînok bi laşê wê ve hilkişiyar. Xewn û rastî li ber çavên wê li nav hev ketin. Hîn ji xwe re digot (Dibe ku dengê giriyê zarokê li ber guhê min ketibe?) Dîsa dengê giriyê zarokê hat. Bi lez pê ve çû. Bi hatina wê re zarokê dev ji girî berda û beşişî. Jinê xwe careke din ji kuştina wê re amade dikir. Dengê mêrekî li ber guhê wê ket (Ev zarok hezkirina me ye.)

Serê jinê ber bi derî ve zivirî. Mêr bi du çavên tijî hêvî lê dinêrî. Jinê piştî xwe da mêr û jê re got:

- Ez vê zarokê nas nakim.

Mêr anî bîra wê ku mirov ne bi çavan, belê bi dil, zarokên weha dibîne. Dîtina zarokê tê wateya dilketinê.

Jinê, bi xeyd lê vegerand:

- Ev cara yekem e ez mêrekî dibînim, bêyî ku li çavên min binêre, qala hezkirinê dike.

Mêr bi kenekî sivik vegerand:

- Ez ê çawa li çavên jinekê ku herdem piştî xwe dide min binêrim.

Jin lê zivirî, deriyekî girtî dît. Tu mêr li wir tunebûn. Gava li zarokê zivirî, dixwest ku ew jî mîna mêr winda bûbe, lê zarokê bi kêf li nav çavên jinê dinêrî. Jinê nema zanîbû, ev zarok bi rastî hezkirina wê ye, yan jî hinekan ew avêtiye ber deriyê wê, eger bihêle jî, wê çawa xwe-dî bike. Her weha nema dikare bikuje jî. Jin bi heyreke mezin li ber serê zarokê rûnişt. Li benda vekirina derî bû, ji nişka ve dengê hat.

Jinê bi çavekî li zarokê dinêrî û çavê din jî li derî...

## ŞOREŞÊN ODA BIÇÛÇIK

Sala pêşî ez hatim Helebê, min tu kes nas nedikir, ji bilî hevalên birayê xwe yê mezin. Ji ber ku ez bê cih bûm û wan xaniyekî ji sê odeyan kirê kiribûn, ez bi wan re bi cih bûm. Hemû xwendevanên kevn bûn. Em çar kes bûn. Mal jî sê ode bûn. Odeya herî piçûçik dane min. Ode bi textekî bû û di quncikekî mirî de bû. Vê bicihbûnê ji hêlekê ve hinekî ez rehet kirim, ji ber ku min nizanîbû tu xwarin çêkîra. Karê min kiribûn anîna rojname û kovaran. Hinekî bi min zor bû ku hemûyan bi çavekî biçûk li min dinêrîn û ditirsiyan ku ez winda bibim. Ji bilî riya mal û zanîngehê min tu dever nas nedikir û ji siyasetê pê ve tu axaftin, li ber min çenedibûn. Rojekê xortekî ji wan ez birim kêlekê û ji min re got:

- Ez dixwazim tu oda xwe ji me re vala bikî.

Min serê xwe hejand û di cih de ez têgihîştim bê çî dixwaze dan û standinên wan û birayê min. Li mala me li Amûdê hatin bîra min. Bi germayî bi siyasetê mijûl dibûn. Ez jî hîn diçûm dibistanê wê çaxê. Navên mezin û xerîb li ber min dihatin gotin. Guevara, Şêx Seîd, Lênîn, Barzanî, Stalîn, Batrîs Lomomba... Min jî tim ji xwe re digot:

- Ya rebî ez ê kengî mezin bibim. Herim zanîngehê û van navan ji nêzîkayî nas bikim.

- Ji ber vê min nepirsî oda min çima ji min dixwazin. Hew min pirsî:

- Ji çend heta çend?

- Dora pênc-şeş saetan.

Min roja xwe li kolanan qedand. Tê bîra min, ez winda bûm û ez ketim deverekê ku ne pejna mirovan û ne jî ya lawiran li wir dihat. Tev avahiyên bilind û dar û pelên weşiyayî bûn. Ez û ramanên xwe me bi hev re avjenî dikir. Ez bi xweşiyekê hest dibûm. Kêfxweşiya min ew bû ku hetanî ev meşa min a vala di ber welat û civînên xortan de ye. Ez pir ji xwe razî bûm, pênc-şeş saetan ez li ser lingan ji piyan digeriyam, ji bo ku civîn li oda min çêbibin. Ma çi ji wê xweştir e ku mala mirov têkeve xizmeta welatê wî de. Dawî ez bi texsiyekê vegeeriyam malê. Ez ji hawhaw ketibûm, dema min ji xwe re digot:

- Niha çi şerekî germ di oda min de çêbûye li ser helwestên partiyên û siyasî. Û navên biyanî niha bi sedan hatine zimên.

Civîn qediya bû, lê tiştê bala min kişand, bêhneke xweş û xwe-dayî ji mitêl û doşeka min dihat. Ez wê şevê bi wê bêhna serxweş ketim û ez nema zanim çawa ez di xew re çûm û çi ramanan serê min dikolan. Gelo bêhna berpirsiyarê partiyê ewqasî xweş e? Gelo di hemû civînan de wê bêhna xweş bi ser xwe dadikin û tînin civîna. Her ji du rojan carekê, ji min dihat xwestin ku ez oda xwe vala bikim. Min ji bo wan baweriyên û wê bêhna xweş ya ku bi doşeka min ve dima, min dixwest ez odê vala bikim. Hetanî ku rojekê ez zû vegeeriyam malê, dengê vebûna derî hate min û piştî dengê lingê qîzekê hêdî hêdî dibêrî guhê min re derbas bû. Wê gavê min nas kir ku ew civîna germ û dirêj û bêhna xweş ji ku dihat û çima her tim doşeka min li dû xwe şil dihiştin. Ji wê gavê de çûna civînan li min bûbû hesret. Min gazî Xwedayê jor dikir:

- Xwedêyo tu riya civînan li ber min vekî.

Piştî deh salan hevalekî min ê kevn birayê xwe yê biçûk anî xaniyê me yê bi kirê û ji min re got:

- Ev birayê min xêşim e, sala yekê ye. Hayê we jê hebe. Min ji xwe re got, ji sedî sed, berî deh salan birayê min jî wilo ji hevalên xwe re gotiye ku ez xêşim im û bîra tiştêkî nabim. Me oda biçûk dabû birayê hevalê xwe yê biçûk û her ji du rojan me jê re digot:

- Ji kerema xwe re oda xwe ji me re vala bike... Civîna me heye.

## ÇAVÊN BAVÊ MIN

Çavên bavê min pir qels bûn. Her ku ez diçûm malê giliyê xwe bi min dikir:

- Lawo ne dixtorên Helebê bin çavê min rehet nabin. Dixtorên Amûdê nikarin tişteki ji bavê te re bikin.

Carekî ji diya min re got:

- Karê xwe bike, ez û tu, em ê bi lawê xwe re herin Helebê.

Min jî li taxa “Suryan” xaniyek kirê kiribû. Li qata çaran, nû min derî vekir, dê û bavê min bi hev re û bi helkehelk gotin:

- Lawo bi Xwedê ev derece pišta mirov ji mirov dixînin.

Havîn bû. Min ji diya xwe re pencere vekirin û bavê min bi zorê xwest ku dakeve sûkê û şivê bîne. Diya min digot:

- Lawo li bavê xwe miqate be, li Amûdê ber xwe nema didît.

Nû em daketin. Çimên keçeke derpî kin -bi şort- çavên bavê min pêl kirin. Çarçav li hawîrdora xwe dinêrî. Bi kêf ji min re digot:

- Lawo ji pêvî çim û piyên tazî tişteki li vir tuneye.

- Na yabo, na... Tu ji pêvî çimên tazî tişteki nabînî.

Piştî veqerê dengê bavê min zelaltir bûbû:

- Lawo, ez dibêm qey çavên min rehet dibin.

Min li diya xwe nihêrî:

- Yadê, xuya ye wê çavê bavê min bê dixtor rehet bibin. Roja din bavê min ji min bêtir tişt didîtin. Her roj digot:

- Lawo, em îro jî naçin cem dixtor.

Li ber êvarê, her dem dixwest ew tenê dakeve sûkê. Şevê mala li hember me şahiyek li şaneşîna xwe ya fireh çêkirin. Diya min mat mabû:

- Lawo, li vê ecêbê, ji xwe re li piştta wê ya tazî binêrin, hema bi Xwedê ev ne misilman in!

Dema ku yên li hember me di nav çinge çinga piyalan re rabûn sema û “slow dance” dest pê kir û dest û zend li gerden û qirikan geriyar, devê diya min bi gazekekê ji hev vebû û ji bilî gotina “waweylê... waweylê” tiştek nedigot û gava goştê spî yê jinên spehî di tariya şevê de diçirisan, çavê bavê min sipîsax dibûn û ji me bêtir didît bê çî li hember me dibê:

- Bi Xwedê min digo qey ev tişt di televîzyonê tenê de hene.

Kenê bavê min bilind dibû:

- Tu zanî duh diya te çî ji min dipirsî?

- Çî?

Em nû ketin nav bajarê Helebê, çav li terembêlên rêzkerî ket, li min pirsî:

- Hecî ev daweta lawê kê ye îro ewqas terembêl civandine.

Min jî jê re got ev daweta lawê wezîrekî ye.

Wê şevê, berî sibehê, ez bi bavê xwe hesiyam ku çawa wek dizan li ser serê tilîkan meşiya û ket nav cihê diya min de. Min jî xwe kerr kir û min xwe li xewê danî tev ku xewa min nedihat.

Serê sibehê, piştî nimêjê, bûbû xirte xirta bavê min:

-Lawo, me tu xêr nedît ji emrê xwe. Bi Xwedê em bê mirad man û man. Bi Xwedê trên li me qelibî.

Bi dû gazinan de, pir di ber guhê min re diavêt:

- Ka tu dostik mostikên te tune ne, lawo?

- Çima yabo?

- Ma dilê te bi bavê te naşewitî, lawo? Ku hetanî vî emrî min xweşik û li ber roniyê laşê diya te nedîtîye!



Serê xwe li min dihejand:

- Min niha nas kir bê çima tu ji Helebê nayê malê, heta ku perê te xelas nebin.

Min dikir û nedikir bavê min bi min re, nedihat ser bijîşkê çavan. Nema diçû:

- Çavên min rehet bûne, bûne yazde ji dehan.

Rojekê ez ji zanîngehê vegeriyam ku bavê min û diya min vegeriyan Amûdê. Piştî çend rojan di telefonê de dengê diya min dihat:

- Lawo, çavên bavê te xerabe ne. Nema xweşik ber xwe dibîne. Were ji bo tu û wî herin Helebê ser dixtorê çavan.

- Erê yadê, erê. Ez dermanê çavê bavê xwe nas dikim.



## SÊNÎKA SINCIRÎ

Bavê Nazê roj bi roj serê sibê derdiket li diya Nazê -ya pêşerojê-digeriya. Bûbû sala dawî û çend meh mabûn ji qedandina salê re. Dixwest di van mehên hindik de, xwe bi serî bike, berî ku bi girtina deriyê zanîngehê re deriyê jiyana wî jî bê girtin. Rojê carekê yekê jê re digot: “Tu wek birayê min î.”

Êvarê westiyayî vedigeriya malê û dihejmart:

- Heta niha ez bûme birayê heft kesan, Xwedê zane, hetanî sal here serî ez ê bibim birayê kesên zanîngehê tevan.

Piştî demekê gorên xwe yê spî ji lingên xwe kirin û ew -mîna alekê- bilind kirin.

- Ez westiyam, divê ez stratejiya xwe biguherînim di vî şerî de.

Ramanên germ her şev piştî saet duwazdehan di serê wî de dikeliyan.

Ya baş ew e ku ez gotina diya xwe bînim bîra xwe. Her ku vedigeriya gund ev pirsê diya wî li hêviya wî bû:

- Lawo ka te kes ji xwe re nedît?

Cihokên ramanên wî diherikîn. Diya min digot:

“Lawo, eger tu nêzikî pîrekan bibî, divê tûrê te yan mişt pere bin, yan jî mişt derew bin.” Vêca pere tune, man derew”. Min tiştêk ji rastiyê fêhm nekir ji bilî derd, bela, bextreşî, deriyên girtî û malxe-

rabiye. Tu ji dil nêzîkî kîjan jinê bibî, wê dil û canê te li ber lingan bipengize. Ya rast ew e ku yek xwar bimeşe. Tiştê rast di vî zemanî de maye serê gopal. Ez nema dizanim çî bikim ji vî dilê xwe yê ker. Ez nizanim kîjan hovî gotiye: “Dil dil e ne sênîyek birxul e.” Hema dilê min bûye teştekek birxulê belawela. Ya girîng ew e ku berî dawîya salê divê ez diyekê ji Nazê re bibînim. Eger nebînim ez ê bi heriyê çêkim an jî divê dunya xera bibe.

Bavê Nazê rojê li zengilê oda keçekê dida, keçik dadiket. Roja pêşî gul li rû diketin, a duduyan gula rû diçilmisî, ya sisiyan stîrî li şûnê derdiketin, roja çaran dibû metka Nazê, ango bavê Nazê dibû birayê wê. Roja pêncan nema dadiket. Ji wê diçû yeke din. Her şev piştî vegeerê xwe li ser text dirêj dikir û digot:

- Aaax... Bi Xwedê hingî min îro derew li vê kirin ez westiyam. Ez ji hev ketim. Ev sê saetên min in ku ez derewan lê dikim û bê fêde ye.

Dem bi ser nîvê şevê diket. Germ dibû. Hêrs dibû:

- Kuro ev bi yar in û nabêjin em girêdayî ne, dibêjin tu wekî birayê min î!

Wê rojê, ji nişka ve, bavê Nazê xwe nas kir. Sênîka “krom” danîbû ser êgir, di cih de sincirî û piştî danî erdê, bi demeke kurt, sênîk sar bû. Ji xwe re digot:

- Erê, ez wek sênîka “krom im” bi şev disincirim û bi roj sar dibim.

Ev mîrata xeyala min wek agir e, hingî min germ dike. Wê rojekê mala min li malan bigerîne, lê dibin roniya rojê de xewn tevde tazî dibin û vedimirin. Ji wê rojê de, navê wî ma sênîka krom. Bavê Nazê mabû di wê rewşê de, hetanî ku sal çû serî.

Bi şev sincirandin... Bi roj sar bûn.

Azmûn (imtîhan) neman û hîn bavê Nazê li diya Nazê digeriya. Xwendekaran hemûyan karê xwe xilas kirin û dest bi vegera malê kirin, lê pêjna bavê Nazê nedihat. Her yekî ji yê din dipirsî:

- Te bavê Nazê nedît gelo?

Berê xwe dan oda wî. Derî girtîbû. Bi carekê derî vekirin. Tiştekek dibin mitêlê de bû, yekî got:

- Ev hîn di xew deye!

Gava mitêl hildan, sênîkek krom û sincirî di nav cihê wî de dîtin.

## **XEWNA MIHEMEDÊ HUNERMEND**

Em du xwendekar di xaniyekî bi kirê de bûn, sê ode di xanî de hebûn. Gava Mihemed xwest bi me re têkeve xanî, hevalê min bi vî awayî erêkirina xwe diyar kir:

- Baş e, hema bi kêmanî, xuya dike ku ew xortekî paqij e.

Mehek di ser hatina wî re derbas nebûbû dema ku di nav wî û hevalê min ê ku karê wî tazîkirin bû de aloziyan dest pê kir. Mihemedê ji xwe razî perçe ji xwe dikirin, gava ku yê din li hundir şilfî tazî li ber çavên wî dimeşiya yan jî pal dida. Heta rojekî wilo tazî derî ji mêvanekî Mihemed re vekir. Mêvanê wî, merivekî wî bû, nû ji Amûdê hatibû. Yê mêvan di cî de veşerîya û berê xwe dabû Mihemed û di nav malbatê de belav kiribû ku Mihemed li Helebê bi kesin tazî û dîn re, xaniyan kirê dike. Mihemed diçû û dihat, dest li dest dixist:

- Kuro ma çima ev xwe tazî dike lo? Bi Xwedê vî ez teqandime.

Wî nizanîbû ku bi vî tazîkirinê, tola (heyfa) xwe jê hiltîne, ji ber ku Mihemedê me paqij û rûkurkirî û solçîrisandî diçû zanîngehê, lê li malê, tu kesek wek wî gemarokî tunebû. Riya xwe kur dikir, firax li dewsa xwe dihiştin. Cihê xwe rast nedikir. Boyaxa sola wî hundir tevde gemar kiribû. Xwarin çenedikir û xwarina ku hebûya jî dixwar û diçû. Her roja ku dora wî ya xwarinê bihata, wî bi nava xwe digirt û digot:

- Qolinc ketiye nava min.

Dikir nale nal. Ya ji vê kambaxtir ew bû ku heger ne derengî şevê ba, yan jî ne berî sibehê ba, nedihat bîra wî ku li tembûrê xîne û bistrê û her tim çar-pênc mêvan, dawiya şevê, didan dû xwe û dianîn malê, dema mêvanan didîtin cî tuneye, jê re digotin:

- Te çima nehişt em herin otêlê?

Mihemed tejk û paçikên li wan deran dixistin nav hev û ji wan re digot:

- Ji we... ji we.. bi ser xwe dakin, mala me fireh e yaho!

Her sibe jî mêvanên wî, serma digirtin û careke din nema çavên me li wan diket.

Ev tevde hindik bûn û tiştin bêwate bûn li hember mijûlbûna wî bi xewna wî. Hêdî hêdî ligel ku navbera wî û hevalê min gelekî sar bûbû, lê nava min û wî pir xweş bû, dilê xwe pirê caran ji min re vedikir:

- Yaho ez ê bimrim û ev xewna min bi cih nehat.

- Xewna çi Mihemed?

- Yaho ez li benda wê rojê me ku rejkê ez herim zanîngehê, ez tenê li kêlekekê bisekinim û keçikeke xweşik, pir xweşik, ji ber xwe ve bê cem min, xwe biavêje hembêza min û ji min re bêje, ez ji te hez dikim.... yaho ez Mihemed im ha Mihemed, ne kesekî din.

Û li ser tiliyan dihejmart:

- Yaho xwendin û ez .... xwendevan im. Tembûr û ez... lêdixînim, stran, erê dengê min ne gelekî... lê ez distirêm û bi Xwedê yên wek min baş û qenc jî Xwedê kêr dane û navê min navê pêxemberan e û ku ez serê xwe dişom, bi Xwedê ez xweşik jî dibim, lê çima keçik ji min hez nakin ez nizanim yaho! Çavên wan kor bûne.

Her weha Mihemedê hunermend plan û ramanên xwe li ber xwe radixistin û ji bo xewna wî bi cî bê, dest bi karê xwe yê dijwar dikir û hema ji aş û bajar raman didan ber xwe û bi dengê bilind diramiya.

## **Hefteya yekemîn -keçikên Cezîrê (Qamişlo)-**

### *Rojên yekşem û duşemê*

Yaho bi Xwedê ji keçikên nêzîkî mirov çêtir tunene, jixwe berê paşnavê min Cezrawî bûye. Hema mirov dikare bêtir ji hevûdin fêhm bike. Ji berê ve hatiye gotin: -Teyrê çê bi refê xwe re ye. Xwîn xwînê dikişîne. Hinek di nav wan de hene ku dîtina wan serê mirov gêj dike. Xwîn hingiv, delal, xweşik, aaaaxxx ku xewna min bi cî bihata.

### *Rojên pêncşem û îne*

- Yaho giyayê hewşê tahl e, ev keçikên me lo, yên Cezîrê (Qamişlo) bi Xwedê tevde wek bişkoka in, reşik meşik in û hîna jî bi ser halan de, xwe dibînin û bi mirov razî jî nabin. Tu dizanî ... ya xweşik hîn berî bigihê zanîngehê mêr dike û diçe ser nesîbê xwe û evên hatine vir jî, bavên wan ew şandine vê derê da ku di stuyên wan de nemînin, kuro mirov silavê li yekê ji wan dike mirov dihetike, hingî qurre ne xwe nadin bi Fatîma Muxribî jî, heger tu nêzîkî yekê ji wan bibî, sed pirs û gotin û motin di ber re derdikevin. Min duh ji yekê re got merheba, hema hindik ma ku li min xe, got ez te nas nakim. Îca sêsed carî me hevûdin dîtiye ha. Kuro nexweşik in û hîn pozê wan jî li ezmana ye. Erê, gîska gurî li serê kaniyê avê vedixwe. Bi Xwedê ez ji dêvla bavê wan bama, minê her yek tenûrekê jê re çêkiriba û ew veğerandana malê, ji wan re çêtir bû. Dîsa ji bilî kurte pistên li ser tenûran tu karî nakin. Bi Xwedê hema ne bi sabûnê tenê, belê bi hemû dermanên şuştinê, ez ê destê xwe ji wan bişom.

## **Hefteya duyemîn -Keçikên Efrînê**

### *Rojên yekşem û duşemê*

- Yaho ji keçikên Efrînê, çêtir tune ne. Hema kurmancê me ne. Ji bilî vê jî tenik in û bê girêk û alozî bi mirov re didin û distînin. Hema dizanin xweşik silavê li mirov bikin. Ne weke wan bişkoka in ku di hêlin yek ji çermê xwe derkeve. Di têkiliyên xwe de nerm in. Cîrxweş in. Yaho xwîna wan çiqasî şêrîn e. Tu dikarî li wan bisekinî.

Here, were, ewqas gotin motinên vala tune ne. Keçikên Efrînê, bi Xwedê hema ji xwe re dikevin dilê mirov.

### *Rojên pêncşem û îne*

Yaho ev keçikên Efrînê çawa ne! Tu diheyirî bi çi zimanî bi wan re bipeyivî. Bi kurmancî silavê li te dikin û bi erebî li te dipirsin. Îca kambaxî ew e ku ez xweşik bi erebî nizanim. Du gotin, gotina sisiyan di ber min de dimîne. Hema xwe dixin kirasê “Helebiyên medenî” û ku bi erebî dipeyivin ji wan we ye ku bilind bûne ezmanê heftan, wey xwelî li serê me be û hew û ji me jî nav qetandî bûne, duh yekê digot:

- Ez ji cezrawiyan, hez nakin.

Hevala wê pişta wê digirt. Mal ne xeraban, tu dibê qey em ji stêrkeke din hatine. Dunya dibe yek û hîn ev dibêje Cezîr û ew dibêje Efrîn.

Lê ku xort ne kurmanc be, tu dibê qey baryayî ye, daweta wan e. Yaho ez nizanim ev çima ewqas ketina bin xelkê, bi me xweş û şêrîn e lo!

Hema bi Xwedê ne destê xwe tenê. Ez ê lingê xwe jî, ji wan bişom.

### *Keçikên Kobanî*

Bi dûrbînê keçikên Kobanî nayên dîtîn û li zanîngehê jî, kêmpayda dibin. Rojekê ez şaş bûm û min silav li yekê kir. Rûyê xwe tirs kir û çavên xwe li min şaşo maşo kirin. Di cî de Kobanê û kuştina li ser namûsê û jin minan û êl mêlan, di serê min de, li nav hev ketin. Nizanim çawa min got qey keçikê demança xwe derxistiye û berê wê bi min ve kiriye. Hema min yek nekir dido. Berî ku keçik devê xwe veke, min lezand û ez nema zivirîm, ji wê rojê ve bi deh kilometran jî ez nema nêzîkî Kobanê bûm.

Her weha sal ber bi dawiyê ve diçû û Mihemedê me, zor dabû tembûrê û stranan, lê her ku dirêj dikir û xewa hevalê me yê din dihat, hema şîlfî tazî berê xwe dida oda Mihemedê pepûk, yê ku vediciniqî, tembûr datanî ber serê xwe û ji xwe re bi dizî distira, heta di xew re diçû. Sibehê dîsa gotinên xwe dúbare dikirin:



- Kuro, xwendin, va ez dixwînim, li tembûrê dixînim, distirê. Ez baş im, navê min xweş e, sola min tim dibiriqîne, wek dîk, tim serê min hildayî ye û ku ez serê xwe dişom, bi Xwedê ez xweşik im jî, porê xwe şeh dikim, pêşanîka xwe diqulipînim, lê çima keçik ji min hez nakin? Ez nizamim.

Rojekê... Mihemed ji xew rabû. Tiştên xwe dane hev û bêyî ku xatir bixwaze berê xwe da malê û nema vegeriya:

- Bi Xwedê ev “quzelqurt” nema ji min re dibe.

Dest ji xwendinê berda, çû leşkeriyê û xewna xwe jî bi xwe re bir. Piştî şeş, heft salan min ew li Amûdê dît. Min digot qey wê dîsa gazinan bike, lê min dît ku kêf kêfa wî ye. Ez bi zorê birim malê, wê şevê min nas kir ku ez li hember Mihemedekî din im. Digot:

- Kuro... heşî te, hema ez ker bûm û hew, lê çî fêde min hinekî dereng mesele nas kir. Yaho, ne xwendin, ne tembûr û stiran, ne başî û qencî û ne zanebûn manebûn. Bi Xwedê tevde vala ye... û ne keçikên Cezîrê, ne yên Efrînê û Kobanê û ne jî yên Yûnanistan û Ermenistanê, ji van tiştan hez nakin:

Mihemedê hunermend bi hêrs destê xwe li ser ranê xwe xist û got:

- Bi Xwedê keçik hemû tenê ji bêrîka germ hez dikin, ji ber ku niha ez ji xwe re bi ser rê vebûme û ez hêvî dikim ji min ne pirse ez çî karî dikim. Hema karekî hêsan e, bê westandin e û pere jî pir tê de hene, ango bêrîka min germ bûye, bêyî ku ez lê bigerim xewna min bi cî dibe. Yaho min bîra her tiştî dibir, lê ku pere ji xewnan re jî bivê, min qet bîra vê yekê nedibir.

## **DEMA HEZKIRIN XWE DIXWE**

### **Sê roj ji jiyana mirovekî**

Tevlî ku zêdeyî du salên min li Berlînê derbas bûbûn, lê dîsa jî her ku min serê xwe datanî ji bo razanê, xewnan ez bi xwe re vedi-gerandim cihê ku ez jê hatime. Wê carê jî dîsa qerebalixeke seyr û tevliheviya di nav malbatê de di xew de, xwêdan bi min xistibû. Min apê xwe didît ku bi xezeb tê û destên xwe dixîne qirika min. Hate bîra min, gava ku ez mîna mêrên berê ketibûm devê rîya dotmama xwe û ew bû sedemê bêmiradiya min.

Di wê kêlîkê de teqreqa derî ez şiyar kirim. Him kêfa min hat ku xewn e û him jî min di xwe re nedidît derî vekim. Ji nişka ve hat bîra min ku soza min îro bi dostê min ê kevn re ye. Nû min derî vekir xwe avêt hembêza min, ez veciniqîm ne ji dengê wî yê bilind, belê ji guhertinên ku di dirûv û xisletên rû yê wî de çêbûne. Di kêlîka yekem de min got qey min, ne derî vekir, lê hingî ev dost dişibiya min, min got qey ez li hemberî neynikê me. Ew berî min axivî:

- Min çiqasî bêriya te kiriye.

Bêhemdê xwe min jê re got:

- Kuro, ev tu yî?

Bi ken li min vegerand:

- Na, ez tu me, ez Ferhad im.

Ez têngihîştîm. Wî dest bi çîroka navê xwe kir:

- Tu zanî, ez berî te hatim van deran. Di dema hatina min de bê-tîr mafê rûniştinê û manê didan kurdên başûrê Kurdistanê (Iraqê). Hevalên min ez şîret kirim da ku ez xwe li ser wan bidim, ne li ser kurdên (Sûriyê) ku zû bi zû ew nedipejirandin. Min jî weha kir û bi navê te (Ferhad) min daxwaza pejirandina penaberiyê kir, weke kurdekî başûrî. Vê pîrsê ji ber xwe ve xwe avêt ser lêvên min:

- Çima navê min û ne navekî din?

- Erê, min zanîbû tu yê bipîrsî. Ji bo ku ez navê xwe yê nû qet jibîr- nekim, min navê te hîlbijart. Yanî niha divê tu navê min ê kevn jibîr bikî. Ez Ferhad im û hew. Eger tu bawer nakî, ha va ye nasnameya min ya elmanî bi vî navî ye. Lê tiştêkî xweş e em piştî ewqas sal dîsa bi hev re li cihekî bin.

Dostê min ê kevn bîranîn û bûyerên me yên hevpar yeko yeko vegerandin vê navê û ez jî ji hêlekê ve şaş mabûm ku hetanî dengê wî jî wek yê min e û ji hêla din ve gelek bîranînen jibîrbûyî dilê min ê sar ji nû ve germ kirin. Dostê min hatibû çend mehan li cem min bimîne. Ji ber ku xaniyê min du ode bûn û karek li Berlînê dîtîbû. Vê dawiyê min nas kir ku cihê karê wî restoranteke ku xwediyê wê kurd e, li kêleka cihê ku bi navê mala kurdan tê naskirin. Dostê min him kar dikir, him jî roj bi roj riya xwe bi mala kurdan dixist û qala çîrok û kul û derdên kurdên penaber dikir. Hêdî hêdî ew dîwarên ku vecinîqandin di nav me de çêkiribûn hilweşîyan û kêfa min ji berê bêtir jê re hat, lê dîsa carna ji wî şîbhê mezin di nav me de nava min diqetiya. Cudahiya wî ji min ew bû ku pir li stranên kurdî yên kevn û evînî guhdarî dikir û carna dengê wî bi ser dengê dengbêjan diket. Dest pêkiribû dilê xwe ji min re vedikir:

- Tiştên herî ez bêriya wan dikim çiyar in. Aax... min karîba berî mirinekê, careke din ez biçûma serê çiyayekî û li wê deşta rast binê- rim û bistirêm ku tenê Xwedê dengê min bibihîze!

Mîna zarokêkî çavên wî diçirîsîn.

- Tu bala xwe didî van deran, hemû avahî, dîwar mîwar in û awirên te ji sed, dused mitroyî zêdetir derbas nakin.

Hîn meha wî neqediyabû nehênîyeke din ji nehênîyên jiyana wî keşif bû. Naskirina vê meselê jî, ew bêtir nêzîkî min kir. Ev nehênî

(sir), evîn bû. Di agirê evîneke bêçare de dişewitî ku vê yekê çêj û xweşîyeke seyr dida dengê wî. Dîsa ez têngihîştim:

- Kuro, tu li Ewropayê yî. Ev der ne Kurdistan e ku hevdîtin û maçkirin lê qedexe ye û civak te şermezar bike. Tu ji kê hez bikî, tu dikarî wê bibînî û dilê xwe jê re vekî.

- Erê, lêêêêê...

Bi vê lê ya dirêj re keserek kişand:

- Yek ji sedemên hatina min a Berlînê, hatina wê ya vê derê ye. Ez ne tenê ji bo kar li vir im. Dilê min ez anîme vir.

- Ê.. baş e. Wê bibîne û bi hev re bigihên çareseriyekê.

- Ez her roj wê li Mala Kurdan dibînim.

- Ê. Baş e.

- Na, ne baş e, ji ku baş e lo. Herdem sê çar kes pê re ne û karê siyasî dike.

Wê çaxê ez têngihîştim ku dilê wî ew ajotiye ber deriyekî asê. Li vir him kenê min hat, him jî ez têngihîştim ku ez li hember evîneke bêçare rû bi rû mam. Ji ber ku dostê min ketibû nav pêlên evîneke weha tirsnaq ku qehremanên destanên evînî yên kevn tanîn bîra mirov. Evîneke weha kor û dîn, mîna mirinê bêçar e. Min xwest ez bi awayekî din nêzîkî çîrokê bibim:

- Carekê jê re bêje. Dîtinên wê jî nas bike.

Serê xwe bi acizî hejand:

- Ez jê re dibêjim, merheba Meryem, dibê merheba heval... ji xwe carekê jî navê min hilnedaye, heval û heval, ma ev hal e, lo?

Dostê min bi xeyalên xwe re diçû devereke dûr û digot:

- Tu dizanî, ez henekan dikim, mesele ne wilo piçûçik e. Ev karê wê, girêdanên wê bi bîr û baweriyên wê ve, wê bêtir li ber dilê min şêrîn dike, lê gunehê min çî ye ku vê hezkirinê pişt li min şikendan-diye, ez nizanîm.

Piştî du rojan dostê min kêfxweş vegeriya malê. Bêyî ez bipirsim, weke çawa ku ew bi xwe re bipeyive, her tişt bi min da fêmkirin.

- Tenê hesretek di dilê min de maye ku ez di guhê wê de vê hevokê bêjim: "Ez ji te hez dikim, Meryem." Lê ew hevala wê ya her gav pê

re ye mala min xera kiriye. Bîst û çar saetan wek nobedarekê dibin çengê wê de ye. Ew çend deqeyên ku min, carna ew li kêlekekê didît jî, hergav hevala wê li bendê dima û guhê wê jî miç bûn, weke ku zanibe ez qala hezkirinê dikim. Tu dizanî, heta di van meseleyên şexsî de jî, ew biazilî nêzîk dibe. Tenê spasiya min li ser van hestên nazik kir û kenekî sivik lêvên wê zeftkiribû, mîna her jina ku tê hezkirin kêfa wê dihat. Rûmeta xwe ji hestên min re nîşan da û bipaş ve çû, gihîşt hevala xwe. Erê, bala min qet ne li ser peyvên wê bû. Tenê çavên wê yên zelal û xweşik dipeyivîn. Çavên wê di wan heft deqeyan de hezar peyv gotin. Tiştê seyr ew bû ku ez pê dihisiyam ku tu têkilî di navbera peyvên devê wê û peyvên bêdengiya çavên wê de tunebû. Min jê xwest ku rojekê tenê bîst deqan ji dema xwe bide min. Ji ber ku ew nikare bi tena serê xwe bê cihekî hevdîtîne, wê soz da ku piştî du rojan û bi telefonê em bi hev re biaxivin. Îro çarşem e. Roja îne saet pênc.

Dostê min rabû ev hevoka dawî li ser kaxezê nivîsand û bi dîwêr ve daleqand. Bi hêviyeke mezin lê dinêrî. Min xwest ez hinekî wî ji guman û xewnan şiyar bikim:

- Tu nabînî ku ev hezkirin, weke ku çawa hezkirineke yekalî be?

Dostê min veciniqî, çavên wî yên weke çavên min ê dibin berçavkê de, tîrêj vedidan:

- Na, ez tu carî bawer nakim ku hestên min an dilê min derewan li min bike. Çavên wê derewan nakin.

- Yanî dibe mirov carna şaş têbigihîje. Eger rojekê te ew dît, yekser li çavên wê binêre, eger te ez nedîtîm naxwe her tişt derew e.

- Meryem ji ku ye?

- Ji Serhedê ye.

- Wax, tu li ku û Serhedê li ku? Xwedê ji te razî.

Dostê min awireke sar li min veda û çû oda xwe. Derî li xwe girt û dengê dengbêjan ji pişt derî bi stranên evîne bilind dibû. Çarşem û pêncşemê neçû kar, li benda îne du rojên herî zehmet di jiyana xwe de -wek e wî digot- derbas kirin, lê çi roj in! Rojên mişt hest û êş û bîranîn û azarkêşiya bendewariyê. Di wan herdu rojan de, dilê xwe raxistibû û him bi wê re û him bi min re dipeyivî.

## **Roja yekem: Çarşem**

Ez ê jê re bêjim, di jiyana min de ev cara yekem e ku dara dilê min weha ji kokê ve min dihejîne û giyanê min di nav agir de disoje. Carekê hîn ez hivde salî bûm, bahozekê dilê min dabû ber xwe, lê bi demê re, min bi xwe, nas kir ku bahozê rê şaş kiriye. Niha, piştî vê jibîrkirina kor ji êş û germahî û kutekuta dil re, piştî ku mirov salên xwe yên sihî derbas dike, rê li ber hejandinên weha, teng dibin. Lê çi qewimî ku ez ji kokê de hatim zeftkirin û sincirandin xwe ji dil davêje xwînê, dîtina wê him fedî û him jî êşê bi xwe re tîne. Hingî xweşik e ez jê ditirsim, fedî dikim, dimrim, tevlihev dibim. Nizanim çima dîtina wê ewqas giyanê min hildiweşîne. Ez ê dîn bibim eger tiştêk pê bê. Ez ê jê re bêjim ez mêrekî xerab im, xerab heta wê dereca ku dikare ji bo jineke wek wê canê xwe erzan bide. Ez ê jê re bêjim jiyana min di çavên te de hatiye veşartin, dema tu çavên xwe digirî jiyana min di bin mijangên te de dilerize û gava tu wan vedikî jixwe bi min re dikenin. Ez ê bêjim ez ne weke tu kesî, tenê weke xwe, ji te hez dikim. Ez ê bêjim ez ji bo te heme û bêyî te wê ezman nema karibe sayî bibe, wê erd nema karibe bigere. Wê di dilê min de keriyek gurên birçî li nav hev kevin û wê hevdu bixwin. Bê te ez ê jî wêran bibim wê ev hezkirina te ya bêîman dest bi cûtina dil û hestiyên min bike. Bê te wê... Lê wê bîst deqe çawa têra teqandina ewqas kanî û birînan bikin. Heta ji min bê ez ê kurt bêjim. Lê pirs ew e, wê çawa peyv û gotin rivîna agirê dil bigihînin wê. Gelo wê çawa di nav pêlên deryaya evîna min de karibe li ber xwe bide. Oyy, serê min diêşe, dilê min diêşe. Wê kengî î n bê Xwedêyo û ez ji vî halî derkevim.

## **Roja duyem: Pêncşem**

Ez ê bêjim ez ne doza revê li te dikim, ne jî doza zewacê, tenê doza dîtina vê şewatê li te dikim ku ez ji te hez dikim û hew. Li vir her tişt diqede. Hezkirin dema tê mîna lehiyê her tiştî ji ber xwe dide alî û zora xwedyê xwe jî dibe. Lê gava li dîwarekî bilind û asê rast tê, li xwe dizivire, pêlên wê li nav hev dikevin û di nav gereke bê dawî de xwe dixwe. Tiştê herî nexweş di hezkirinê de ew e ku mirov qala hezkirinê bike. Ez ê jê re bêjim ne pêwîst e ez û tu qala hezkirinê bi-

kin, divê em hezkirinê bijîn. Tu zanî, duh derengî şevê ez bi kolanan ketim û dilê min bi min dişewitî. Ev çima dilê min weha min diajo ber deverên asê, ber hezkirineke weha ku heyfa bêdengiya zêdeyî sîh salî hiltîne. Ez qala girî jê re nakim. Mêr nagrîn! Ne mirina kesên nêzîk, ne jî ewqas zehmetî û tenêtiya xerîbiyê û bobelat û tengasî nikaribûn hêsrekê ji çavên min derxînin. Tenê hezkirina wê dikare çavan bike kaniyên hêsrên. Ji derveyî hevoka “Ez ji te hez dikim” ez ne dixwazim tiştekî din bibêjim, ne jî dizanim wê çi bibe. Zora hiş çûye, ji bilî te tiştekî din nîne. Rastî hezkirina te ye. Doz tu bixwe yî. Jiyan tu yî. Nizanim çima hezkirin ewqas hest û xwestekên xerab bi xwe re tîne. Kî te bibîne, divê ji te hez bike, lewre jî xwesteka min ew bû ku hemû mêrên cîhanê kor bibin. Ez ji hevalên te aciz dibim dema ji bo silavê bi destê te digirin. Ez dixwazim rojekê lingê wê hevala te ya tim bi te re bişkînim da ku carekê tenê jî ez wê bi te re nebînim lê dîsa jî destên min li wê nagerin. Na! Çênabe ku ez vê xirecira di dil û serê xwe de tevde bêjim. Jixwe bîst deqe, têra du peyvan jî nakin. Hema yekser ez ê ala hezkirina xwe bilind bikim û guh bidim dengê wê yê şêrîn, bê ka wê çi bibêje! Bawer bike, nepejirandina hezkirinê, hêsantir e ji vê bêdengiya giran, ewqasî giran e ku ez dikarim ji dil bêjim tenê ew piştê li min dişkîne. Vê carê rê li bêdengî û li “erê û na”yê tê girtin. Înê saet pênc jiyana min dikeve ser rîyeke nû. Çawa dibe bila bibe, wê ji niha çêtir be. Ji ber wê hinek tiştan ji nav hev derxîne. Jixwe ev yek bêguman e. Qurbana te me înê zû were!

### **Roja îinê**

Ji serê sibehê ve ez li ser dengê çûn û hatina wî ya bê hedan li wan deran rabûm. Di ber dengê stranên evîne yên bi şewat re, ziq li dîwêr dinêrî û diramiya, bêdengiyeke seyr ew girtibû. Çavekî wî li saetê bû û yê din jî li telefonê bû. Carna ku awira me li hev diket bi min re dikeniya. Li benda saet pênc û guhertinên ku wê bi xwe re bîne bû. Wê rojê xwarin jî nexwar. Telefon bir oda xwe, dengê stranan hilda û derî li xwe girt. Ez ji wî bêtir, bi heyecan bûm û li benda encamên hevdîtîne bûm. Saet bû pênc, dengê stranan nema ji oda wî hat. Min fêm kir ku dest bi axaftinê kiriye. Ji ber ku min hesabê bîst deqan kir ku dirêj bike, ez çûm medbexê da ku qehweyekê ji xwe re çêkim.

Min rahişt fincana qehwê û vegeriyam odê, ji nişka ve deriyê oda wî vebû û bi rûyekî çilmisî û sar ber bi min ve hat:

- Çi bû? Hîn pênc deqe derbas nebûne?

Bêçare dostê min rûnişt û mîna bi xwe re bipeyive:

- Min tiştêk fêr nekir.

- Ew çima? Qey çî got?

Weke ku ez li xwe binêrim. Weha di demên têkçûnên mezin de çavên min bêhêvî, lêvên min ziwa û zimanê min bi zorê digere. Hate bîra min ku ji birakî bêtir ev mirov dişibe min.

- Min silav lê kir, wê bi kêf vegeand. Min jê re got ez ê yekser bê vir de wir de bêjim. Hema min ev gotina xwe got û ne got, bersiv da:

- Eger ew mijara berê be, ne pêwîst e tu qal bikî. Ez lava dikim.. ne pêwîst e tu qal bikî.. ji bo ku tu ne min û ne jî xwe aciz bikî.

- Êêêê... te çî got?

Dostê min rabû ser xwe. Piştî xwe da min. Ji paş de jî dişibiya min, zivirî û serê xwe berda ber xwe:

- Ma ez ê çî bêjim. Jixwe min jê re got, ew mijar e û ez tu carî naxwazim te aciz bikim.

Min xwest ez hinekî li ber dilê wî bidim berî ku derkeve:

- Dibe ku ji te hez dike, lê rewşa wê...

Hîn gotina min di devê min de bû, li min zivirî, bi çavên tije hêsir û kenekî sivik serê xwe hejand û derket. Piştî derketina dostê min, kela girî kete qirka min û min kir û nekir ku ez vegeim karê xwe, min nema karîbû. Dibe ku têkçûna min a di evîne de hatibe bîra min. Yan jî, ji ber ku min jî berê hezkirin dîtibû û ev eş derbas kiribû, yan jî dibe ji ber ku ev mirov gelekî dişibe min, lewra jî şewta dilê wî xwe berda nivê perrê dilê min.

Wê rojê dostê min venegeriya malê. Roja din li cihê karê wî berî ku ez lê bipirsim, wan lê pirsî. Piştî çend rojan bêrîkirineke ecêb da ser min, min bêriya wî dikir. Xanî li min vala bûbû, cilên wî, çentê wî, hûr mûrên wî hemû li cem min mabûn. Ez pê hesiyam hetanî bi dîwar û deriyên malê jî bêriya wan peyv û xeyalên hezkirinê kirine. Nizanim çawa wê şevê ez di xew re çûm. Di xew de tiştêkî giran ketîbû hembêza min. Min destekî xwe peland, laşê min germ bûbû, min



destê din jî peland, dema min destên xwe hişk li qirikê gerandin, min hişk bi qirika apê xwe girtibû û min xwest wî bifetisînim, rûyê wî ket rûyê min, ez ji xew veciniqîm. Dengê teqreqa derî hat. Ez bi lez rabûm. Min ji xwe re got, ji sedî sed dîsa dostê min e, cara din jî min apê xwe di xew de dît, dostê min hat, niha jî ew e. Bêyî ez li ber xwe binêrim min derî vekir, ez rû bi rû li hember keçeke spehî, çavzelal û lihevhatî mam, em herdu mat man, ez li benda dîtina dostê xwe bûm, weha jî ew keç li bendê bû ku dostê min jê re derî veke:

- Merheba, ez Meryem im, Ferhad li vir e?

Çav li xew min bersiv da.

- Erê, ez Ferhad im, kerem ke.

Hinekî bêdeng ma. Di wê kêlikê de ez jî hatim ser hişê xwe û bixwe hisiyam ku ew ne li min, lê li dostê min dipirse.

- Ez bawer dikim, şaştiyek heye, ez li Ferhad dipirsim.

- Haaa! Bibûre, na wele... ev çend meh in ku min ew nedîtiye.

- Baş e... bi xatirê te.

Berî ku Meryem biçê, min bêhemdî xwe bang kir:

- Meryem.

Bi zivirandina wê re, ez di çavên wê de li dostê xwe geriyam.

Gava ev hevok ji devê min derket:

- Ferhad pir ji te hez dikir.

Min di çavên wê de, ne Ferhad, lê min hêsir dîtin. Meryem bi dengê nerm û nazik got:

- Ez zanim.

Û çû...

Bi çûna wê re ez vegeyriyam hundir da ku bilez cilên xwe li xwe kim û biçim mizgîniyê bidim Ferhadê ku çû û riya vegeêrê wî da kir. Min dixwest ez jê re bêjim tiştê ku wî nikaribû bêje, min ji wê re got. Divê bibihîze, divê...

Li cem hemû dost û heval û nasan, li her bajarî, li her deverê, min lê pirsî... Ji wê rojê heta vê kêlikê ku ez vê çîrokê dinivîsînim pêjna wî li tu deverên dinyayê nehat.

Divê ez rojekê wî bibînim û jê re bêjim.



## **JINA HEFTSERÎ**

### **Çawa navê Amûdê bû Amûda Şewitî**

Wê êvara sar, ji wê zivistana bêbext, gava bavê min mîna birûskê kete derî û bi ser diya min de qîriya:

- Ew te çi dîsa li ser êgir ji bîr kiriye keçê?

Min got qey wê aniha filmekî din ji filmên tirsê yên bavê min dest pê bike, weke cara din, diya min kortik danîbûn ser agir û bi cîrana me re ketibû axaftinê. Bavê min ê birçî wê rojê mal serobinoyî hev kiribû. Lê vê êvarê diya min jî behetî mabû û bi hev re, ber bi tifika vemirî û papora xerabe de, bazdan. Diya min ber bi min ve hat:

- Ev bêhna sewatê ji ku tê lawo?

Bêyî ku ez biramim min destê xwe ber bi aliyê ku ba jê tê de vekir û min got:

- Ha ... ji wî alî tê.

Hîn pîrsa diya min di devê wê de bû gava cîranên me jî ketin derî û heman pîrs kirin. Hemûyan bi hev re bazdan ber bi aliyê ku ba jê dihat ... bayê mirinê bû! Li Amûdê, mala me dûrî navenda bajêr bû. Dema ku tevde çûn û ez tenê di nav wê reşayiyê de hiştim, her kesî xwe li cihê qerebalix û bêhnê girtibû û bazdida. Ji ber ku ez biçûk bûm, ne min wêrîbû ez derkevim, ne jî min wêrîbû serê xwe di derî re derxim nav tarîbûna wê çola reş a ku mala me di nav de hatibû çandin. Wê kêlikê min tirs nas kir.

Diranên min li hev diketin. Ez giriyam. Ez ji dengê xwe tirsiyam ku here kesekî, cin be, diz be, yan reşikê şevê bê min birevîne yan bikuje. Mîna jûjyeyekî xwe di qalixxîne min xwe di quncikekî oda bavê xwe de xistibû bin mitêlê. Ji nişka ve derî vebû û serê jineke çavzer û porgij kete hundir, pê re lingek jî. Piştî seriyekî din û yekî din û yekî din... Jineke cilreş, çavtirsiyayî û reqsok, rûqermiçî û sar bi her çar çavên xwe ez dixwarim. Dengê dilê min dihate guhê min. Min nema karîbû bikira hawar. Zimanê min di devê min de şikestibû. Bêhneke seyr ji aliyê çepê yê sînga min dihat. Bavê min hate bîra min. Naxwe bêhna şewatê ji dilê min dihat û min berê wan da aliyê ku ba jê dihat. Ji cezayê ku wê bavê min bida min ez ditirsiyam, lê gelo wê sax bigihiştana ser min? Gava min xwest ez dilê xwe vekim, çarde dest dirêjî devê min bûn û pê re heft serî. Lê berî ku bigihên min, fîzîni bi lingên wê ket û mîna babelîskeke li hev geriya û bi xuşîniyeke lezok çû û cihê xwe da bédengiyê. Tirsê bayê wê şevê sartir dikir. Pê re dûmaneke sar dihat, bêhneke seyr, ezmanekî tevlihev, erdeke bi stîrî û berî hemûyan dilekî sar, tenê û qefilî. Wê êvarê heta bi mala me hatibû guhertin. Xaniyekî cemidî, kelpîçên wî ji xemgîniyeke kor hatibûn çêkirin. Xemgînî û koranî ji dêvla herrî û kayê ve hatibûn bikaranîn. Beştên wî ji êşeke lal û pencere ji agirekî kerr ku hawara tu Xwedayî ne dibihîst, gava ku bi xezeb dil dişewitandin.

Wê şevê dê û bavê min dereng vegeyriyan malê. Hindik mabû rih ji min biçûya gava ku diya min bilez kete derî, ez di hembêza xwe de veşartim û giriya.

- Qey çî bûye, yadê?

- Na lawo, tiştê nebûye.

Ez bêtir tirsiyam ku bibêje bêhna şewatê ji sînga min derdikeve, lê diya min li dunyayeke din bû:

- Naxwe hûn çima wilo dereng man? Û tu... ditirsî?

- Tirs? Na lawo, na! Tenê vê êvarê jineke xerîb, cilreş, porgij û heftserî hatibû Amûdê.

Peyvên diya min ez behetî hiştim. Naxwe her tiştê li ser vê jinika ku ez qutifandibûm dizane. Min jî da dû û min dîsa pirsî.

- Navê jînekî çî ye yadê? Berî niha jî hatibû Amûdê û wê dîsa bê, yan na?

- Erê, lawo. Berî bîst û sê salan careke din hatibû vir. Ev cara diduwan bû. Xwedê me ji ya sisiyan bistirîne lawo.

Gava min dît ku diya min naxwaze zêde bibêje, min xwest ez tenê navê wê nas bikim:

- Yadê, pirsra dawî. Navê wê jinikê çi bû?

- Navê wê “şewatê” bû, lawo. Îro şewat hat navê xwe da Amûdê û çû.

Ji wê rojê heta îro navê vî bajarê ku Xwedê ew ji zû de di nav konikê pîrebokê de jibîrkiriye maye Amûda şewitî. Ramanên min yê tevlihev ez mîna qazîmazî teqlomeqlo dikirim. Naxwe ev agirê kevn yê di sîngê de vêtetî ku rojê deh caran vî dilî dişewitîne mirov dikare çi navî lê bike gelo? Hîn pirsra min li ser zimanê min bû, piştî çel û yek salî careke din pêjna wê jinika çavzer, porgij, cilreş, rûqermiçî û heftserî hat. Min çavên xwe li dora xwe gerandin... Ne bav, ne dê, ne xwişk, ne heval, ne dost, ne kes û ne kûs. Tenê ez û ew jinika rûqermiçî, porgij, heftserî û qerese. Dunya reş û vala bû... Me li çavên hev dinêrî...



## SÎNORÊN BOMBEKIRÎ

(Jînenîgariya malbatekê)

Destar digere, hêdî hêdî, bê dest digere. Hestiyên mirovan dihêre. Xirte xirta wî di nava hinavên bêdengiyê de belav dibe. Hinek hestiyên din li benda dorê ne. Hestiyên serî, yên lingan, destan, pî, parsû hûr hûrî dibin. Ji nişka ve qurpînî ji hestiyekî hat. Tayek ji dûmanê ji devê destar dikişe, mîna pêlekê dûman bi valahiya ezman ve bilind dibe, dikeve wêneyê birayê biçûk. Ew bi xwe kalekî por spî ye, ling seqet e, rî dirêj û gij e çav bi hêsir e, şûna birîneke biçûçik li ser eniya wî ye. Xwîn pêve ziwa bûye. Berî bipeyive “xuşîna” marekî tê, mar berê xwe pê ve dike û ziq lê dinêre, dixwaze êrîş bike, ew jî dixwaze ku bireve, lê belê lingên wî alîkariya wî nakin. Him çavên wî, him jî çavên mar beloq û bi tirs diçirisîn. Ew gelekî dizivire. Tevî ku li orta çar rêçên dirêj rûniştibû jî, tu kes nedidît, dihat ku bigirî. Ji nişka ve mirovekî piştpan û bêserî li ber wî şîn tê. Gopalekî dide destê wî û piştta xwe dide wî û dimeşe, ew jî bêyî ku têkeve ramanan gopal ji dest wî digire. Têlên bi stîrî û lihevgeriyayî û sînoren bombe-kirî yên ku laşên mirovan perçe perçe dikin û tozê û dûmanê radikin, hate xeyala wî. Piştî kêlikekê diqîre mirovê piştpan:

- Biraaaaaaaawooooo..... sînor hemû bombekirî ne, vegere... vegere.

Mirovê bêserî ber bi bakur ve dimeşe, dilezîne, piştta wî hêdî hêdî biçûk dibe, dibe şanek di rûyê Aso de, dibe weke qula derziyê.

Kalo û mar hîn li ber hev in.

Dema xwe dide ser gopal û radibe ser piyan mar bi paş ve vedikişe û dide pey şopa wî mirovê bêserî, hêdî hêdî mar dibe ta û xwe ber bi qula derziyê ve zirav û dirêêêêj dike. Kalo keserekê dikişîne. Li ser kevirekî rûdine û berî dest bi çîroka xwe bike ji nava dûmanê du leşker derdikevin, li dengê kalo guhdarî dikin, lê wî nabînin. Bi keftelêft didin pey deng. Ji tevgera wan xuya dike ku dixwazin cihê kalo nas bikin û zanibin ev dengê -geh nizim û geh bilind- ji ku tê. Lê kalo xirecira wan di ser serê xwe re diavêje û dest bi çîroka xwe dike.

Niha rehmetiya pîrika min di bîra min de ye, tim li min dinêrî û digot:

“Xwezî ez hestiyê ber lingê segan bama û ne biçûkê birayan bama.” Ev gotin piştî şiqamê got. Şiqama ku birayê min ê mezin li min xist, ji ber ku tasek av ji min xwest û min xwe ji bîr kir û ez pey lîstikên zarokên weke xwe ketim, lê bira dimîne bira. Erê ez biçûkê bira me, lê wisa li min nenêrin ku kalekî dunya nedîtî me. Na, bûyerên sed salan di dilê min de zîl dane, min êşa malbata xwe bi xwe re hilgirtiye. Tiştê ku hatiye serê me neyê serê gurên çiyayên. Ev êş ne ya îro ye û ne ya du sal û deh salan e, şaxên vê êşê dirêj dibin valahiya dîroka kevn û ya tahl, ya xiniz û windayî. Ez ê hema ji sedsala şazdehan ve dest pê bikim. Ji bo hûn zanibin ku mirovên kevn, weke min temendirêj bûn, ne weke we hûn mirovên vî zemanî ku hûn bi zorê heftê heştê salî dikin yan nakin. Erêê... me got sedsala şazdehan weke xewnekê tê bîra min, xewneke giran.... pîr giran.

• Wê demê kerwanên bazirganan hebûn. Roj bi roj kerwan hindiktir dibûn, kerwanê mezin ê biçûk diwaxar. Xwe li ber nedigirt. Heta ku li vê rojhilata fireh du kerwanên mezin tenê man. Zêdeyî carekê li hevdu rast hatin bêyî ku şer derkeve, lê ne her tim wê ev rasthatin bê xwîn derbas bibe. Ji ber ku gundê me di çiya de bû rêya herî girîng di ber re derbas dibû. Tê bîra min, ji me re xewn bû ku em jî rojekê mezin bibin û bibin xwedî kerwan. Kerwanê bi hesp û kerên barên giran û siwarên bi şûr û mertal, bi tîr û kevan di ber me



re diçûn. Ew li hespên xwe yên rawan siwar dihatin. Em jî li hespên ji heriyê. Wan şûrên bi çîrûsk hildigirtin, me jî bi şûrên ji textikan hevdu birîndar dikir. Her ku pîrika min tenûr çêdikir, min hespekî ji heriyê jê dixwest. Pîrê mû ji keziyên keçikan û ji bizinan jêdikirin û dixistin nav heriya tenûrê. Di tenûrê de heriyê bêtir xwe bi hevdu digirt dema hesp ji min re çêdikir. Piştî herî hişk dibû te yê bigota qey ev hespekî ji hesin e. Bi qêrîn ez li hespê xwe siwar dibûm û min şûrê xwe yê textikî bilind dikir. Gelek caran min û birayê xwe hevdu birîndar dikir. Em ji lîstikên zarokatiyê daketibûn dema kerwanan erd û rê û ezman û dunyaya me tevde li hevdu parvedikirin. Hetanî carekê herdu kerwanên mezin li “Çaldîran” -nêzîkî gundê me- li hevdu rast hatin û şerekî giran di nav wan de derket, şerê wan kişiya hetanî ber bi gundê me ve. Gundê me fireh, bi deşt û çiya, dar û ber bû, her kerwanekî destê xwe danî ser nivê gund. Piştî peymanên bi dizî û eşkere gund bû du gund. Kelem, koncal, kuştî û nobedar danîn ser sînor. Di vê germbûna şer de kalikê min dev ji cotê xwe bernedida û ji ser sicada nimêjê ranedibû, bê têgihîştin, di çûn û hatina xwe de digot:

- Ya rebbî ev çî ji hevdu dixwazin, ev çima hewqas ji kuştinê hez dikin?

Nimêj û cotê xwe berdeham dikir. Êvarê, dema kalikê min xwest vegere malê nikaribû ji ber ku di wê rojê bixwe de sînor ji gundê me re hatibûn danîn û heta êvarê kuştin tenê li hawîrdorê gund dipeyivî. Ji lîstikên qedere bû ku kalikê min bimîne li aliyekî gund û pîrika min bimîne li aliyê din û nema hevdu dîtin, hetanî mirinê. Em mabûn li cem pîrika xwe û ji wê rojê ve me doza dîtina kalikê xwe dikir, hetanî ku nameyeke devkî ji pîrê re şand. Qaçaxçiyekî bi xwe re anî, ji ber ku mirovê gundekî newêrîbû here gundê din, ji ber tîrsa sînor û fermanaran. Piştî demekê xeberên reş bi ser me de ewrên reş bi xwe re anîn. Di roja sozê de pîrê li vî alî sînor kalo jî li aliyê din hevdu nedîtibûn. Kalo ji sermê, birçîbûnê û bêcihbûnê û ji hêrsan xwe li sînor dixwe. Nobedarên başûrê sînor laşê wî kiribûn moxil. Li hêla din jî nobedarên bakur laşê pîra ku ber bi kalê xwe de dibeziya kiribûn nîşan û cendekê pîrê li vî alî û yê kalo li wî alî bang

li hevdu dikirin. Bi hevdu re dipeyvîn. Li hevdu dinêrîn û li benda hevdu bûn. Balinde -teyr û tîlûr - tenê li wan dicivyan.

Destar gerandina xwe berdewam dikir û hestiyên der û dorê yeko yeko dikeritandin, ew dikirin piçik û parî. Piştî çend salan birayê min, ne yê mezin yê din çû li erdê kalikê min bi cih bû. Me nas kir ku xwe bi saxî gihandiyê wir, lê bi temamî ji me qut bûbû. Bi wê qiriktaliyê dem derbas dibû û dizîvirî hetanî ku em ketin dema hestîxuran. Berê mirov dikuştin yan winda dikirin, lê piştî kuştina kalo û pîrê bi çend salan, em bi hestîxurên ku tenê hestiyên mirovan dixwarin, hatin dorpêçkirin. Ji goştê rojhilatiyan xweştir û bi tewaştir nedîtin. Xelkên şaristanî paqij bûn, şaristanî ji wan diweşiya. Ji bilî mafên mirovan qala tişteki nedikirin. Doza azadî, wekhevî, xêr û xweşî û mafên mirovan dikirin. Eybek wan tenê hebû, ew jî ew bû ku hestiyên mirovan dixwarin.

Hat xeyala wî:

(Di televizyonê de yekî guhdirêj û devfireh daxuyaniyek dida:

Mizgînî ji mirovahiyê re.

Derketina me di vê demê de pêwîstiyêke dîrokî ye, ji tevahiya cîhanê re û bi taybetî jî ji gelên rojhilat re...

Bijî wekhevî û mafên mirovan...

Û hema ji nişka ve xwediyê vê daxuyaniyê ji televizyonê qevazt û dev guhê temaşevanekî kir. Temaşevan ji desthilanîn ket. Ê guhdirêj û devfireh gep bi gep dest bi xwarina goşt û hestiyên temaşevan kir.)

Destar jî digeriya û birayê biçûk çîroka xwe berdewam dikir.

Hestîxurên seyr xwe berdabûn nav me. Plan û guftûgoyên bi dizî li dar dixistin. Ne tenê erdê gund lê belê hetanî bi laşê dê û bavê min li hevdu parvekirin. Min bi çavê xwe dît, ez zarokekî ku ji dest û ligan ve hatibûm girêdan û lal mabûm. Li ber vî dîmenê ku jê nayê bawerkirin. Du hestîxuran laşê diya min kirin du parçe ji destê hevdu circirandin hetanî ku di nêvî de bû du parçe û piçek xwîn jê neherikî. Goştê diya min di nav lep û diranên wan de bêyî xwîn jê bê, dihat cûtin. Ez zarokê bê ziman ji girî lal bûbûm, dilerizîm. Dema li bavê min civiyan, dixwestin wî li erdê xînin, min digot qey bavê min bi sed mêrî ye. Wî jî bi çavekî li berxwe dida û bi çavê din li tirs û

lerizandina min dinêrî, mîna diya min ji nişka ve ew jî bêyî xwîn jê bê bû du perçe. Hestîxuran tiştekan di dê û bavê min de nehiştin. Gundê me ku bûbû du perçe niha bû çar û li hawîrdorê gund sînor çêkirin, bombe çandin, nobedar danîn, çek û têlên li hev geriyayî, kuştinê tenê serê xwe radikir. Mîna xewnekê ye, dîrok tevde xewnên bêserî ne. Birayê min ku li ser xwarin û vexwarinê û di xweşî û nexweşiyê de heta duh jî em bi hev re bûn, îro bombe û tivingên nobedaran di nav me de serî hildidin.

Erê birawo.

Sînor tevde bombekirîne û bira nikare biçê cem bira, her gavek, her peyvek, her giriyeke û her kenek jî divê bi erêkirin û bi destûr be. Ji bo ez serê we neêşînim, ez ê hinekî qala birayê xwe yê mezin bikim. Dibe hûn tiştekan balkêş di jiyana wî de nebînin, lê dîsa jî dibêjim Xwedê bi serê gurê çîyan de neyîne. Êdî gur di şikeftan de nema dikarin vê rewşê bipejirînin.

Ne, we ev destar dîtiye çawa digere û hestiyar dike ard û toza spî. Erê, ew toza spî bi birayê min ê mezin dane xwarin. Ew xewixandin, hişê wî ji serê wî birin. Birayê minê heftê salî gêj û hişwendayî mabû. Carna şiyar dibû, bilez lê dihatin hev û ew dîsa dispartin xewê. Hetanî ku dermanê wan kevn û bê sûd ma. Gundên li çîyan belavbûyî ji çîya fêr dibûn ku xwe netewînin. Bêhna azadiyê xort û qîz li çol û çîyan belav kirin û... wê ji nû ve xewa kê bê? Nema tu kesî bi wan dikarîbû, ji ber vê bi dîwar û xaniyan ketin, ji jor ve firokên şer û ji jêr ve, tang û top û leşkerên çavgirtî. Gund dane ber agir, wey li wî be yê ku karibe ji vê dojhê bireve. Gundî şerpeze bûn. Kalan bê gopal xwe ji binê dîwarên xerakirî derdixistin. Jinên zik li ber dev, dilikumîn. Hawar hawara pîr û kal û zarokan li ezmanekî vala û li erdeke hişk belav dibû. Gund tar û mar kirin, koçberiyê dest pê kir. Yê ku xwe avêtin deryayên bajaran bêyî ku zanibin avjeniyê bikin, yê ku berê xwe dan çîyan. Çolê hembêza xwe ji wan re vekir. Êşê dilê xwe ji wan re vekir. Bi rê de, berî bi temamî ji gund derkevin, hesinekî daleqandî hebû, çend fişekan ew hesin qul kiribûn, bi çend fişekên din jî ev hesinê daleqandî mîna termekî li erdê rast bûbû. Li ser panayiya hesin bi zimanekî biyanî hatibû nivîsandin (Bijî Demokrasi) zaro-

kekî pêxwas û porgij, ku nû ji xew veciniqîbû, rabûbû bi ser peyva demokrasiyê de mîz dikir. Piştîre bi lez xwe gihand koça gundiyeñ reviyayî. Mîza wî zarokî toz û gemara li ser demokrasiyê dida alî.

Demokrasî paqij kir.

Serê wê şuşt, ji ber vê yekê demokrasiyê, bi dû bazdana wî de, diçirîsand, şewqa xwe dida seranserê cîhanê. Sed sala bîstan, bi vê demokrasiya serşuştî serê xwe hildida berjor.

Erê, de ka em veşerî rewşa malbata xwe. Me got, careke din berê xwe dabûn sînoren bombekirî, ê hat kuştin hat kuştin, ê mir mir û ê mayî jî di bin konan de bi cih bûn. Êdî dîwar tunebûn ku mirov bêje bûn sêwiyên ber dîwaran. Bûbûn sêwiyên bê dîwar. Li nav van sînoran jî bilî erdê tu der tunebû ku mirovê westiyayî piştî xwe bispêrê. Kesê ku ji birçîbûn û danîna kon biwestiya pal dida. Erd tenê ji wan re bûbû dîwar, dunya tevde bûbû maleke bi dîwarekî. Ne ezman jî firokên şer parastî bû û ne jî derdor jî kuştin û çekên giran parastî bûn. Her tişt li ber destan bû. Lê goştê laş, xwîna dil û hestên can yê germ wê ji çekên hesinî re çî bêjin? Hevpeyvîneke şermezar bû, bê dad û bê ol bû. Tenê Neteweyên Yekbûyî ala xwe li ber konan çîkandibû. Zarokan lîstik li hawîrdorê gerandibûn. Wê şevê ew zarokê xwas û porgij, lê xweşik, venegeriyabû bin kon. Dê û bavê wî kon bi kon lê gerian, ew nedîtin. Wê şevê kêma kes di bin konan de razan, her yek bi awayekî di sedemên windabûna wî de diramiya:

- Guran ew xwariye.

- Dibe dewletekê ji van dewletan ew xwaribe, yabo bi Xwedê ev dewlet ji guran hartir in.

- Venegeriyaye ber bi gundê xerakirî ve, zarok e .... qey tişteke li wir wînda kiriye.

- Bombeyên sînora tenê dizanin cihê wî li ku ye.

Di berbanga nimêja sibê de cendekê wî zarokê xwas û porgij, lê xweşik, di bin hesinê ala Neteweyên Yekbûyî de hate dîtin. Tişteke ecêb ew bû ku vî zarokê biçûk ala Neteweyên Yekbûyî li qirika xwe gerandibû û xwe fetisandibû. Hinekan jî bawer nedikirin, digotin destên xerîb ev paçik li qirika wî gerandine û ev karê mezinan e û tu carî zarok xwe bi vî awayî nakujin. Lê tiştê li ber çavan ev bû ku

vî zarokî xwe sipartibû mirineke reş û bêdeng, bêyî ku nalîna wî bigihîje guhên tu kesî yan tu “Neteweyan”. Sibehê ala Neteweyên Yekbûyî ji qirika wî vekirin û laşê wî bi aleke rengîn pêçan, gora wî gora yekemîn bû li derdora wan konên belavbûyî.

Bi kîn û ji berê bêtir, destar digeriya. Xirte xirta wî zêdetir dibû. Hestî, ji berê bêtir hûr dikirin. Vê carê xwîn jê diniqutî. Dûman ji hestiyên bilind dibû. Tayên dûmanê li valahiya ezmanên gundên xerakirî li hevdu digeriyan, dibûn gilok, ji wê gilokê herdu leşkerên kevn derketin, mizgînî didan hevdu, digotin:

- Me cihê deng nas kir.

- Me cihê wî nas kir.

Kalo hîn li ser kevir rûniştibû, li dûr dinêrî û dipeyivî, laşên leşkeran, nema xuyanî dikirin, tenê çekên wan xuyanî dikirin. Tivingên herdu leşkeran bi hev re amade dibin. Herdu tiving kalo ji xwe re dikirin nîşan, bi hev re teqînî ji herdu tivingan dihat. Toz û dûman ji kevirê ku kalo li ser rûniştibû bilind dibû. Fîşekên wan li kevir dikevin. Kalo, li cihekî din, li toza ku ji kevir bilind dibû û li şûna fîşekan dinêrî û dîsa çîroka malbata xwe berdewam dikir.

Hûn dibînin hetanî bi çîrokan jî li vî warî qedexe ne.

Lê xem nake, em gihîştibûn ku? Hê, erê, de ka hema em ê ji xerakirina gundan û ji kuştina zarokan dest pê bikin. Nû çîrok xweş bûye....

Hetanî vê kêlikê çîrok berdewam e.



## MEHA SÊZDEHAN

Di saet bîst û çaran de, di nav bêdengiya şevê de, ji nişka ve Cemîlo ji xew veciniqî û biryareke bê veger da:

- Divê ez bibim kujer (qatil).

Nema zanîbû çawa îro wisa zû di xew re çûbû. Dibe ku şiyar be jî ji ber ku şev û rojên xwe di nav xewnerojkan de derbas dikirin. Dema ji diya xwe ket her tişt di nav rewrewkan de bû. Rengekî zelal ê dinyayê tunebû. Hemû reng li nav hev diketin û dibûn gergerînok. Vê gergerînokê bi xwe ew kişandibû ber bi evîndariya rengan de. Reng li hev dicivandin. Geh bi firçê, geh bi kêrê reng di ser çavê tabloyê de lêdixistin. Dixwest bi wê kêlikê bigire, ew kêlika ku cîhan li ber çavên wî hatibû afirandin û pê re karibe vê cîhanê biguhere. Cîhaneke din çêbike. Bê hemdê xwe, Cemîlo xwe dît ku wênesaz jê re tê gotin. Hîn zarok bû bi hestên kalan dijiya û a niha jî bi hestên miriyan. Ji ber zarotiya wî ji wî hatibû dizîn xwesteka tohildanê dawerivîbû nava kezeba wî. Her ku hinek dixistin çav xwe de ji bo tola xwe jê hilîne, di deqeya dawî de tiştê diqewimî ku bo nikaribe. Ji lew re, her ku mezin dibû ev xwestek jî pê re mezin dibû. Cara yekem, dijî bav ev xwestek vêketibû. Mala wan hinekî li derveyî bajêr bû. Li ser riya di navbera bajêr û malê de, mala jineke bî hebû. Jineke spehî û devliken ku hişê bavê wî ji serî dizîbû. Cemîlo bîra tiştêkî nedibir, lê

wê rojê, mîna her rojekê ji rojên havîna kelandî, diya wî bi berbanga melê sibê re, ji bo karê malê, ji xew rabûbû. Bav jî çûbû sûka bajêr ji bo kirînê. Cemîlo, mîna çîçikê li pey kurkê, xwe ji dawa diya xwe bernedida. Gava ku didît diya wî bi hêrs diçe û tê, xwest têbigihîje bê diya wî çima ewqas zivêr û maddayî ye. Ji diya xwe pirsî:

- Tu çima ewqas acizî yadê?

- Ji ber bavê te yê xerab ku divê ji berî sê saetan de hatibûya.

- Ma çima bavo dereng ma yadê?

- Çûye cem jinka bî, li qewadiyan digere.

- Qewadî çi ye yadê?

- Tu mezin bibî, tu yê nas bikî. Hema tu jî wekî bavê xwe derne-keví!

Cemîlo piştî çend salan wateya vê peyvê nas kir, lê di wê rojê de, piştî vegera bav, qerebalixeke germ li dar ketibû. Gava bi bazdanê bi ser dengê diya xwe de hatibû, wê çaxê bavê wî şiqama dawî li diya wî xistibû. Mîna pirê caran bi destê Cemîloyê tirsîyayî girtibû û berê xwe da medbexê ji bo girî. Cemîloyê lerizî dixwest heyfa xwe ji bavê gewdegir û bihêz hilîne, lê nikarîbû. Di xeyala xwe de gir dibû, laşê wî dinepixî, cilên wî hêdî hêdî diqetandin. Gava dixwest berê xwe bide bav, ji bo tolhildanê, dinêrî ku hîn zarokêkî bêçare, jar û bêhêz e. Cara duyem ev xeyal li dibistanê pê re çêbûn. Rojên wî yên destpêkê bûn. Mamosteyê ku ji paytextê bû ew û çend zarokên din rêz kiribûn. Yeko yeko her yekî pênc darên xurt li kefa destê wan û pênc li ser piştê wan dixist. Piştî, bi zixurekî biçûçik, mamoste guhê her yekî ji wan difirkand û ew ji cênîkên wan bilind dikirin. Pê re kazîniya cewrikên birîndar ji wan diçû. Cemîlo li benda cezayê xwe bû, ji ber ku mamoste, ji bo kar û barê dibistanê, pere ji wan xwestibûn. Zarokan bi zimanê paytexta heftsed kîlometreyî dûrî bajarokê xwe nizanîbûn, têngihîştibûn û bê pere hatibûn. Kêlîka ku mamoste li nav çavên Cemîloyê biçûk dinêrî, bi zimanê xwe yê xerîb bi ser de dikir qêrîn. Cemîloyê ku bi zimanê dê û bavê xwe tenê dizanîbû nizanîbû mesele çi ye. Di nav xwêdana xwe de dima û kelogirî dibû. Ne dikarîbû bigiriya, ne jî kela girî qirika wî berdida. Piştî anîna pereyan, careke din, mamosteyê kurê paytexta



dûr û ziman dijwar ji wan û têngihîştina wan hêrs dibû û dixwest wan daqurtîne.

Hinek zarokan dest ji xwendinê berdan û hinekên din jî fêrî zimanê wî dibûn, yek ji wan jî Cemîlo bû. Hinek dihatin, dikirin nedikirin, fêr nedibûn. Xeyalên Cemîlo dev jê nediqeriyên. Gewdeyekî mezin û destin ji hesin dixwestin, da ku karibe bi qepera mamoste bigire û wî weha di erdê bide. Toz û axa wî bajarî seranser pê paqij bike. Hema xwe didît ku di nav xwêdanê de maye, hîn zarokê berê ye, bê çare û bêhêz e. Dîsa xewna wî ya tolhildanê diçû bi avê de.

Tabloya yekem ku çêkiribû wêneyê zarokêkî bû. Gewdeyê wî ji cilên wî mezintir bû. Cilên wî diçirîn û wî serê xwe di nav rengên tarî de derdixist û dixwest nexşê cîhanê bi temamî bişewitîne. Ji wê rojê de nas kir ku tablo pêkanîna xeyalên zarotiya wî ne. Vê yekê têkiliyeke giyanî, di navbera wî û rengan de, di navbera wî û paçikê spî yê tabloyê de, çêkiribû. Eger herdu carên berê dizanîbû wê heyfa xwe ji kê hilîne, cara sêyem, li ber nexweşiya xwişka xwe ya biçûk, yekcar ji desthilaîn ketibû. Nema zanîbû sûcê kê ye. Xwişka wî yazde salî bû gava niqutek xwîn li kêleka devê wê yê biçûk xuya kir. Dixwest ku razê lê nikarîbû. Gava keçikê xwest bêje ez tî me, tayê xwînê bi ser çena wê de herikî. Roj bi roj zer dibû, jartir dibû, bijîşk bêçare mabûn. Nexweşiya wê bê derman bû. Qanser (seretan) di xwînê de bû. Cemîlo li halê wê dinêrî û li ezmanê bilind û bêdeng dinêrî. Ji wê rojê de dixwest tiştêkî bişkîne, xera bike. Mirovkuj û mirovxwurên temendirêj jiyan zêft kirine. Diya wî digot:

- Lawo zîrarê negihîne mirovan ha, Xwedê napejirîne, wê Xwedê te ceza bike ha!

Ev cezayê giran ji vê keçîka biçûkî re ji ku hatiye gelo? Li ber çavên wî ye yên ku tevkujiyan çêdikin, bê ceza dimînin. Kîna dijî hêzên veşartî yên ku ev cîhan bi awayekî şaş saz kirine di dilê wî de şax dida. Vê carê xeyalên wî jî miribûn. Nema dixwest gewdeyê wî biwerime û cilên wî biçirîne û êrîşê bibe ser tu kesî. Kî di hundirê wî de kom dibû, hêrs mezin dibû, dibû rengên tevlihev, dibû qêrîn û li ser paçikê çar qorzî belav dibû, dibû tehdîdên kuştinê li ser zimanê wî:

- Ez ê tişteki xera bikim, ez ê îro hinekan bikujim. Ez ê îro tişteki bişkînim.

### **Sultanê tenêtiyê**

Îro piştî ku min neynik perçewerçe kir min nas kir ku ez heme. Berî wê ez li ber neynikê rawestiyam:

-Cemîlo... Tu mirovekî bê rû yî!

Min çiqasî dinêrî, min xwe nedidît. Min digot qey ez nemame:

- Cemîlo.. Tu dibêjî ez heme, lê rastî tişteki din e.

Ez wêran bûme. Tune bûme. Çawa her tişt, ji bilî rûyê min, di neynikê re xuyaye. Ez têngihîştim. Gava min ew bilind kir û ji jor de ew avêt ser betona hundir, bi pengizandina piçik û pariyên qizêza neynikê re, dilê min ket cih de ku êdî ez heme. Wê gavê qet kesekî din li cîhanê tunebû. Weke herdem dîsa dunya vala bû. Gava ez hêrs dibim bi xwe re pev diçim. Kêf dikim, bi destê xwe digirim û dilanê digerînim. Bi tena serê xwe direqisim heta ku di nav xwêdanê de difetisim. Ji xwe re distirê m heta ku diwestim. Tu dibê qey telefona min bê zengil e, carna ez dibêm qey xera bûye. Ez wê diceribînim.

Ji hinekan re vedikim da ku ji min re lêxin. Wê gavê ez nas dikim ku ne xerabe ye. Ji telefona destan li ya malê dixînim û ji ya malê li ya dest dixînim.

Ez hatime jibîrkirin. Kes ji kesî re ne vala ye. Çiqasî xelk li dora min pir dibin ewqasî bêtir tenêti dilê min dixwe. Carna gotinek, nûçeyek, merhebeyek be jî ji mirovekî benê tenêtiyê li qirika dil sist dike, lê ew jî nîne. Gelo ez nexweş im yan xelk tevde ji çermê xwe derketine.

Ey tenêtiya xweşik, hevala min.

Ey hevala kor.

Ji hemû hevalên kevn. Ji hemû yên nû jî bêtir tu nêzîk î. Hevala şevên weke werîsê êşê dirêj. Hevala rojên qop û diranketî. Ez çiqasî ji te hez dikim ewqasî ji te nefret dikim. Çawa evîndarek bêriya yara xwe bike, weha bêriya te dikim û gava tu têyî ez herdu çavên te dirijînim. Di kêlîkekê de mirov, bi tenê tê jiyane, pir rehet e. Di kêlîkekê de mirov bi tenê, dimre û diçe, dîsa rehet e. Lê ev salên dirêj ji tenêtiya di navbera herdu kêlîkan de çiqasî bênamûs in.

Tenêtiyê...

Ey diya min.

Rûniştî me pesnê tenêtiyê didim û... Tim çavên min li derî ne, li benda dengê lingê jinekê, jineke ku di navbera min û rawestgehê de şaş nebûbe.

Zanibe ku ne tenê rawestgeheke bêhnvedanê me.

## RAWESTGEHA JINAN

Roja wî îro bi pîrsekê dest pê kir. Mêrek dibe rawestgeh gelo? Pê hest dibû ku jiyana wî bûye rawestgeh. Jinek tê, jinek diçe, yek bi otobosê, ya din bi trenê, ya dîtir bi tirimbêlê, lê tevde bi yek awayî, weha ji nişka ve diçe. Her ku **jinek tê cem tenêtiya xwe dikuye û piştê jî gava kujerekî tenêtiya xwe ji xwe re dibîne**, wî tenê dihêle û diçe. Mîna gurê ku ji beratê têr xwaribe, weha piştê xwe dide wî û bê vegeer û poşmanî diçe cem yekî din. Li ber neynikê dîsa rawestiyabû. Jinên wî yeko yeko ji nav çavên tabloya ber wî derdiketin û jiyana wî dîsa serobinoyî hev dikirin. Rastî bû yan xeyal bû, baş nizane. Lê tenê dizane ku mij û dûmanê ew di nav xwe de nivkor kirine û nema dizanîbû çî bike ji bo xwe biguhere. Dixwest rahêje çakûçekî mezin û dîwarê vê rawestgeha ku jiyana wî bi xwe ye xera bike. Di vê nivê şevê de biryareke bê vegeer da. Divê pêk bîne. Ev biryar wê jiyana wî tevde biguhere, lê berî ku gava xwe ya yekem biavêje, jinên di rawestgehê re, yan di jiyana wî ya tevlihev re derbas bûn ji banê xanî bi ser hiş û dilê wî û paçikê tabloya wî de diniquftin. Dixwest bawer bike ku tenê jinekê ji bilî diya wî, jê hez kiriye, nikarîbû. Ji xwe re digot, dibe tevan ji min hez kiribe, dibe yekê jî ji min hez nekiribe. Berî vê û wê, tiştê ew şaş û mat hiştibû ku hemû siwar hatin, weha hemû jî peya çûn lê her yekê tiştê li ba wî jibîrkiribû, bêyî ku hayê wê jê hebe. Di wê kêlîkê de dest bi resimandina jina yekem kir.

## Wêneyê jinê

Amûdê, weke her car, ji bo du dilên evîndar goreke vekirî bû, cihê hevdîtîne lê peyda nedibû. Evîneke mêrkuj kezeb li min şewitandibû, şev li min kiribû roj û rojên min bi xewn û hewldanên dîtîne derbas

dibûn. Li ba min, weha jî li ba wê, ji ber malbatê, em nikarîbûn bihatana cem hev. Yeko yeko li cem dost û hevalan geriyam bêyî ku ez bigihêmin tu encamê. Tenê bi telefonê dema mala wan vala dibû, me dikarîbû li hevdu guhdarî bikira. Rojekê dengê wê di telefonê re herikî guhê min:

- Divê ez te bibînim. Eger Amûdê nebû, va ye Qamişlo nêzîk e, tevde sîh kîlometre dûr e.

Roja din, li Qamişlo, em hatin cem hev, xwişka wê ya biçûk pê re bû. Berî dema hevdîtînê, bi du saetan, ez li wir bûm. Min xwe li nasên xwe girtibû da ku li cem yekî ji wan ez û yara xwe hevdu bibînin. Berî ku ez neçar û bêhêvî vegerim min riya xwe bi dikana Zoro xist. Li ber derî rûniştibû, dendik diçizirandin:

- Tu dibê qey me nanek xwariye û pariyek daye te gidî. Ew çima tu weha madtirşî?

- Ez ê çawa ne xemgîn bim Zoro? Li seranserê vî welatî cihêkî biçûk ji bo hevdîtina mirov û hezkiriya mirov tunebe.

Zoro bi ken dev ji dendikên xwe berda:

- Tu helbestan ji min re dibêjî Cemîlo! Tu çima dest ji resman bernadî û nabî helbestvan?

- Ez ne henekan dikim Zoro.

Hîn min mesela xwe ji Zoro re digot, destê xwe avête bêrika xwe û mifte derxistin:

- Şansê te ji ba Xwedê heye Cemîlo, îro duşem e û ev neh sal in birayê min her duşemê bi jina xwe û zarokên xwe re diçin gund û piştî nehê şevê tîn. Eger heta nehan dem têra te bike, aha ji te re mifte û dostika xwe bibe malê. Mal tevde ser hesabê te ye.

Min li saetê nihêrî, nêzîkî sisiyê piştî nîvro dibû. Sisiyên de divê ez wê bibînim. Min xwesteka xwe ya dawî ji Zoro re got ku divê tenê ew me bigihîne malê û piştî vegere karê xwe. Zoroyê dendikhez bi kêf vegerand:

- Hema ji min nexwaze ez ji te re bi serê wê jî bigirim. Hemû tiştên din rehet e.

Wî kenê xwe berdeham kir. Ez jî bê bask firiyam ber bi cihê hevdîtînê de. Li wê derê min yekser teksiyek kirê kir û ez û wê û xwişka

wê bi hev re, me riya xwe bi Zoro xist. Zora dikan girt û bilez hat. Em gihandin malê, kursî danîn hewşê. Her deverên malê nîşanî me da û vegeriya karê xwe. Min jî soz dayê ku ez berî heştan derî li dû xwe bigirim û miftên wî lê vegeřînim. Wê kêlikê şûr simbêlên min nedibirîn. Du serkeftin bi dest ketibûn, dîtina çav, por, bisk, memik û lêvên ku hinavên min hilweşandibûn, ya din jî ku ez bi dilsoziya hevalê xwe Zoro, li ber wê, serbilind bûm. Nû Zoro derî girt û çû, bêyî ku em biramin, me xwe di hembêza hev de dît. Wê rojê bêhnêk jê dihat ku heta vê kêlikê ew bêhn ji kîjan jinê bê û li ku derê be jî, eger bê xwestin, ez amade me xwe di ber wê jinê de bidim kuştin. Piştî ku me rûyên hev di nav maçan de hişt, dengêkî mîna hime himê ji xwişka wê ya biçûk hat. Ez berdama û biken çû bi xwişka xwe ya matmayî ve:

- Wî... min xwişka xwe ji bîr kir!

Xwişka wê him sivik dikeniya, him jî fedî dikir. Me ew bir medbexê û me jê xwest qehwê çêbike û berî em wê tenê li medbexê bihêlin, min henekeke ku fêma kiribû kir:

- Bila qehwa te du saetan dirêj bike ha.

Bi "erê, erê xem nake" re, xwe bi çêkirina qehwê mijûl kir:

- Ez ê tenê qehwa xwe vexwim.

Min nas kir ku berê şîretkirî ye û dixwaze heta dawiyê alîkariya xwişka xwe ya mezin bike. Hêdî hêdî kêlikên ji bihuştê hatine dizîn nêzîk dibûn. Ew kêlikên ku ez û ew tenê, dûrî çavan, hevdu bibînin. Mala Zoro mezin bû. Me dest neda deriyên girtî, odeya herî nêzîk û ya derî vekirî, me berê xwe dayê. Hundir hinekî xuya dikir. Dema ji derve mirov derbas dibû, di nav wê tarîbûna sivik de, li bin wê siya hênîk ya ku agirê dil gurtir dikir, me xwe avête hembêza hev. Vê carê maçên bê tirs, mijandina lêvên tî û qirika gewr, bûbûn armanca talana lêvan, min nema dizanîbû ew çi dibêje yan jî ez çi dibêjim. Dem dema hevdu xwarinê bû, dema gez û xwîn vexwarinê bû. Dema tînşikenandina du hezar û şeşsed salî bû. Min weha bêyî ku cilên wê deynim. Memikên biçûk, spî û serîsor, li hewa dixwarin.

Digot:

- Ez dixwazim destpêkê ji lêvên te têr bibim.

Ji nişka ve lêvên wê di nav lêvên min de sist bûn. Bi çavî tirsî-yayî û rûyekî zer xwest min ji hembêza xwe derxîne. Hinekî tarîtiya hundir zêdetir bûbû. Mîna ku derî bê girtin û tava rojê, ya ku ji derve dihat, vemirîbe. Hinekî dereng hat bîra min ku derî vekirîbû. Gava deng ji wê nema derket û çavên wê bi derî ve mabûn daleqandî, ez zivirîm, tu çi bibînî?! Mêrekî dagirtî, simbêl reş û qalind, bi gewdeyê xwe yê gir derî li me girtibû û bi du çavên awirtûj ziq li me dinêrî. Min nas kir ku birayê Zoro yê mezin e. Pirseke seyr kir:

- Hûn kî ne? Hûn di mala min de çi dikin?

Berî bersivê, ji lingan heta serî, jina lerizî û rûzer dabû ber awiran. Min jî bi zorê perçeyên çend gotinan dan ser hev:

- Ez hevalê Zoro me û...

Bi hêrs pişta xwe da me û derket, bêtî ku li bersivê guhdarî bike. Dema min da pey, ez li jina wî û komek zarok pê re rast hatim. Li devê derî, li min zivirî:

- Ê, ne ez ê di şerefa Zoro... eger hevalên wî wek te bin.

Ez vegeyriyam ber bi yara xwe ya qutifî de. Di nav koma zarokên behetî re, me lezand û em derketin, yara belengaz dest bi girî kir. Xwişka wê bêdeng mabû û weha zimanê min jî nema digeriya:

- Te dît çawa li min dinêrî? Bi Xwedê ez qutiffim û ez bawer dikim ez ê nikaribim piştî îro zarokan bînim, nava min jê qetiya. Ev hemû sûcê te ye Cemîlo.

Heta bi stasyona tirimbêlan ez li ber geeriyam da ku dilê wê xweş bikin, lê derbê cih girtibû û ken û heyecana evîne cihê xwe dabû girî.

Ez jî melûl û bê mifte vegeyriyam cem Zoro. Bi lez, bi min ve hat:

- Ha, tu çima zû hatî? Qey hûn pevçûn? Kanî mifte?

Zoro qet bîra hatina birayê xwe nedibir. Gava bihîst, ji min bêtir behetî ma:

- Ne mumkun e yaho. Ev neh salên wî ne ku rojekê jî berî nehê şevê venegeriyaye. Ev çi şens li ser te ye?.. Hema hûn aciz nekiribin.

- Na, na, tenê xeber ji te re dan.

Zoro çizirandina dendikên xwe berdewam kir û kulmek da dest min jî:

- Dendik ji evînê xweştir in lo, vê carê nebû, carek din. Xem nake, evîn ji wek van dendika ye. Ne mirov jê têr dibe, ne ji bê yî wê dibe.

Min kir û nekir, min nema karî careke din wê bi tenê bibînim. Weha, di serê min de ev raman hate meyndin. Welatê ku mirov nikaribe lê eşkere yara xwe maçî bike, ne hêjayî soleke qetiyayî ye. Vêca, ez Cemîloyê reben, ez ê çawa bi vê firçeya xwe ya rebenok we-latekî biguherînim? Jin çû, dest bi resimandina wêneyê wê kir. Reng li nav hev xistin. Zêdeyî sed jinî paçikê tabloyê dagirtin. Valayiya di tabloyê de zêdetir dibû. Spîbûneke seyr paçikê tabloyê bernedida. Cemîlo ji nişka ve bixwe hisiya, nerî ku xirte xirta wî ye, bi firçeya ziwa û bêreng bi paçikê tabloyê ketiye. Fêma kir ku dîsa di nav der-xewnerojkên xwe de ye. Rûyên jinên wî serê wî di nav xwe de perçiqandibûn. Ji hawhawketî bû. Xwêdan pê ketibû. Heta jê hat, firçe avêt, li bin guhê dîwêr xist. Bi pehîn û mistan çû dîwarê hişk û bêdeng. Bêhna wî derneket. Bi seriyan çû dîwêr. Bi derba yekem re gêj bû. Weha tev cilan li erdê di xew re çû, tenê bigota ne îro belê ji berî deh salan de miriye. Birçî bûbû, dixwest ku paçikê tabloya xwe ya têkçûyî bixwe, cîhanê seranser weha bi hemû jin, giha û kevîrên wê daqurtîne:

- Min biryar daye îro, divê ez bibim kujer!

Lê çawa? Ev destê ku piraniya dema xwe di nav çîçik û qirik û ling û nazikiya jinan de qedandiye, wê çawa xwîne birijîne. Bi du çavên ji agir li tabloya xwe dinêrî. Li ber rûnişt, giriya, hêsrên xwe paqij kirin û bêdeng ma. Ziq li serê tiliyên xwe dinêrî, gava ku gurme gurm ji derî hat, zîqîniya şikênandina derî ew hişyar kir. Li destê xwe nihêrî, firça xwe virvirandibû û bêdeng li xwîne dinêrî. Peşkên xwîne bi dîwêr ve hilkişiyabûn, heşt polîs bi hev re ketin hundir. Xwîn herikîbû heta ber derî. Polîsan xanî tevde li na hev xistin, qeyd xistibûn destên Cemîlo yê rûziwa. Polîs li hemû deverê li kuştiyan digeriyan. Tişteke nedîtin. Cemîlo bi xwe re birin û bi dehan li wan derdorên li xwediyên xwîna pijiqî û herikandî digeriyan. Di nav destên wan de û piştê jî li girtûgehê, Cemîlo her û her ji biryara xwe venedigeriya:

- Divê ez hinekan bikujim. Divê ez bibim kujer. Vê carê nebû, meheke din, tenê meheke din, ez ê hinekan bikujim.

Polîsekî zîrek got:

- Dibe ku ev xwîn ji van jinên kuştî yên di tabloyê de herikî be.

Hemû pê kenîyan, yekî din xwest hinekî tişteki nêzîkî aqilan bêje:

- Dibe ku ev xwîn ya wî bi xwe be.

Yê dîtir qerfê xwe pê kir:

- Ev çawa bê birîn evqas xwîn jê hat? Ê, ev xwîn ji hespekî bê lê nabe sibe, îca çawa mêrekî wek vî Cemîloyê hejhijî.

Piştî kontrolkirinê, hate fêmkirin ku xwîn ya mirovan e û **divê yên kuştî bêne naskirin.**



## GERÎNOK

Cara yekem ku xwe di ser dîwarê hewşa dibistanê re avêt û berê xwe da keçîka ku jê hez dikir, hîn nizanîbû meseleya têkiliyên keç û xortan, jin û mêran çî ye yan çîma ewqasî bi şerm û qedexekirinê dorpêçkirî ye. Hîn zarok bû, ji lewre roja din mamoste lingên wî tazî kirin û ew dan ber daran heta ling lê werimandin. Wê rojê li ber çavên hemû zarokan dikuliya, gorê xwe winda kiribûn û qeytanê sola xwe avêtibûn hev, sol avêtibû ser sînga xwe, bi qeytanan bi stûyê xwe ve daliqandibû. Li malê berî bavê wî li halê wî bipirse, li gorên wî pirsî. Ji ber ku gore winda kiribûn, bav karê mamosteyê çavsor berdewam kir û ew da ber şiqaman:

- Ey serserî kanîn goreyên te? Tu vê zivistanê bê gore mayî, ez lawê te bim eger ez cotek goreyên din ji te re bikirim. Karê min nema, ez goreyan ji efendî re bînim!

Wî jî ji xwe re digot: (Ez mame bê gore, ew xwe diqeherîne, ev çî bav e!) Serma wê zivistanê jî hemû dicivîya û xwe berdida lingên wî yên xwas. Dilerizî, piyên xwe bilind dikirin ber devê xwe “hodikir”ê da ku wan germ bike. Ew difirkandin û him di mamoste û bavê xwe de û him jî di keçîka ku wêneyê wê yê agirî di nav serma û seqemê de dixemilî, diramiya. Wê carê cara yekem bû ku dixwest mezin be û zanibe wateya peyva exlaq çî ye. Gava mamosteyê zirz li ber bavê wî rawestiya û jê re got:

- Ew lawê te bê exlaq e!

Devê wî ketibû hev de ji ber ku nizanîbû exlaq çi ye û çima dîtina keçikekê ku jê hez dike bê exlaqiyeke weha mezin e. Sermayê avêtibû hestiyên wî. Him keçika ku jê hez dikir ji nişka ve zewicî û çû, him jî sermayê nema dev ji damar û hestiyên wî berda. Ew zarokê ku hezkiriya xwe û goreyên xwe bi dû hev winda kirin, ew bixwe, ev nivîskarê pêxwas û porgije yê ku a niha pirtûkxaneyê mala xwe tevlihev kiriye û mase li şûna televîzyonê ye û kursî li şûna komputor e û “globos”eke mezin li ber wî hêdî hêdî digindire û carna jî dizîvire. Pê re mîna serxweşekî xwas li muzîkeke tirsê guhdarî dike. Ji dêvla nivîsandina çîrokeke tirsê, ew bixwe bûye qehremanê çîroka xwe. Nema dikare peyvên xwe, hestên xwe, ji nav peyv û hestên wî kesê ku li ser dinivîsand derxîne. Ji piste pista wî tenê dubarekirina peyva “çima” dihate fêhm kirin. Diçû ber neynikê, li xwe dinêrî, kesekî din didît. Him pê dikeniya, him jê ditirsiya. Bi destan êrîş dikir, paş de vedigeriya, pê re dikir qerebalix:

- Tu jî yekî wek min î. Li têgihîştina xwe û cîhanê digerî.

Ew kes ji neynikê derdiket. Dihate cem wî. Li çavên wî dinêrî. Bi ser ve radibû:

- Ez ê te binivîsînim, te. Tu çima weha tevlihev û wendayiyî kuro?

Wî kesî globos bi xwe re digerand û hêdî hêdî ji hundir derket. Nivîskarê bê gore tenê bi çîroka xwe re ma. Li neynikê dinêrî, vala bû. Tiştê nedidît. Li dora xwe dizîvirî. Eeeew, min çiqasî bêriya xwe kiriye. Ez dixwazim xwe bibînim. Divê ez li xwe bigerim. Ez kî me? Çi hatiye serê min? Çi mesele ye? Çima? Çawa? Çilo? Kî bûn? Kengî? Kanî? Bêdengiyê ew di nav lepên xwe de guvaştibû. Ez nizanim çima tenê lingên min sar dibin. Laşê min tevde germ dibe. Lingên min, tu dibê qey qeşayê li wan xistiye. Divê ez binivîsînim, lê vê carê ez ê çi binivîsînim? Ev cara hezarî ye ku ez ê bi xwe bikenim û ez ê bêjim “rastî”, rastî çi ye? Li ku ye? Ev çend hezar sal in ku ez lê digerim. Çima binivîsînim? Ji kê re û çilo? Ev çi peyvên qelew in lo? Cîhana bûye soleke teng ku nema têra lingekî min dike. Ev cîhana mezin bê ser û ber bûye sola zarokekî şûm, lê tev wilo jî dîsa sol ji wan pirtûkên bênamûs çêtir e. Hema nebe bi kêrî lîngan tîn. Ev pirtûkên

zingargirtî ne bi kêrî lingan, ne jî bi kêrî seriyan tên. Reş bû ew roja ku ez tê de fêrî alfabejê bûm. Du hezar sal ji nivîsandinê, ji şaristanîyê, hîn nikarin bihuşteke erda azad ji giyanê min re veqetînin. Sol e sol, heyfa solê. Rih û canê min di solê de ye, sol jî teng e. Teng e heta wê radeya ku mirinê tîne bîra mirov. Hêê, ey mirina xweşik, ey hêviya dawî, qirşikê rizgariyê.

Pê re werîsekî badayî ji banê xanî hêdî hêdî dadiket, wî jî herdu dest ber bi werîsê, mîna “meşneqê” ve bilind dikirin. Kêfa wî dihat ku werîs nêzîkî destên wî dibû, lê werîs hinekî bilind dima. Divê ez xwas nemrim. Lingên min ji min ketin. Sermayê li hestiyên min xistiye. Lingên min diqefilin. Mirina bê sol û bê gore ne hêja ye serê mirîşkeke mirî. Diçe solê tîne. Dixwaze di lingên xwe xîne, çênabe. Dibeze kêrê tîne ji bo firehkirina solê. Ez nizanim çima her ku ez kêrê dibînim kuştin tê bîra min. Piştî ku di kuştinê de dirame, tê bîra wî ku divê solê biçirîne, solê bi hêrs diqetîne. Dîsa nakeve lingên wî, solê diavêje. Ber bi werîs ve diçe. Werîs bilind û dûr xuyanî dike. Bi destekî kêr girtiye û destê din datîne ser qirika xwe, ez ê çi bikim ji welatê tîrşik û şorba siyasetên rijiyayî, rij û kelî, siyasetên qirêj, bê derpî û bê gore. Mejiyê bê gore û lingên bê gore. Lingên min ji sermayê qefilî ne, tên ku ji min bikevin û serê min ji germê tê ku biteqe, lingên min qefilîn, serê min peritî. Xwêdana xwe paqij kir û di çêkirina derenceyekê de diramiya yan di anîna nêrdewanekê de da ku hilkişe û serê xwe bigihîne werîs û carekê tenê be jî mirinê bibîne. Tenê min dixwest ez, çend deqe bin jî, bi guhê mirinê bigirim û babidim û babidim û çiqasî ez dixwazim a niha bigrîm. Serê min diêşe. Dilê min diêşe. Porê min diêşe. Goreyên min diêşin. Lingên min diêşin. Neynûkên min diêşin. Tê bîra min carê min xwe bi nivîsandinê derman dikir, lê a niha ez çima nikarim binivîsînim. Wê dermanê min hebe gelo?

Nivîskarê bê gore berê xwe da pirtûkên xwe û mîna li tiştin seyr û neasayî binêre ew li nav hev xistin. Rahîştîbû pirtûka Eflaton û pê re dipeyivî. Gava vî ciwamêrî komarek ji xwe re ava kir, rê neda helbestvanan. Helbest û jehra nivîsandinê bi tevayî, dema dikevin damarên mirov, mirov rezîl û bêçare dikin. Xebera Eflaton bû, helbestvan an nivîskar nikarin cihê xwe di tu komaran de ji bilî komara

afirandinê de bigirin, lê ez nizanîm wî qala nivîskarên bi gore dikir an yê nê gore. Ev pirtûka çenda ye ku ez ê binivîsînim. Hibir û kaxet û gotin motin û gore. Xwezî min zanîbûya bê goreyên min bi kû de çûne. Lingên min ji min ketin. Xwendin jehra têgihîştinê dixîne laş. Nivîsandin jî bersiva jehrê ye. Ji ber ku dem ne dema nivîsandinê ye, jehrê hinav û damarên min tije kirin, ez kirime dûpişk. Dûpişkekî nivîskar im ez. Dixwest mîna dûpişkan bimeşe. Destên xwe vedikirin û xwe li hev ditewand. Li ser dest û lingan mîna dûpişkekî dimeşiya. Giyanê min tijî jehr û ziqûm, raman, çîrok û çîvanok, agahî, zanîn û derewww. Her tişt derew e. Tenê ez bi hewceyî goreyê me. Lingên min dixurin. Binê lingên min yê cemidî. Diya min digot, gava binê lingê te bixure, ax min ji bîr kir, tê çî wateyê. Gava sola te li ser hev siwar bibe. Li sola xwe ya li ser hev siwar hatî dinêre. Rê û koçberî li pêşya te ne. Lê tu car diya min qala xura dil nedikir. Eger dil bixure çî dibe? Dilê min dixure. Gava dil bixure evîne dixwaze, jinê dixwaze, jin kulmeke av e. Destê xwe dike mîna kulmê û lê dinêre, bi heyecan dinêre. Dest mişt dike. Aveke zelal, zelal û xweşik (dibişire) spehî û çak. Lê gava ku mêr dixwaze destê xwe lê bigire, (hêdî hêdî kulma xwe digire) jin ji nav tiliyan ve diherike, diherike. (Matmayî dimîne). Di destê mêr de tenê destê wî dimîne (destê xwe diqulipîne vî alî û wî alî). Ango ne tenê tişteke. Weke ku tişteke qet tunebe jixwe. (Xwe ji atmosfera xemgîn derdixîne û ji nişka ve) Xem nake, çima ez ê hinekî qala evîna xwe nekim. Carekê kumekî min hebû (kum dide serê xwe) min ji jinekê hez kir, hezkirineke weha ku hestiyên bav û kalikên mirov dişewitîne. Navê wê bêbavê Meryem bû. (Li vê derê ew keç tê ber neynikê, xwe dixemilîne û muzîkeke tenik bilind dibe). Her ku êşa evîne dida ser kezeba min, kumê min jî pê re diêşiya. Meryem ronahiya çavan bû, dil bû, rih bû, gul bû, mij bû, dûman bû, derya, ax, keskayî û ken bû. Hezkirina Meryemê êş xistibû kumê min. Rojekê tişteke hat bîra min. Ji nişka ve, min kumê xwe avêt. (Kum bi lez diavêje). Bi avêtina kum re Meryem jî çûbû. (Li vir sist û xemgîn dibe). Ne ronahî, ne gul, ne dil, ne rih, ne keskayî û ne jî ken neman. Tenê wê gavê min nas kir ku Meryemê ne ji min, belê ji kumê min hez dikir. (Dest bi vê strana folklorî dike û direqise).

*Ev kum ne kumê min e,*

*Şeref kanî kumê te.*

*Kumê hevalê min e,*

*Şeref kanî kumê te?*

Di vê jîyanê de gelek tişt hene ku nayên fêmkirin, yek ji wan vemirandina hezkirinê ye. Dema hezkirin vedimire serê mirov disincire û lingên mirov dicemidin û gelek tişt tên hilweşandin. (Muzîk him xemgîn him jî dengê hilweşandina avahiyekê tê). Gelek tiştan jî bi xwe re vedimirîne. (Ronahî vedimire, ronahiyeke pir sivik dimîne). Ev kê ronahî vemirandibû? Kê ronahî vemirand? Vêxînin. Derhêner şaş e, şanogeriya me bi dawî nebûye. Ne dema têkçûna ronahiyê ye.

Kê... ronahî... vemirand?

Carna mirov dibe zarok û qîma xwe bi bersivên dê û bavê xwe tîne. Hêzeke veşartî heye. Xwedayekî mezin heye ku her tiştî birêve dibe. Erd, ezman, stêrk, ewr, baran, roj û şev, şev û roj, serma, germ, derya, çiya, ax, lawir, balinde, çivîk, kurmik û ji hemûyan seyrîtir însan -mirov- du ling, du guh, du dest, du lêv, xwîn, damar, dil, xew, şiyarbûn û Xwedê, eew çawa evqas tişt weha lihevanîne, subhan ji te re Xwedêyo! Subhan ji mezinahiya te ya bêhempa re. (Straneke olî dibêje.) Gazinek min tenê heye. Te bi milyaran mirov anîn û birin, weha rojê bi hezaran dimrin, bi hezaran çêdibin, ez jî yek ji wan bûm, xem nake. Lê gazina min ew e, te çima ez bê gore hiştîme? Ling cemidî berdame nav van kitêbên kevnîk. Te ez xistîme vê xeleka kirêt û gilover. Radizêm û radibim. Radibim ji bo ku ez razêm, rojên min weke hev in, weha jî şevên min. Valaaa ye, valaaa ye. Viki vala ye. (Li paşîla xwe û li bêrikên xwe digere.) Navê min çi bû? (Dike nake nayê bîra wî) Çi bû? Çi bû? Tê bîra min diya min hebû, bi navekî bang li min dikir. Bavê min hebû. Erê, carna li ser min li hevdu dixistin. Yanî ez heme. Ma ez tune bûma wê çawa bihata bîra min ku bavê min porê diya min digirt û diya min dev li felqê gunê wî yê çepê dikir. (Radihêje cîhazê televîzyonê, bişkoka didewisîne. Dengê nûçeyan derdikeve.) Di vî şerî de duwazde kes hatin kuştin û pênc birîndar bûn. Trê li pirekê ket. Kamyon li turumbêlê ket. Ji bilî dubarekirina nûçeyên kuştin û mirinê çi heye? Nûçeyên hêzên mezin

ku ji herkesî bêtir karin kuştinê bikin. Ka wê ev sendoqa ku rojê bi kêmanî du sed kes tê de tîn kuştin, yan jî li hev siwar dibin wê çawa tîbûna rihê min bişkîne? Yan jî diaxivin, diaxivin (cîhaz diavêje). Ev Xweda çawa vê rewşê dipejirîne ez nizanîm. Ez xwe dixapînim. Ma ne xebera melayê gundê me bû, gava di pênc deqan de pênc hezar mirov li erdê bûn term û pê re gîha, mîh û teyrik mirin. Melayê gundê me pê re cube avêt û rîya xwe ya bi rûmet kur kir, digot, Xwedayê ku vê zilmê qebûl bike ez nikarim jê re nimêj bikim. Ev çawa van tiştan dibîne û berpirsiyariya xwe ji dunyayê nakişîne? Mirov divê erda xwe biguherin ne Xweda. (Sûretê erda gilover {globos} bi xwe re digindirîne û dipeyive, diçe û tê.) Min jî da benda komên belengaz melengazan, min xewn didîtin û li aliyê din çekên giran çêdikirin, artêşên xwînrij erd ajotin vî alî wî alî, rast û çep, çep û rast. (Erd di nav dest û lingên wî de dipelixe yan jî dişkê.) Mesele xerabû û her tişt li nav hev ket. Serê min dinepîxe ji germê, lingên min dilerizin ji sermayê û ez dixwazim bifirim, xwe li dunyayeke din deynim, laşê min alîkariya min nake, dixwazim bihelim, bibim dûman. Hate bîra min, piçkek toz (tozê mîna tozkêşan hilm dike.) Rojekê ez ê herim jora wî çiyayê bilind û xwe biavêjim, ez ê wek qantirekî serjêkirî xwe di xwîna xwe de bigevizînim, heta hiş û dilê min pûç bibin. Hilmek cixare tenê dikare baskan bi min veke û xwesteka min bi cîh bîne. Rojekê ez ê hilkişim ser serê çiyayekî û ez ê keviyekî têxinim devê xwe û ez ê xwe serserî biavêjim kûrahiya reşayîyeke bêbinî, belkî serê min li rastiyê keve û ez rehet bibim. Bimrim û hey bimrim, di mirinê tenê de dadmendî heye, di jiyane de na. Lê goreyên min? Kanîn goreyên min? Ez naxwazim bê gore bimrim. Wê lingên min bicemidin, pûç bibin, piştê ez ê çawa binivîsînim?

Dêyek min hebû. Navê wê çibû gelo? Min ew li ku winda kir? Bavê min kanî? Ez li kû bûm? (Bi herdu destan bi xwe digire). Min te girt. Erê, va ez heme. Eger ez hebim, navê min çi ye? Nasnameya min çi ye? Ez... Tu... Ew... Dê bav?.. Rojekê ez ê heriya zivistana vî welatê bêxwedî tevde rûyê diya xwe bidim. Di havîneke germ de ez ê keziyên wê bi ser serê wê de kur bikim. Erê yabo, ma te tu cîh nedît ku tu lê bi cîh bibî, ji pêvî vî sînore bombekirî û vê erda bênamûs? Divê ez binivîsînim. Min çiqasî bêriya nivîsandinê kiriye. (Li pişt

komputerê rûdine). Lê ez ê çi binivîsînîm û her tişt hatiye gotin? Ez ê çi bêjim û hemû raman ji qehpikan bêtir hatine ceribandin? Êdî çi heye ku dikare mirov xelas bike ji agir? Çi heye min xelas bike ji vê êşê û cemedê ji lingên min derxîne, goreyên min li min vegeftine? Ez çawa hatime avêtin ser rûyê vê erda zelût, wek piştî çêlekeke belek û kurmî? Dunya tevde di serê min de û serê min bi dunyayê re dizivire. Tîbûna giyan kûr dibe, fireh dibe, pan dibe, hêêê?

Ma gelo rastî çi ye? Li ku ye? Wê kî binivîsîne? Li ser çi? Wê kî bixwîne? Wê kî fêr bike? Wê kî çi bike û çima? (Tozê dikişîne û hêdî hêdî bi laşê wî re guhertin çêdibin). Ha wa ye min dît. Min rastî dît. Ji bilî mirinê her tişt derew e. Her kes ji bo dahatûyê dixebite. Li ser rojên ku wê bên dipeyive, ji bîr dikin ku tenê garantiya mirinê heye. Her tişt dibe ku bê û dibe ku neyê. Mirin tenê ji sedî sed wê bê. Lê mixabin bextreşîya nivîskar ew e ku dikare li ser mirina her kesî binivîsîne, lê tenê nikare mirina xwe binivîsîne. (Werîs ji berê bêtir dadikeve. Nivîskar li ber xwe dide da ku karibe serê xwe bigihîne cihê xenqê, lê laşê wî yê pûç û lihevbadayî alîkariya wî nake. Kêfa wî tê bi nêzîkbûna werîs). Rastî va ye nêzîk dibe lê wê kî mala xwe xera bike û binivîsîne. (Dema disekine hêrs dibe, dixwaze werîs bêtir dakeve).

Ey mirina xweşik,  
hevala emrê min,  
yara min,  
were were...

(Li lingên xwe dinêre). Lê kanîn goreyên min? Lingên min qeşa girtine û laşê min disincire. Cemedê li rehên lingên min xistiye. Gore ji min re divên. Kanîn goreyên min gelo?

(Bilindbûna werîs, hino hino, bala wî dikişîne).

Ev çi dibe li dora min? Çi diqewime? Kî wilo dike? Ez li ku me? Ev çi ye? Lingên min?

Xweziya dawî dût dibe.

Goreyên min. Dilê min. Rihê min.

(Ziq li werîs dinêre, bi herdu destan jê re dibêje were, werîs jî bilind dibe û diçe).

Yek xwezî bi cîh nayê. Çima wilo? Çimaaaa? (Bi çima... ya dirêj re serê xwe datîne ser pirtûkên qalind ku jê re dibin balîfekî hişk).



## BERLÎN BÊÇAV E

*Ji bo Jan Dost,  
hevalê welatê diranketî û xurbeta devkox*

Bi gava yekem re ku min lingên xwe danîn ser erda Ewropayê

- Yabooo, va ye ez sax giham Ewropayê.

Dengê bavê min ji dereke kûr û dûr di têlan re diherikî:

- Baş e lawo, destê Xwedê li piştê te be, bi Xwedê tu ne ji muxaberat û polîs molîsan tenê, belê tu ji miriyan jî xelas bûyî.

Di wê kêlikê de, ligel ku bi hezaran kîlometre di navbera min û bavê min de hebû, ez bi hêsrên di çavên wî de hisiyam. Him dilê xwe dixist çih, him jî dixwest bi henekan kêfa min bîne. Tev ku henek nedikir. Ji ber ku jiyana min li welêt, bi rastî jî ji ber nivîsên min û çûna goristanê ya rojane ku ecêb bêhnna min pê vedibû, di navbera çûna cem muxaberat û polîsan derbas dibû. Hema hema têkiliyên min bi saxan re nemabûn. Wan bi çavên mirovekî beradayî ku daye dû çîrok mîrokan li min dinêrîn ku qet nedikarîn tiştekî ji min û ramânên min û berhemên min fêhm bikirana. Yan tênedigihîştin, yan jî têdigihîştin ku min li ser kîjan kesî û malbatê nivîsandiye. Diçûn ji wan re digotin û em diketin qirika hev, diya min jî şaş mabû:

- Ev tu çî ji xelkê dixwazî lawê min, tu çîma li ser wan dinivîsînî lawo? Wele wê rojekê hinek derbekê li te xînin ha qurban, ji xwe re çîrokên cin û dêwên heftserî û gur û roviyan binivîsîne lawo.

Ligel ku bajarokê me biçûçîk bû jî her kesî hev nas dikir, lê min ji saxan bêtir mirî bi riya kêlên gorên wan nas dikirin. Nizanim çîma ewqasî bêhna min li goristanê derdiket. Rojê min du sê gorên nû ji nêzikayî nas dikirin û min jiyana wan miriyan di xeyala xwe de mîna filmekî li hev vedigerand. Îca ez rojane dibûm mêvanê miriyan, hetanî ku bêtir nivîsên min belav bûn û ne tenê xelk, belê muxaberatan jî dest dirêjî jiyana min kirin. Her hefte, bi kêmanî carekê, divê ez biçûma cem wan. Ji hêlekê de kêfa min dihat, ji ber ku hemû nivîsên min dixwendin û ji hêla din de jî li gor xwe şîrove dikirin. Tirs û tehdîda bi heps û windakirinê bû kabûs û xwe berda ser sînga min. Ji ber vê, gava ku li cihê penaberan yê dozger pirsî, gelo xwendevanên pirtûkên te hene, min go erê, ji her kesî bêtir çend endamên muxaberatê bûn. Va ye zêdeyî pazdeh salan in ji kurdan re li ser hezkirinê dinivîsînim, lê bawer bike, heta vê gavê, ji ber ku ez nivîskar im, keçeke kurd negotiye ez ji te hez dikim. Dozger keniya û trajediya min bi awayekî komedî fêhm kir.

Rojên destpêkê xwe li hevalekî xwe girtibû ku tenê nivîsên hev xwendibûn. Gava hevalê wî yê dilsoz ku pênc salên wî bûn li Ewropayê bû, jê re got, em mecbûr in ji bo bidestxistina mafê penaberiyê herin cem polîs, tiştê di nava wî de şikest û ji xwe re got:

- Dîsa polîs.

Simbêlên reş yê serokpolîsê bajarê wî yê li welêt, hatin bîra wî ku devê wî bi temamî winda kiribûn û çavên wî yê sor ku di nav rûyê wî de mîna hevîrekî tîrş beloq diman. Pê re pê re xemgîn bû, lê neçar berê xwe dane cihê polîs. Hevalê wî, ji bo wergerandinê, pê re derbas bû cem jineke spehî, xwînsêrîn, milên wê yê rût av bi ser devê wî xistin û ji ber çavên wê yê xweşik şerm kir hingî kûr li wan nihêrî, şanikeke reş jora lêvên wê xemilandibû. Bi kurdî ji hevalê xwe pirsî, kanî polîs, hevalê wî berê xwe bi jina spehî vekir û got, ev e. Pê re devê wî ma ji hev, lê qet deng ji xwe neanî, weke ku ne ew bû yê ku veciniqî û bi dizî ji xwe re got:

- Ev cara yekem e ez polîseke weha xweşik dibînim, bi Xwedê eger polîsên welatê me weha xweşik bûna ez sed û salekê ji welatê xwe nedireviam.

Dengê hevalê wî ew ji nav pêlên ramanên wî yên tevlihev derxist, jê re gotinên wê şîrove kirin:

- Divê tu biçî gundekî hinekî dûrî Berlînê ye. Tu mecbûrî heta demekê li wir bimînî û heydê em herin, karê me li vir nema.

Rahişt kaxet maxetên xwe, lê çavên wî mabûn bi wê jinê ve û di devê serokpolîsê di bin simbêlan de veşartî de diramiya û ew didan ber hev.

Piştî ku derketin, berî li rewşa xwe bipirse, ji hevalê xwe re got:

- Ka em herroj herin cem polîs lo! Ez ji tirsan re ji duh de ketime hev de ji bo hatina cem polîs, te jî nedigot ewqas polîsên xweşik li vî welatî hene.

Hevalê wî bi ken lê vegerand:

- Netirse, tu yê pir caran bêyî ber destên wan.

Piştî nas kir ku divê here kampa penaberan, li wir çend rojan an çend mehan bimîne û piştî lêpîrsînê vegere.

Çend roj derbas bûn, jê re gotin mehkema te ye, bersivên hemû pîrsan, weke nivîskarekî ji xwe razî, dan û vegeriya cem hevalê xwe.

Mîna teyreki ku nû ji qefesê filitîbe û li ezmanekî fireh û sayî rast hatibe, herdu destên xwe mîna du baskan di nav bayê hênîk yê şevên Berlînê de li ba dikirin û ji xwe re digot:

- Ev dunya bê muxaberat û girtin çiqas xweş e.

Cara yekem ji çûna cem muxaberatan hate bîra wî û keniya. Gava şandin dû û gotin divê tu biçî -beşê Filistîn yê muxaberatên leşkerî. Bi xemgîniyeke mezin xatir ji hemû hevalên xwe xwest, ji ber ku nizanîbû gelo wê careke din wan bibîne yan na, nexasim berî wî pir kes çûbûn wê deverê bêyî ku vegerin. Hinekan jî jê re gotin ku berî lêpîrsînê divê ew haziriya xwe û lîxistinê bike, lê ne ev bû ne jî ew bû. Nû kete hundir, ew birin odeyeke biçûçik û ew şilfî tazî kirin. Ew cara yekem bû ku zilamek hemû deverên wî, weha tazî dibîne, ji lewre bê hemdê wî destên wî çûn ser nav şeqên wî û dixwest xwe veşêre. Pir pê zehmet bû gava derpiyê xwe jê re daxist da ku hemû

cilên xwe bide dest wan û herdu destan hilde. Bi xwe dikeniya gava di wan kêlîkên dûr de diramiya. Wê çaxê jê we ye ku êdî dawiya vî halî nayê û wê tim û tim bimîne niştecihê Siwîsreyê -ev bû navê girtîgehê yê sembolîk- lê va ye sipîsax li Ewropa bi cih dibe û li bajarekî bi her tiştê xwe xweşik, Berlîn, avahî, kolan, xelkên aram, jinên spehî, bê tirs, bê peykerên serokê mezin, bê fotografên wî û berî her tiştî bê muxaberat.

Di trêna ku ew ji gundekî ji rojhilatê Almanya ber bi Berlîne de dianî, bi xwe dikeniya. Ev cara yekem bû ku weha ji bajarekî, mîna evîndarekî, hez dike û dixwaze kolan bi kolan, cih bi cih, dar bi dar, dever bi dever nas bike, bêriya Berlîne kiribû.

Rojekê be jî, dixwest hewa azadiyê bikişîne û piştê mirin jî bê bila bê, ji ber vê bi kefteleft ji trêne daket û xwe di nav pêlên rêwiyan rakir û berê xwe da deriyê derketinê yê Bahnhof -stasyona navendî- a Zoologisch garten. Li ser dereceyên berî derî sê xortan derî lê girtin, yekî ji wan nasnameya xwe anî ber çavên wî. Ew cara yekem bû ku li vî welatî weha vediciniqî, di cih de têgihîşt ku muxaberat in û nasnameya wî dixwazin. Di wê kêlîkê de ji ber ku bi elmanî têngihîştibû, peyva, Hewîtek, a erebî li ber guhê wî ket. Hinekî cemidî ma, da ku zanibe êdî ne xewn e. Piştê destê xwe avêt bêrika xwe û kaxeta ku ji cihê penaberan anîbû da dest wan. Yekî kaxet da dest yê din, li hev nihêrîn. Yekî ji wan bi destê xwe ew fêm kirin da ku bide dû. Çend deqe neçûn, du polisên cilkesk hatin, yekî ji wan qeyd xiste destê wî û ew derxistin derveyî deriyê mezin. Va ye gihîşt dilketiya xwe, lê destqeydkirî derbasî dilê Berlîne bûbû. Ji ber xwe şerm kir, ne ji ber komên xelkê yên ku qet lê jî nedizivîrîn, lê ji ber ku dihisiya ku evîndara wî ku dixwest xwe serbilind biavêje hembêza wê, va ye wî destbîqeyd, dilşikestî û bi polisên dorpêçkirî dibîne. Li cihê polisên çentê wî vekirin, bêrikên wî tevde vala kirin û ew derbasî odeyeke biçûk kirin. Xortekî nûhatî hat, derî li xwe û wî girt, ji ber ku çend peyvên îngilîzî ji salên xwendina zanîngehê di bala wî de mabûn, jê fêm kir ku dixwaze cilê xwe deyne. Xort lepikên lastîkî xistin destên xwe û (nivîskarê kurd yê bi nav û deng) dest bi xwetazîkirinê kir. Derpî tenê mabû. Xort jî bi bêrik mêrikên wî daketibû. Dema cil hemû kontrol kirin û lê zivirî, tenê derpî lê mabû. Çavên wî û yên

xortê kontrolê ketin hev, weke ku hîn jî ne razî be. Bi kurdî jê re got, va ye ez vê kulê jî di dilê te de nahêlim, ji xwe re têr lê binêre û ji nişka ve derpiyê xwe jê re daxist, hîn xort digot (ok, ok) lê wî guh nedayê, hema derpî jî avêt ser cilên xwe yên din. Pêşiya xwe baş nîşan da û zivirî qûna xwe ya tazî jî pêşê kir. Xort jî hinekî bi vê yekê şaş ma û jê xwest ku cilên xwe li xwe bike. Di çentê wî de tenê kitêbên wî dîtî, jê pirsîn:

- Ev bi çi zimanê ne û li ser çi ne?

Ji wan re got:

- Bi kurdî ne û ez nivîskar im.

Polîsekî jê re got:

- Baş e tu nivîskar î, naxwe tu zanî bixwînî.

- Erê.

Kaxetek bi erebî û elmanî danî ber wî û jê xwest ku bixwîne. Ji wê kaxetê nas kir ku qanûna dewletê bînpê kiriye û zêdeyî sîh kîlometrî dûrî cihê ku divê lê bimîne çûye. Kaxetên wî lê vegerandin û pelekî nû jî ji bo çûna cem polîsên gundê ku lê dimîne dane wî û ew berdan da ku vegere cihê xwe. Riya xwe bi hevalê xwe xist, hevalê wî bi ken lê guhdarî kir û got:

- Erê, her der li te qedexe ye.

- Berlîn jî.

- Erê, Berlîn jî zêdeyî sîh kîlometrî dûrî kampa te ye.

Pê re tiştin mîna qedehên qizêzî di dilê wî de şikestin, bêyî ku pê bihise ku dengê wî zêde bilind e, kir qarewar:

- Qedexe, qedexe, yaho ma dawiya vê qedexekirinê nema tê?

Hevalê wî hinekî li ber dilê wî da ku êdî mesele heta demekê ye û divê sebra wî hebe. Wê rojê, berî ku bi dîtina çavên Berlînê yên spehî şabibe, xemgîniyeke kor sînga wî diguvaşt. Dîwarên xaniyên wê zimanê xwe jê re derdixistin. Kolanên wê ji lingên wî xeyîdîbûn, ezmanê wê eniya xwe lê qermeçandîbû, mîna jineke ku tu heqareteke mezin lê bikî. Berlîn ew ji hembêza xwe avêt ber bi wê oda zelût û ziwa ya wê kampa li derveyî gund. Di navbera kampê û gund de tenê riya otomobîlan hebû, riya meşa mirovan tunebû. Li kampê bi kurdekî başûrî re hatibû bi cih kirin ku qet li wir nedima. Dora wî

hemû efgan, elban, efrîqî, qereçî, ereb, kurd û viêtnamî bûn... Ji sibê heta dawiya şevê jî qerebalix û teqreça zarokan nedihate rawestandin. Wê rojê derî li xwe girt û jiyana wî mîna pêlên deryayeke dîn li bin guhê hevdu diketin. Di navbera gund û bajar û welatan de hiş û hestên wî belawela dibûn, tenê yek pirsê serê wî li hev dizîvirand:

- Li wir qedexekirin, li vir qedexekirin. Li wir muxaberat, li wir muxaberat. Li wir tazîkirin, li vir tazîkirin, xelasî li ku ye?

Bû sibeh telefon ji bavê xwe re vekir û jê re got ku muxaberatan li vir jî ew girtibûn û ew berdan. Bavê wî jê pirsî:

- Lawo qey te li wir çî li ser wan nivîsand heta tu girtin?

- Na yabo na, li vir ji bo nivîsandinê mirov nagrin, ji bo tiştên dîn e.

- Wek çî lawo? Wele min fêm nekir.

- Yabo, tu yê fêm nekî jî, lê hema ku mirov nifirekê li yekî bike, mirov bêje Xwedê te bê welat bihêle.

- Lawo tu li wan welatan dîn nebî, ji bo Xwedê, tu dîsa neçe nav tîrb mirban ha, tu nebî hevalê miriyan dîsa.

- Yabo ku rûmeta mirov li cihê wî tunebe, bi Xwedê wê tim û tim bê rûmet be.

- Ê, ne sed carî min ji te re got lawo, dev ji van çîrok mîrokan û siyasetê berde, ez ê jinekê ji te re bînim û... tu li ser serê xwe siwar hatî, ha.

Bi mehan, bi tenê, li kampê, di odê de, di nav qerebalixa zarokên ku bi zimanên cuda dipeyivîn de mabû. Tenê telefon bûbû tayê ku ew bi dunya derve ve girêdida. Her serê mehê, pereyên ku weke alîkariyê didan têra xwarin û lixwekirina wî dikir an nedikir. Destê xwe digirt da ku hesabê çûna xwe ya Berlînê bike. Ji bo bidestxistina îcazê çû cem berpîrsiyarê kampê, zêdeyî du roj îcaze nedanê, tev wilo jî dihat ku bifire gava berê xwe dabû Berlînê. Roja sêyem biryar da ku êdî tenê di nav xeml û xêza yara xwe, Berlîna xwe de bigere. Piştî bajar careke dîn, bi gerê lihevexist, li vejerê, li Ubahn (rawestgeha Metro) ya Hermanplatz du kesan ew sekinandin, yek ji wan bi cilê polîs bû. Dîsa ew birin cem xwe û kaxeteke din danê, dihat ku ji qehran biteqe. Vegeriya, ji xwe re bi şev û roj di rewşa xwe û ya kûçikan de

diramiya. Li welêt carekê di gotarekê de xwendibû, digot: “Li Ewropayê tenê kûçik û nivîskar di rewşeke xweş de dijîn.”

A niha li Ewropayê nas kir ku êdî nivê vê hevokê rast e. Kûçik jî bi kaxet û nasname û maf in, lê ew him li welatê wî weke biyaniyekî ku herdem heps li benda wî bû ew nas dikirin û him jî li vir ku weke biyaniyekî di hepseke vekirî de dijî. Di rewşa kûçikên welatê xwe de diramiya, di wê dijminayiya bê sînor, di nav wan û mirovan de û bêzarî û zora ku di bin de dimînin. Hewce ye kûçikên welatê pê bihisîne bê çiqasî kûçik li vir bi dostanî bi mirovan re dijîn, weha jî xwediyên maf û nasnameyê ne û di bin parastinê de ne. Wê bi hezaran kûçikan xwe li sînoran xistibana, xwe biavêtana gemiyan û berê xwe bidana peravên deryayên Ewropayê. Gava ku hat ber çavên wî ku kûçik bi qaçaqxuyan re bazarê dikin û bi hezaran berê xwe didin Ewropayê û li ber deriyên penaberiyê dikin ewte ewt, keniya hetanî ku kelogirî bû. Ji wê rojê de kê telefonî wî dikir ji bo hatinê, ji wan re digot:

- Baştir e kûçikên wê derê bên vir, ne mirov.

Di kampa wî de, bi dehan kes hebûn, zêdeyî çar û pênc salên hinekan qediya bûn ku ne fêrî zimên bûbûn ne jî kar dikirin. Telefonî welêt dikirin û digotin, (meaşê) me yê mehê ewqas e. Her Euroyek bi pêncî yan zêdetir ji pereyên welêt bû. Bi peyva meaş ji xwe re dike-niya û berê xwe da cihê îcazetgirtinê, yê karmend jê pirsî:

- Qey tu karê reş li Berlînê dikî?

- Na.

- Naxwe, çima va ye tu du caran li wir hatî girtin û dîsa dixwazî biçî?

- Ez ji Berlînê hez dikim.

Karmend keniya û bi îngilîziyeke şikestî berdewam kir:

- Îcaze nîne, bila Berlîn bê cem te eger tu jê hez dikî.

Ji ber ku Berlîn nehate cem, ew çû û ji xwe re digot, ne mimkun e careke din sudfe xiyaneî bi min re bike û min bide girtin, hîn ev raman di serî de nivco bû û berî bizîvire mala hevalê xwe sê kesan silav lêkirin û yekî ji wan nasnameya xwe da ber çavê wî, paseporta wî jê xwest, kaxeta xwe da dest û da pey wan, ber bi erebeya polisî ya li benda wî rawestiyabû de çûn. Bi hêrs li Berlînê dinêrî, her mê-

rek, her jinek li kolanê qirakek li ser serê wî danîbû. Haya tu kesî jê tunebû, pê dihisiya ku Berlîn kor e û wî nabîne. Ji lew re ne erda wê qeliştî, ne jî ezmanê wê li van polîsên ku girr jê girtine dihate hev û ew ji nav destên wan derdixist. Ji xwe re digot, tu dibê qey polîsên elman hemûyan dev ji kar û barê xwe berdane û dane pey min. Eger ne Berlîna xayîn îxbariya wî dike, ev kî van mirovên rûsar û ecêb dişîne pey wî, evên ku qet ji mirovan fêm nakin, tenê ji kaxetan û hibrê fêm dikin. Li vegera gund, berî têkeve trêne, bi du çavên şikestî li kolanên Berlînê dinêrî û ji xwe re digot:

- Ez careke din ketime hezkirineke yekalî.

Hezkirina yekalî mêrkuj e û bêbext e, ji ber vê bê paseport nema vegeriya Berlînê. Îca, piştî kedeke mezin bi awayekî fermî li Berlînê bi cih bû. Ji wê rojê de heta roja îro kesekî rê lê negirt û daxwaza dîtina paseportê lê nekir. Ew neşandin kursên zimên, lê tev wilo jî xwe hinekî fêrî elmanî kiribû. Cara yekem sosyalê (cihê alîkariyê) ji bo kar şandin pey, kaxetek dane dest ku mecbûr e mehê li bîst cihî li kar bigere, eger peyde nebe divê îmze û mohra xwediyê kar bi xwe re bîne. Meha yekem ewqas derdor li hev xistin û hinek jî ji ber xwe ve danîn, ya duyem jî wilo, di ya sêyem de biryar da ku biçê karê ku ew bidinê. Ji xwe piştrast bû ji ber ku berê ji karmenda sosyalê re gotibû ku karê wî nivîskarî ye. Careke din dilê bavê xwe yê kal ê li ber mirinê kire cih û jê re rewşa xwe baş nîşan da ku wî zêdetir aciz neke. Dengê bavê kal ê lerizî ji dûr dihat:

- Lawo Xwedê te ji girtinê û ji hewesa bi gora miriyan dûr bihêle.

Nameya sosyalê kete destê min, pere qut kiribûn, kêfa min hat ku kar ji min re dîtine, her weha navnîşan jî diyar e. Serê sibehê ez li cihê destnîşankirî bûm. Çend xaniyên biçûçik bûn û hawîrdor gor bûn. Li wir, ez pêrgî yekî Nîcîrî bûm, ber bi min ve hat:

- Hallo kollega (merheba hevalo).. Wo ist Herr Girs? Kanî birêz Gers?

Em ketin hundir, yekî got, ez im. Deh karkerên din bi cilên xwe yên kesk ên gemarî li wir bûn. Min piştî nas kir ku Herr Girsê kal ê ku guhar di guhê wî yê çepê de bû, ev zêdeyî sîh salî ye ku vî karî dike. Ciwamêr cilên min yên paqij neecibandin.



- Divê tu cilên kar ji xwe re bînî.

Min fêm kir ku divê ez kaxetekê (Bescheinigung) ji cem sosyalê bînîm ji bo cilên kar bidin min. Jixwe sosyalê jî neda min. Bû sibe, ez dîsa çûm, heman pîrs Herr Gers ji min kirin:

- Tu kî yî, divê tu cilên kar ji xwe re bînî.

Dîsa ji min xwest ez herim cem sosyalê ji bo cilên kar, bû sibe ez dîsa hatim, dîsa herr Gers li ber min sekinî û got:

- Tu kî yî, divê tu cilên kar ji xwe re bînî.

Wêha çar çaran Herr Gers ez ji bîr dikirim, te yê bigota qey ez miri-  
yeg im û nû ji nav miriyan rabûme, ji lew re heman pîrs bûn û heman  
film dubare dibû, cara pêncan bang yekî kir û jê xwest ku min bibe  
kîlerê. Piştî du saetan bû dema bêhnvedanê, Herr Gers ji min re got:

- Îca tu dikarî 15 deqeyan cixarê vexwî.

Wê rojê ez ji hawhaw ketim, çûm ser dixtor, du roj dane min û  
piştê heft, lê bi çûna ser dixtor re pere qutkirin. Sosyalê (kaxeta  
nexweşiyê) xwest da ku perê min li min vegezin. Ji bilî vegeza kar tu  
riyên din tunebûn, ez vegeziyam. Hewesa min a bi goran, bi awayekî  
seyr li min vegeziya. Min nivîsên li ser kêlan yeko yeko dixwendin.  
Her carê ez di jiyana yekî(ê) ji wan de diramiyam, di xewn û hêviyên  
wan yên nîvcomayî de. Wê rojê ez li ber kêla gora zarokekî ku roja  
ji dayikbûna xwe miribû, rûniştim û giriyam. Min xwe di vî zarokî  
de didît, vî zarokî ne rojekê kesekî xwe dît, ne jî ket nav kesê xwe.  
Xwediyê kêlê, eger temenekî dirêj kiriba ez li ber nediketim, lê di nav  
gorên qurbanên şerên cîhanê yên yekemîn û duyemîn de, bi dehan  
yên temenkin û xort hebûn. Gorên wan tenê bêgul, bêdeng û xwedî  
nivîsîn kermizî bûn. Li ser yên din, yan dil, yan pirtûkeke vekirî yan  
jî wêneyên pêxember Îsa û Meryem hebûn. Yan jî nivîsên ji Incîlê. Di  
nav miriyan de profesor, serleşker û giregir jî hebûn. Bi giştî di ser  
heştêyî re bûn. Ez di mirina xwe de diramiyam. Gelo ez bimirim wê  
kî bê ser gora min? Min nû fêm kir bê mirov çima dixwaze gora wî  
li welatê wî be. Sebra miriyan jî bi hev tê. Carekê min dît bi xwe re  
dipeyivim. Ez carê li dora xwe dizivîrîm da ku kes min di vî halî de  
nebîne. Karê min bûbû jêkirina terhişkên zêde yên daran. Destpêkê  
meqes tenê bû, vê dawiyê cotek lepik dan min ji bo jêkirina giyayê

li ber daran. Ez li wan lepikan ecêbmayî mabûm, bi zanebûn çêkiribûn; ji hundir de paçik, ji der ve de çermê hişk. Eger mirov bi wan kar bike tilî bi rehetî tevdigerin, eger mirov bêkar bisekine, tiliyên mirov dûrî hev disekinîn û hişk dibin, ji lew re yan divê mirov kar bike yan jî lekîpan ji destê xwe bike. Ez li wê derê bi tenê mabûm. Piştî çend rojan yê nîcîrî avêtin nexweşxanê. Ore ora makîna gasê nema ji serê wî derdiket, li malê jî gummînî di guhên wî de bilind dibû. Ji wê rojê de nema çavên min lêketin, ji acizî min berê xwe dida avdestxaneyê û min ji qazîvkare li wir dirêj dikir. Min ser çavên xwe dişuşt, min cixara xwe dikişand û derdiketim. Bêhemdî xwe min tim li saetê dinêrî. Telefona min mîna miriyekî di bêrika min de bêteng mabû. Demeke dirêj bû min dengê bavê xwe nebihîstibû. Mirina diya min ya ku bû sedema terka xwendinê hate bîra min. Roja diya min mir, ez çûm zanîngehê ji bo destûrxwestina nehatina çend rojan, gava yê berpirsiyar got ku çênabe, ez şaş û mat mam. Ev çawa diya min miriyê û ne xema kesî ye, ev çawa dunya weha weke xwe maye. Min pelên di destê xwe de perçe werçe kirin û min avêtin nav çavê berpirsiyarê zanîngehê û ez nema careke din vegehiyam wir, min bi temamî dev ji xwendinê berda. Baranê benê bîranînên min qetand. Min xwe avêt bin darekê, nebû. Min xwe avêt ber kêlên goran, nebû. Min berê xwe da cihêkî telefonê û min gazî bavê xwe kir:

- Yabo, ez ji nêzîkî goristanekê telefon dikim.

Dengê bavê min lawaz û qels dihat:

- Qey tu dîsa vegehiyayî nav goran lawo?

- Na yabo, ez li vir kar dikim.

- Lawo ma karê te di nav goran de çi ye ji bo Xwedê?

- Kar e yabo kar.

Bavê min bêhêvî digot:

- Lawo, cara din te got muxaberat û vê carê tu dibêjî goristan, eger tu li wir jî weke vir, di nav muxaberat û goran de biçî û bê, naxwe tu çûyî wan deran çî lawo?

Ev cara dawî bû ku dengê bavê min tê guhê min, kesî min li çar aliyên cîhanê nema. Min dest ji kar berda:

- Di ku derê re zirav bû, bila di wir de biqete. Karê min mabû

serdana goran. Tenê mirin mabû li pêşiya min, ji ber vê, divabû min haziriyên xwe kiribana. Di orta mezelan de min gorek ji xwe re çêkir, her roj ez dihatim serdana wê. Carna min serê xwe datanî ser kêla gora xwe û digiriyam.

Tiştê ku bala wî kişandibû ew jina pîr bû ya ku roj bi roj dihat serdana gora mêrê xwe ya li hember gora wî. Piştî hevaskirinê pîrê carê du gul bi xwe re dianîn, her yek ji bo gorekê, pîrê bi rojan li ser xwe û mêrê xwe axivî, jê pirsî:

- Te ji min re negot, ev gora çiyê te ye?

- Gora dilê min e.

Pîrê têngihîşt, dîsa pirsî:

- Yanî ya yara te ye.

- Na, ya kesekî pir nêzîkî min e.

Roja din pîrê dîsa herdu gulên xwe danîn ser herdu goran, lê pêjna mêvanê rojane yê gora li hember gora mêrê wê nema li wan deran hat.



## SEGBAV

### Şeveke dirêj ji temenekî kin

Ev çend roj bûn, meh bûn, sal bûn, Dildar jî nema baş dizanî çiqas çêbûbû ku di vî halî de ye. Bêhna wî diçikiya, dihat ku bifetise. Geh nema didît, xumam diket ser çavên wî, di nav rûyên hevalên xwe de şaş dibû. Nema dikaribû bikene. Li kê guhdarî dikir, hişê wî diçû devereke din. Carna dengê jineke çavkesk dihatê, dizîvirî, kes nedidît. Bêhna wê jinê dikir, dida pey bêhna wê, li mêrekî simbêlqît rast dihat. Şevên wî bûbûn xewnerojk, rojên wî bûbûn salên ji bendeman û xewnên bi kabûs. Jiyana wî ji binî de xera bûbû, lê nikaribû navek jî lê bikira. Îca mîna her birîndarê ku guleyek ji pişt de lê ketibe li xwediyê tivingê digeriya. Dixwest bizane bê kê ew gihandiye vê rewşê. Her çendî sedem û kes pir bin jî, lê dîsa jî dixwest kesê sereke yê ku bûye sedema ketina wî ya nav devê kelbetan de bigire û heyfê jê hilîne. Tu dever neman ku lê negeriya, lê mîna her kesê xwedî vîn ew jî gihîşt armanca xwe wê şevê. Di kolanê re dimeşiya gava teprepa lingên lezok hate guhên wî. Di wê kêlikê de kesê ku lê digeriya nas kir. Gav bi gav, kolan bi kolan, da pey wî, kolan li xwe zivirand da ku ew û ew kesê ku lê digere li hev rast bîn. Herdu hatin hember hev, bi hemû hêza xwe Dildar bi qepera wî girt û ew ajot ber bi odeya xwe ya biçûk. Destê wî, bi hişkayî bada û ew ji pişt ve, heta jê hat, dehfang hundirê odê. Derî li xwe û wî girt. Du text û maseyeke vala

di odê de bûn. Dildar li aliyekî rûnişt û yê pê re li hember wî, li ser textê din bû. Rûyê yê pê re zer bûbû, behetî mabû, bi du çavên mîna du qedehên vala li Dildarê hêrsbûyî dinihêrî. Ji xezeb û qarewara ku wê kêlîkê bi Dildar ketibû şaş mabû. Ode vala û kerr, dunya lal, erd û ezman kor bûbûn. Ji bilî dengê hêrsa Dildarê ku xwe winda kiribû, dengê tişteki din li wê derdorê nedihat.

Tu hevalekî xayîn î, tu xayîn î kuro, dengê min tê te, hê?

Bi sedan kesan ji min dixwestin ku haya min ji te hebe, min guh li tu kesî nekir û min da dû te, tenê ez dixwazim bersiva vê pirsê sêwî nas bikim, te çima weha li min kir?

Hê, bêje, devê xwe veke, tişteki bêje eger tu karibî.

Îşev ez ê piştê te bişikînim, te li hev bitewînim, hestiyên te di çermê te de hûrhûrî bikim û weha te bavêjim nav zeyta ku bi agirê xiyaneî qelandî ye. Bila tu bişewitî, bibî komir, dîsa ez ê te hûr bikim û biavêjim ber lingên xelkê, ev xelkên ku li vê derdorê devjihev dimeşin bêyî ku hayê wan ji bayê felekê hebe. Ez ê îşev van herdu guhên te bikişînim û bikişînim, eger jêbûn, ez ê wan li ber serê xwe mîna ala welatekî dagîrker daleqînim da ku ev nefret û hêrsa nava min diji te kêmbûn. Eger dirêj bûn ez ê wan mîna lastîkekê vezilînim û ji qehpikekê re bikim sol. Ez ê wan bi du mîxên qalind bi dîwarê oda xwe ve bikutim û tu jî weha heta ez sax bim li hewa daleqandî bimînin ku her sibe li ser nalîna te ji xew rabim û her êvar di ber axîna êşa te re ez di xew re herim. Ez ê a niha bi guhê te bigirim û serê te li tehta sozxiyariya te xînim, heta çermê serê te bi tehtê ve bimîne. Ez ê gurekî birçî bînim vê odê, te tazî bikim û binêrim bê wê çî bibe. Çawa ku tu bi vê êşa min a bê derman kêfxweş dibûyî, weha ez ê jî li goşt û hestî û xwîna canê te binêrim bê çawa wê ji hev bela wela bibin. Ez ê pêş te kim bê kêfxweşiya min çawa ye gava ku tu bêyî perçekirin, bê ku hayê kesî di vê oda biçûk û girtî de ji te hebe.

Tu ji min re başbûyî berê, min ev hêvî qet ji te nedikir ku tu van belayên mezin bi serê min de bînin, ez feqîrê Xwedê, li vê xerîbiya kor, bê dîn û îman, bê bav û dê, bê pişt. Ev çî kêrên hesinsar in ku te berê min daye wan? Vî serê xwe yê bênamûs ji ber xwe derîne kuro. Bersiva min bide, bêje, ez teqiyam, biaxive. Ew zimanê te yê dirêj bi ku de çû, ew hiş, ew nan û xwê, ew şîret û hevaltîya kevn? Erê kuro,

kesî min ji pêvî te tunebû li vê dunyaya qehp. Tu tenê bûyî û min xwe dispart wan destên te yên dilsoz. Ez ne nankor im hevalo. Baş tê bîra min, wê rojê gava min xwe avêt bextê te, tu bi kêrî min hatî û em bûn destbirak. Zivistan bû, sermayê ez dixwarim gava ez pêrgî wê jina çavreş û spehî bûm.

Hemêzeke germ li ber min vekir, bêyî ku ez guh bidim tu kesî min berê xwe dabûyê, lê tu bûyî, erê tu bûyî, te ez şiyar kirim û te got, ev jin ji te hez nake, ez baş wê nas dikim, haya te ji te hebe, eger tu bi ya min bikî guh nede wê. Piştî demeke kin ku min bi ya te kir, ez li xwe zivîrîm ku wa ye ew jina çavreş û xweşik bi herdu destan mêrekî din hemêz kiriye û hêdî hêdî wî dixwe. Erê, ew dixwar, ne xewn bû, weha çawa kûçikekî har berateyên xwe bi rehetî bixwe, weha wê jî mêr dixwarin. Ez jibîr nakim wê roja ku ez xemgîn beziyam ber deriyê te, te dest ji hemû kar û barên xwe berda û mîna zarokekî henûn tu hatî bi min ve. Min serê xwe datanî ser çoka te û ez digiriyam. Tu xwedî û dostê min bûyî, lê ev çi qewimî ku tu weha mîna dijminekî li min qulipî û te ez bi vê nexweşiya bêderman xistim.

Kuro, min ji xwe re digot, eger rojekê ez nexweş ketim wê dermanê min li ba te be ey kafirbav. Va ye te ez îro mîna hestiyê ji ber diranê kûçikekî birçîmayî, weha birîndar û şikestî, ez avêtime ber deriyê girtî yê vê jina xerîb. Jineke ku ne çavên dilên wê hene ku birînên di eniya min de bibîne, ne jî agir rojekê avêtiye tiliyên wê da ku min ji rengê şewata tiliyên min nas bike û zanibe şewata tiliyan tê çi wateyê. Ne jî min dibîne gava ku bi lez di ber termê min, kuştiyê xwe re, derbas dibe. Ez dimirim kuro û tu xwe dikî ku tu bêşûc î. Ji te we ye ku ev plan ji te re here serî ku ez hêdî hêdî bi vê nexweşiyê, di nav ewqas birînan de bimirim û tu jî bêxem razê, weke ku ne tu mal xerabûne, ne jî tu niqut xwîn li devê birînên ji hev vebûyî hişk bûne. Tu nexweşî weke vê nexweşiya min nêzîkî penceşêr an kevjal nîne. Nexweşiyeke bêêş e destpêkê, piştî ku xwe berdide kûrahiya laş ku êdî mirin tenê dikare yê nexweş xelas ke, wê gavê mirov pê dihise. Dibe ku penceşêr çêtir be, ji ber ku nexweşê penceşêrê divê yan bi emeliyatê cihê nexweşiyê jêke, an jî bimire. Di vî halê ku ez tê de, ne ez dikarim cihê vê êşa kujer jêkim ji ber ku di her damar û deverê de belav bûyîye, ne jî ez dimirim û ji vê rewşê derdikevim.

Berî demekê ez çûm serdana hevalekî ku bi penceşêrê ketibû, bi emeliyatê çar perçe ji hinavên wî jêkiribûn, digot, eger careke din venegere, ez ji cihê ku nexweşî lê belavbûye heta hetayê xelas bûm. Ji hêlekê de min hêviya derbaskirina vê tengayîyê jê re dixwest, ji hêla din de min dilê xwe bi halê wî xweş dikir.

Min dilê xwe bi zikê wî yê ji navikê heta qirikê dirûtî xweş dikir, çavên min jî li ser kîsê xwîna wî bû, ya ku piştî emeliyatê ji birînê diherikî û bi xwe ve daleqandibû. Bijîşkan jê re cihê nexweşiya pîs jêkirin û avêtin, lê gelo wê kî cihê vê nexweşiya pîs a ku di damarên min de belav bûye de jêke. Jina wî dihat, diket bin çengê wî û ew dibir û dianî, lawê wî li ber destê wî diçû û dihat, yê min kîjan dest wê xwe bide ber min gelo? Kîjan jin wê xwe têxîne bin baskê min yên şikestî de, ez teyrê ku di hêlîneke xerîb de ji dayik bûye û li erdeke xerîb mezin bûye û a niha li welatekî xerîb bûye dilê vê nexweşiya giran a bê wîjdan ku te bi ser min de anî kuro. Xweska min zanîbûya bê ez çi bikim ji serê te ku ez rehet bibim.

Kuştina te rehet e lê bi xêr û xweşî ez vê daxwazê ji te re pêk naynim. Ez ê bi kêrekê ku laşê te qulqulkî bikim, birînên te tijî xwê bikim û weha te deynim ser berfeke li ser çiyayekî dûr ku gur nikarin lê bijîn. Va ye tu bi çav î hevalo, serê xwe rake lawê qantiran û binihêre. Te çawa ez kor kirim û ez ajotim nav kerş û gemar û mirinê, ez ê jî îşev herdu çavên te bi van tiliyên xwe yên şewitî derxînim. Wan têxînim du kevçiyên, deynim ser riyêke dirêj û tozgirtî, da ku toz wan kor bike berî ku kes bi hawara wan ve bê. Çawa ez li benda wê jina ku te ez xistime bela wê de, bi rojan dimînim bêyî ku bê, weha jî ez ê te li benda du nênûkên dirêj bihêlim da ku bên te bavêjin ber nikilên çûkan, piştî wê ji pişt de, bêyî ku haya te ji te hebe, weke ku tu ji pişt de hatibû min û bêyî ku hayê min ji te hebe, wê ew nênûk te birijînin ser erdeke hişk ku qet bi êşa te hest nabe. Tenê evîndar ji çîrokên evînê fêhm dikin, dikarin bi stranê evînê re binalin û wateya hêsiran zanibin. Tenê evîndar dikarin zanibin rengê ariya evînê çawa çavan kor dike, ji ber vê divê ez her evîndarî şîret bikim ku çîroka xwe ji tu kesê ku evîn nedîtibe re nebêje, da ku qemûşkên ser birînan bi têngihiştina xwe ranekin, da ku kuştinê ducar nekin. Tu ji ku van çîrokên fêhm dikî kuro, ku te lingên rihê min kirine vê sola teng û tijî



strî. Ez dimirim kuro, tu sebab î. Ne dibêjin dunya bi dorê ye. Te ez xistim û va ye îşev dora te ye. Tu ketiyî nav destê min. Ev çend meh in dixwazim te zeft bikim, te xwe dida vî alî wî alî, lê va ye a niha ez û tu tenê ne di vê oda piçûçik de ku bûye cihê mehkemekirina te. Ez ê îşev dozger bim û cezayekî layiqî vê gunehkariya te bidim te. Ez ê te ji lingan ve li hewa daleqînîm, qûna te tazî bikim û bidim ber derbên qamçiyekî zivir, hetanî ku niqutên xwîna qûna te ya tazî bibin cihok û biherikin bin vî textê ku bûye şahidê herikandina xwîna min a sar û bêdeng.

Kuro dilê min heye îşev ez te weke porteqaleke xweş bi destê xwe biqêşêrim û telaş bi telaş te bixum. Ez ê felaketan bi serê te de bînim ku bibin ibreta hemû kesên ku heta hezar salên din piştî te bîn jî nefikirin careke din tişteki weha bi serê mirovan de bînin. Tişteki nedîtî ez ê bînim serê te ku bi serê tu merivî de ji du hezar salan vir de nehatiye. Ez ê devê te bi terîşekê girêdim û çewaleki bînim, devê wî li te bigirim û xencereke bê îman di orta dilê te de biçînim û weha hêdî hêdî li benda mirina te bim da ku tu halê min ê niha ez tê de fêm bikî. Ez gelek xenceran di laşê te de lînaxim û te bi mirineke weha rehet kêfxweş nakim. Çawa ne dengê nalîna min te dibihîst, ne jî rengê xwîna min te didît, weha jî ez naxwazim ne bibihîsim ne jî bibînim, tenê dixwazim cixareyeke kêfê di ber mirina te ya bi êş re bikişînim. Ez ê te mîna paçikeki kevnîk deynim erdê û bi soleke gemarî pê li te kim û erda vê odeka xwe ya biçûk bi te paqij bikim. Ez ê te biavêjim devê şêrekî birîndar ku berî tu can bidî, tu ji benîşteki bêtir bê cûtin. Tu nikarî xwe bêsûc bikî, va ye kê ez gihandim vê derê û ez kirim parsekê dilovaniya vê jina ku mîna leşkereke hêrsbûyî ye, ez çima bêbextiyê li leşkeran dikim? Leşker jî ne weha ye ku tu jê hez bikî, ew te (dijmin) bi nav nake. Ew mîna dijminan dinêre û hîn jî ez mîna koleyê ku bi zencîrên qalind ve bi erebeya koledareki ve girêdayî be didim pey.

Kuro ji koletiyê bi wir de çî heye xwelîser. Te tişteki kiriye ji serê min weha ye ku ez xwe bi vê koletiyê kêfxweş û serbilind bibînim. Erê, tu dikarî a niha têr ji xwe re bi min bikene. Heqê te li ser min heye ku ez berî îşkence û kuştinê hineki kêfa te bînim. Wê rojê, wê jinê, bêhemdî xwe got, merheba, eger ne gelekî nêzîkbûya minê bi-

gota ji hinekên din re gotiye, ji ber ku ez nemame hevalo. Te ez tune kirime, tu zanî, ez li sifrê sekinîme. Ez dinêrim dunya çawa bêyî min digere û her tişt weke xwe, wek dema ez hebûm, dimeşe. Tenê ez heliyame, dawerivîme, nemame. Çi êşeke mezin e gava ku tu dibînî hebûn û tunebûna te ne tişteki kêm dike ne jî zêde dike. Min digot qey tu hevalê min î tu yê bibêjî, çi bi te hat û di wê kêlîkê de ez ê xwe bibînim, lê berevajî wê, piçik û pariyên min ê ku mane jî dane êgir. Erê, destê xwe dirêj kir. Bi girtina destê min re ez dirêjtir bûm. Ez behetîm, min got qey ez veziliyam, lê piştî çûna wê min dît ku herdu lingên min bilind bûne.

Ji wê rojê de ez dikim nakim nema herdu lingên min erdê digirin, ez nema zanim bimeşim. Rihê min ji lingên min diçin, ji ber ku her ez dimeşim min diajon pey dengê lingên wê. Rihê min ji tiliyên destê min yên rastê diçe, ji ber ku nema dikarin tîna tiliyên wê jibîr bikin. Di çavên wê de, du darên kesk bişkivîn û bûn hedefên êrişên refên çivîkên hêrsbûyî yên çavên min. Ji wê rojê de ez dixwazim herdu çavên xwe birijînim da ku nedim pey pêjna çûn û hatina wê. Rihê min ji lêvên min diçe, ji ber ku bêriya lêvên wê dikin. Dema tê deverekê, ez dixwazim berî wê li wir bim, piştî ku diçe, bi hestin seyr ez li pey wê dinêrim. Bi saetan ez li şûna kursiyê wê yê vala dinêrim, dixwazim gulekê deynim ser kursî û bimeşim, bêyî ku zanibe ez xwediyê gulê me. Rojekê, çardê sibatê, mîna her evîndarî li her deverên dunyayê min rahişt guleke sor û ez çûm cem. Dema destê min dirêjî wê bû û gula min di destê min de ma, min nas kir ku êdî her tişt xeyal e û ez tune me, jixwe mêrekî ku nema be wê çawa gulê bide jinê? Min berê xwe da kursiyê wê yê vala, min guleke sor bi lez avêt ser kursî. Berî ez vegerim, ez zivirîm, min dît ku min destê xwe bi gulê re avêtiye ser kursî. Ji wê rojê de ez bi destekî me. Him gul û him dest veşartin bêyî ku kes pê zanibe, ez jî feqîrê Xwedê destek ma li cem û destê din li benda destê wê tilîxav maye. Ez ê jî îşev bi vî destê bi tenê laşê te mîna pîvazekê biqêşêrim û qaşil bi qaşil deynim ber xwe û ji her qaşilekî bi kêreke ku sê hezar qaşilî jêkim.

Ez ê îşev dilê xwe li te hênik bikim kuro. Mehkûmê îdamê xwesteka dawî didinê, ez wê xwestekê jî ji te re pêk nayînim, ez ê weha bê mirad û tevî hemû hesret û kul û derdên te, te bikujim îro. Berî

mirinê, ez dixwazim vê êşa tu didî min ez jî bidim te. Ez ê îşev te hişk girêdim û dilê xwe têxim cih bê ka dilê te heye yan na. Ez ê sînga te biqelêşim û binêrim. Kuro ev êş ne min dikuje, ne jî dihêle ku kari-bim bijîm. Min nankor dîtî, lê weke te na. Min bêbext û qehpebav dîtî, lê weke te na. Min dijmin dîtî, lê weke te xedar û bênsaf na. Ez ê dilê te biqelêşim û xwîna te di eniya jiyana xwe bidim. Ma qey te jîbîr kir kuro, ez çiqasî ji te re baş bûm. Tu nexweş diketî, ez bi şevan, mîna diyekê, li ber serê te dimam. Te ser xwe bi şev vedida, min tu bilez dinixumand da ku serma bitirse û ji te dûr bikeve. Tu birçî dibûyî, min xwarin ji te re dianî, tu tî dibûyî, berî tu bibêjî, min av dida dest te. Te ta digirt, min xwêdana eniya te paqij dikir. Di kêfê de bi te re şa dibûm, weha jî di xemgîniyê de min li ber dilê te dida. Tu diketî, min destên xwe didan ber te, ji bo te pişt bûm.

Îca çima te ez kirim qirşikekî şikestî û avêtim nav van pêlên dîn ku min ji hêlekê davêjin hêlekê bêyî ku kes bi hawara min ve bê. Li medbexê xewa min tê, li ser textê razanê birçî dibim, razayî dime-şim, şiyar xewnan dibînim, bi mirinê re dikenim, ji ken xeyidîme, bi lingê xwe difikirim, bi serê xwe keviran ji ser riya xwe didim alî, bi guhê xwe dibînim, bi çavê xwe teyr û tilûran ji ser laşê xwe yê jîbîrbûyî difirînim. Di hemêza xwe de termên çivîkên evîne yên kuştî belawela dikim, zimanê min di nav ariya şewata bêdengiyê de asê dimîne. Te ez xistime rewşeke weha ku kes nikaribe bi hawara min de jî bê. Dawiya vê hevaltîya demdirêj ev bû dosto? Xem nake, êdî va ye tu îşev di nav destê min de yî û ez ji te re zanim. Ez nizanîm te çima weha dereng ev bela anî serê min. Berî niha bûya, dibû ku min karîbûya hilgirta û derbas bikira, lê a niha min dereng nas kir ku ez hatime xapandin. Jixwe tiştê jê zehmetir nîne ku mirov dereng, piştî derbasbûna demê, têbigihîje êdî wê çaxê têgihîştin jî fêde nake. Gerek ez ji wê dema dûr têgihîştibama, wê dema ku te ling da ber min û ez ketim, wê çaxê min ji wê likumandîna ji nişka ve fêm nekir, çimkî ez zû rabûm ser xwe. A niha xuya ye ku rabûn jî zehmet e. Bi derbasbûna demê re derbên ji pişt ve û ji nişka ve kûr diçin, fireh diçin û bi zerar in. Ketina mezinan ne wek ya biçûkan e, girantir e, kambaxtir e, her weha xweştir e jî. Ev êşa şemitandinê ye, jixwe lingê şemitî jî kesî wî nîne hevalo. Nizanîm hewce dike ez qala hezkirinê

ji te re bikim, hezkirin ew mirov e ku qedeha xwîna te di destê wî de ye, vedixwe û tu jî ne dixwazî ji wî dûr bikevî, ne jî bêyî wî dikarî bijî.

Hezkirin ew hest e dihêle tu bibî kole an jî qatil.

Ez Memekî bê Zîn im hevalo, Memekî weha xemgîn mîna çiyayekî bê dar, bê giha û di bin berfê de û bi tenê mîna qatilekî.

Dildarê dudilî wê şevê him kêfxweş bû ku dijminê xwe yê xedar zeft kiriye û him jî xemgîniyê bêhna wî çikandiyê, ku wê dawiya vê êşa xweş, vê evîna bêçare, hezkirina jinekê ku dema wê ji bilî evînê ji her tiştî re heye. Ji hêrsan du hêsrên matmayî **rûzên** xwe yên şermok di çavên wî re derxistibûn, pirsên wî yên bê bersiv dorpêç dikirin. Çawa dibim Mem bêyî ku Zîn hebe? Çawa hezkirin dikare weha devê mirov li ber sola herkesî veke? Çawa weha mirov têk diçe û pişt lê dişke? Çawa, çawa û çawa?

Dildarê şikestî careke din bi ser dilê xwe de rabû:

- Kuro, tu çima weha li min dikî segbav?

Dîsa bi qepera wî girt, ew ji ser text rakir. Mîna sêveke sor ew danî ser masê, demança ku ev çend roj in, meh in, sal in, ew jî nizane, amade kiribû, ji bin balîfê derxist û ew sêva li ser masê ji xwe re kiribû nîşan. Bi teqîna gulê re her perçeyekî sêvê belav bû derekê. Oda piçûçik ya bi du textên vala û maseyeke tevlihev di nav xwîn û evînê de bédeng mabû.

## SOL Û SERÎ

### Çîrok di kirasê şanogeriye de

Li vî bajarokê biçûk, mîna bi hezaran jin û mêrên ku ji mecbûrî bi hev re diman, dê û bavê Camo û Xamo jî heta dawiya temenê xwe bi hev re bûn, tenê, ji ber ku berdan ji mayîne xerabtir bû wan jî hevdu bernedidan. Herdu li dijî hev bûn. Her tiştê ku dê jê hez dikir xwendin, bêdengî, nermayî di têkiliyan de, bav jê nefret dikir û bêtir ji pere, bazirganî, qerebalix û bêciriye hez dikir. Weha jî Camo berevajî Xamo bû. Camo bejin kin, qut û gilover û ser mezin bû. Xamo jî dirêj û ziravik û serbiçûk û bi berçavk bû. Mîna ku qedera wan bi hev re girêdayî be, ev cara dehan bû ku biryar didan ji hev dûr bikevin û nema bêne cem hev ji ber ku rojê zêdeyî carekê li hev rast dihatin, lê herduyan jî nikarîbûn. Niha dîsa mîna du dijminên ku bê hev nikaribin bijîn li sûkê herdu bira dîsa hatin hember hev. Camo solfiroş e û Xamo pirtûkfiroş e, Xelefo jî her dem û her gav li wan deveran diçe û tê, lê ev Xelefo kî ye gelo?

#### Xelefo,

bi kurtayî, dîne sûkê ye, weha jê re dibêjin.

Mirovekî jar û serzelût bû. Riha wî her dem nekurkirî bû. Çakête wî dirêj û bişkoka jêr di qulpika jor re derbas dikir. Sola wî jî her dem

şimikî di lingên wî de bû, xişxişa wî bû di kolanan re dimeşiya. Her ku digiha rastî kesekî bêyî ku tişteki li ser bibêje derbas nedibû. Her tişt karê wî bû, diçû cem her kesî. Bê zîrar bû û bi her tiştî dizanîbû ji ber ku ger karê wî bû. Jixwe pirê caran tara bêjingê di destê wî de bû, digerland, digerland û ji xwe re têra xwe diaxivî, qelew û devdagirtî diaxivî.

### **Dîmenê yekemîn**

Xamo bi qemçika Camo girtiye, herdu hember hev disekin û bi qerebalix ketine dan û standinê.

Camo: Ez û tu çawa birayê hev in ez nizanîm. Tu du carî li min dirêjî û bavê me kin bû. Em naşibin hev, ne bi hiş, ne bi deng û ne jî bi reng.

Xamo: Naxwe, filan bêvan, li ser bextê diya te be.

Camo: Erê, ji xwe tev de sûcê diya te ye, hema rehmetyê digot bixwîn û bixwîn, heta mejyê te bi van kitêban çelq kir.

Xamo: Ji loma bavê te jî tim got, filan bêvan, kirîn û firotin, kirîn û firotin û mejyê te jî tevde kiriye pere.

Camo: Ma ne xebera wî bû qey?

Xamo: Camo, birê min, filan bêvan, zanebûn pere tîne lê pere nikarin zanebûnê bînin.

Camo: Pere dikarin her tiştî bikin. Zarok jî vê yekê dizanin û di nêzîk de ez ê dikana solan vekim û tu yê bibînî? Ka em van pereyên ku rehmetyê bavê me ji me re hiştine em bi hev re solan pê bikirin û bifiroşin.

Xamo: Çima em ne kitêban pê bikirin û bifiroşin?

Camo: Ez dibêjim sol ew dibê kitêb. Kuro, hewcedariya ling bêtir e ji ya serî, tu çi bêaqil î lo.

Xamo: (Dikene) hewcedariya serî tim b filan bêvan, bi zanînê heye. Divê xelkên me bixwînin Camo, ling çawa be wê pê biqede.

Camo: Kuro, weke ku xelk li lingê xwe miqate ne li serê xwe miqate ne xwelîsero. Ma kî kitêban dikire ji pêvî çend kesên ku Xwedê ji wan stendiye, ha?

Xamo: Kitêb, kitêb gencîne ne gencîne, filan bêvan ên ku nizanin vê yekê divê zanibin (kitêbê ji bêrika xwe derdixîne û bi kêf lê dinêre) kitêb ji her tiştî buhatir in.

(Camo jî sola xwe derdixîne, bilind dike.)

Camo: Hema weleh sola min buhatir e ji kitêba te, ka kitêba te bi çiqasî ye hê?

Xamo: Kuro filan bêvan, tu nizanî ez çi dibêjim.

(Camo bi hesret li sola Xamo dinêre.)

Camo: Weleh, sola te jî xweşik e birê min, tu nafiroşî min?

Xamo: Belê, bi serê te.

Camo: Bi serê min çilo?

Xamo: Serê xwe bide min ez têxînim lingê xwe, filan bêvan, ez ê sola xwe bidim te.

Camo: Ka hela wê kitêbê, ji **te re** sol û binêre wê çawa be. Solê deyne ser serê xwe û ka kitêbê. (Xamo bêyî ku bifikire solê datîne ser serê xwe û Camo kitêbê dixîne bin lingê xwe, weha disekinîn, Xelefo tê.)

Xelefo: Erê, birrê min, dunya tara bêjingê ye birê min, digere digere, dizîvire û dibê gurm, di gwîzeka mirov de lê dikeve. Mirov dimre, gava mirov bê sol be, bê sol, sol (ziq li sola ser serê Xamo dinêre). Eeew, dunya wilo ye birê min, carna sola mirov dikeve serê mirov û lingê mirov jî (li lingê Camo dinêre) kitêban dixwîne. Ev hûn çi dikin birê min. (Li herduyan dinêre). Erê birrê min eger we rastiya rast weke serê gopal divê, bi Xwedê, rast e ku diya we yek bû lê ez tu carî naxim bextê xwe ku bavê we yek be. (Herdu bi xwe dihisin, her yek tiştê xwe vedigerîne cih.)

Camo: Jixwe em kêmî te mabûn, dîne beredayî.

Xelefo: Erê, birrê min rastî tahl e birrê min. Diya te Meryem bû birrê min. Ji ber wilo jî pêxemberê weke te maşeleh bejinzirav jê ketin.

(Dengê Leto tê, Leto jineke dagirtî û bikêrhaftî ye, rûxweşik û li ser xwe ye. Him cihekî biçûk ji bo firotina xwê ji xwe re çêkiribû, him jî kîsê xwê diavêtin ser piyê xwe û digeriya. Pîvana wê jî ji

bo xelkê şorbûn û kelêbûn bû. Dîsa dengê Leto bilind dibû...)

Leto: Xwê, xwê, xwê, xwêya spî, ji berfê spîtir e, xwê, xwê.  
(Leto xuya dike, xwêya wê li ser piştê wê ye.)

Xelefo: Ji Camo jî dirêjtir e. (Bi tinazî teqlîda Camo dike)

Leto: Xwêya ji axê erzantir e. Xwê, xwê.

Xelefo: Ji xamo jî kintir e. (Bi qerf teqlîda Xamo dike)

Leto: Çi ye dîsa Xelefo? Tu çi xwe kelê dikî. Tu çima wilo bêxwêyî lo?

Xelefo: Ax, Letoka xwê ez bimrim. Tu yê min bikî Leto, hê? Em ê kengî bizewicin?

Leto: Wî pepûko, ma ez û tu, em ê çi bikin ji hev?

Xelefo: Hê, te got çî? Ma xelk gava hevdu dikin, çî dikin ji hev Leto, hê? Tu wilo nizanî, ne?

Leto: Na pepûk, min got yanî, ez Letoka bê cih û war û tu dînê sîkakan?

Xelefo: Ez ê dilê xwe ji te re bikim hêlîn Leto, bes tu bêjî erê û yê din li ser min. Ax, ez bimrim, Letoka xwê, bes bêje erê, tu yê derbê zilaman bibînî.

Leto: (Dikene) waweylê, waweylê, li vê hetîketiyê. Bi Xwedê çawa ez dîn im tu ne dîn î, Xelefo.

Xelefo: Erê, Leto, ji xelkê we ye ku dilê dînan tune ye. Nizanin ku yê wêk te mala bavê mirov dişewitînin. Agir berdidin hestiyê heftê û heft bavên mirov. Mirov dîn dikin û berdidin çolan. Ax ez ê di nav xwêya te ya spî de bimrim, Leto. Ax, ez bimrim.

Leto: Wey tu bimrî û nefilitî, Xelefo! Te hişt ku ez xwe jibîrbikim ku ez xwê difroşim.

Xelefo: Wek ez zanim bi dilê te ye jî Leto, lê tu çima ewqas xwe giran dikî ez nizanîm. Keçê mesele pir rehet e, Leto. Dunya zû dizivir e, ha. Tu yê sibe poşman bibî, ha, Leto, weleh tê bêjî wî dînê xweşik ji min re digot û min bi ya wî nedikir.

Leto: De here dînê heram... Xwê, xwê, xwêya ji berfê spîtir. (Bi meşe-ke reqsok Leto dimeşe, Xelefo jî ziq ji paş de lê dinêre.)



Xelefo: Ax, ez bimirim, Leto. Dibêjin çima Xelefo dîn dibe birrê min, ê kî li vê meşa nazik û xweşik û rindik binêre û ji xwedîya meşê mehrûm bimîne, jixwe wê dîn bibe birrê min. Ma ez ê çima dîn nebim, hê? Dunya ev e birrê min. Tara bêjîngê ye, digere, digere û dibê qerp di gwîzeka mirov de lêdikeve. Nexasim ku mirov xwas be. Îca bê sol dunya çarqorzi digere birrê min. Bê sol nabe. Camo weha dibêje birrê min. Ez jî dibêjim, bê Leto nabe. Ax, ez bimirim, Leto. (bi nalîn ji xwe re distirê)

*Leto, Leto, Leto ez mirim.*

*Por spî bû, ez kal kirim.*

*Derdê eşqê pir giran e,*

*Rê neman bi ku ve herim.*

### **Dîmenê duyemîn**

(Sûk du alî ye. Li aliyekî pirtûkxana Xamo, li aliyê dî dikan a Camo ya solan e. Hemo, lawê wî yê biçûk, li ber destê wî diçe û tê. Kar dike, xelk tèn, solan dikirin û diçin. Hemo xortikekî nûhafî ye. Kumê wî herdem li ser serê wî yê gilover e. Bi sivikayî û lez û bez li ber destê bavê xwe yê kinik dipengize vî alî wî alî. Xinxinokî û tîrsonek e. Camo bi firotina solan daketibû û li pirtûkxaneyê li kêleka dikana wî pirtûkek di destê birayê wî Xamo de bû, dixwend. Pingîna mêşê ye. Nahêle ku Xamoyê belengaz bixwîne. Dixwaze mêşê bigire, nikare. Her carê bi hêrs dixwaze wê di kefa destê xwe de hêsîr bigire, lê mêş nakeve zefta wî, weha hewildanên wî dubare dibin. Xelefo jî aliyekî de tê. Leto jî aliyê dî de tê.)

Xelefo: Erê, birrê min, dunya xiyar e, xiyarekî mezin e û di pîrka feqîran de şikestiyê û dernakeve jî birrê min, ne diçe û ne jî tê birrê min.... dengê Letoka min e, birrê min. (Dengê Leto tê, Xelefo pê ve diçe...)

Leto: Xwê, xwê. Xwarin bêxwê nayê xwarin, xwarina kelê nayê xwarin, bêxwê nabe.

Xelefo: De bêje, bê Xelefo jî nabe ha Leto.

Leto: Ev tu yî dîsa?

Xelefo: Erê ez im, rih û can û dil û gurçika Xelefo, ka em herin pîroz-bahiya van ciwamêran. Ma tu nabînî, du dikanên nû li sûkê zêde bûne Leto?

Leto: Ha, bi Xwedê tu ji bîaqilan bîaqiltir î Xelefo.

Xelefo: Erê, wek Leto, lê çî fêde, ax ez bimrim. (Bi hev re diçin cem Xamoyê ku şerê wî bi mêşê re berdewam e. Kitêbê datîne ser masê û bi wan ve radibe.)

Leto: Roja te bi xêr Xamo, wey ser xêrê be rebî. Xwedê rizqekî baş ji te re bişîne.

Xelefo: Pîroz be birê min.

Xamo: Wey Xwedê ji we razî be, hûn ser ser û çavê min hatin, filan bêvan, Xwedê ji we razî be.

Leto: Hema ev cil bi dilê te be.

Xamo: Wek, filan bêvan, baş e, ne xerab e, berî ez bêm vir min ji çend ciwamêrên filan bêvan pirsî ew jî ji haziran zêde nakin, qala we û têkiliyên we yên xweş kirin, yanî filan bêvan.

Leto: Yanî hema tiştek lazim bû, Xelefo wek çiyayekî li pişta te ye. Wê di cih de bi hawara te de bê.

Xelefo: Erê birrê min. Ez ê wek tara bêjîngê bizîzikim bizîzikim û xwe li ser gwîzeka te deynim.

Xamo: Xwedê ji we razî be filan bêvan, divê mirov felsefa wî ya taybet hebe ji bo jîyanê. Divê filan bêvan...

Leto: Te go çî? Te go çî? Felsefe melsefe. Tu çima nabê Xelefokî din li me zêde bû?

Xamo: Bingeha peyv û ramanên Xelefo jî wek filan bêvan ne ji valayiyê tîn.

Leto: (Bi tinazî) Erê, erê, ji goncaleke tije aqil tê. Ev çima gotinên we wilo kelê ne lo. Wele mirov tiştekî ji we fêm nake.

Xamo: Her mirovek pêpelûkeke têgihîştina wî heye. A niha filan bêvan divê...

Leto: A niha divê em herin cem birayê te jî. Dîsa ser xêrê be û hûn sed xêrê ji karê xwe bibînin.

Xamo: Nabe, nabe, çayekê, qehweyekê, filan bêvan, şekirekî, şênîyekê, filanbêvan, ji bo me ne baş e.

Xelefo: Bi xatirê te birrê min. Haya te ji meta te hebe ha.

Leto: Em herin, Xelefo. Xwe bes kelê bike ha.

Xelefo: (li Xamo dizivire) Weeeew, bi Xwedê mirov lempakê bi serê te veke wê her kes bê ev beşt e. Stûn e, stûneke dirêj, heta sibê dirêj e, birrê min. Rewş li ezmanan çawa ye birrê min?

Xamo: Mirov dirêj be filan bêvan çêtir e ku mirov bêaqil be, Xelefo. Yanî filan bêvan, aqilê sivik barê giran.

Xelefo: Yanî tu ewqas bi aqil î, de ka bêje naxwe birrê min ev çi ye? Tiştêkî min heye hem şil dike, hem dîwêr qul dike?

Xamo: Mîx e, bizmar e.

Xelefo: Na, birrê min, na, ma bizmar çi şil dike?

Xamo: Ê, filan bêvan, sed tişt heye.

Xelefo: Hişş, dilope dilop. Tiştêkî din. Tiştêkî min heye tu bi teriyê digrî, diçe axur, çi ye? De ka bêje birrê min ma ne te got qaşo ez bi aqil im.

Xamo: Çêlek e, golik e, yanî filan bêvan, hezar tişt bi terî ye.

Leto: Em herin, Xelefo.

Xelefo: Erê, erê, deqakê, erê, birrê min, gelek însan jî bi terî hene, ferza mirov wan nabîne. Kevçî ye kevçî malnexerabo. Baş e şertê min î dawî, eger te tê dernexist bi Xwedê çû û çû. Ez aqilê te nema bi quruşekî bi qul dikirim.

Xamo: Bila tiştêkî filan bêvan be ha.

Xelefo: Erê, erê, tiştêkî min heye spî spî weke şîr, reş e reş e weke qîr, diçe diçe weke tîr, çi ye?

Xamo: Ê, encex yekî filan bêvan. Yanî wek te be heta zanibe.

Xelefo: Dewleta bavê we çi ye ku yekî weke min di nav we de derkeve kuro, mala minê. Bi şev û roj kitêban dixwîne, heta sibê dirêj e

û hîn leglegê nas nake. Legleg legleg e, birrê min. De were û safî bike, îca birrê min, dibê çima em nabin dewlet jî.

Leto: Em herin Xelefo. Te ez teqandim, kuro.

Xelefo: Te jî agir berdaye hestiyê kalikê min, Leto. Ê, eger zanayên me wilo bin em ê çawa bibin dewlet, birrê min. Ax, ez bimrim, Leto, ji bo te, ax. (Herdu derdikevin. Xamo vedigere xwendinê û şerê bi mêşê re.

### **Dîmenê sêyemîn**

(Camo li ber kasê rûniştiye. Pereyan dihejmêre. Lawê wî, Hemo, kum li serê wî ye. Solê li ber lingê yekî dafîne. Yekî din jî li benda Hemo ye. Xelefo û Leto derbas dibin. Xwe rast li Camo digirin. Rûyê xwe li wan tîrş dike. Bê dilê xwe silava wan vedigerîne.)

Xelefo: Merheba ji te re, birrê min.

Leto: Roja te bi xêr, Camo. Ser xêrê be cihê te.

Camo: Xwedê xêrê bi we de.

Xelefo: Îca tu çima weha bê dilê xwe dibêjî birrê min. Tu dibê qey me nanek xwariye û me pariyek daye te.

Leto: Ez kîlok xwê ji te re bînim, Camo?

Camo: Xwê ji bo çi ye?

Leto: Têxîne nav xwîna xwe, belkî hinekî şêrîn bibe.

Camo: Hûn ji cem yê xwînşêrîn tên bes e. Ev cara yekem e, ez dibînim xelk diçin cem yê biçûk, dû re tên cem yê mezin.

Leto: Yanî tu ji Xamo mezintir î?

Xelefo: (Şaş maye). Ev çawa bû, birrê min. Nigekî wî bi qandî te dirêj e.

Camo: Ew yê dirêj e, ne yê mezin e. Wa ye Xwedê lingên dirêj dane hecî leglegê jî. Naxwe ew yê mezin e, ma ev gotin e qey? Eyb e lo, şerm e şerm.

Leto: Naxwe em hem lêborîna xwe dixwazin û hem jî em ê dîsa bêjin ser xêrê be.

Camo: Hemko, ka çayê ji mêvanan re werîne zû. Kerem kin, kerem kin rûnên. (Herdu rûdinên.)

Hemo: Wek gulê ez çayê tînim, bavo. (Dibe himhima wî, weke otomobilê germ dibe, gurîniyê bi xwe dixîne û baz dide.)

Leto: Maşele, xuya ye cem te vala nabe. Em saetekê li wê kitêbxanê man, heft heram be kesî ne got merheba jî.

Camo: Divê yek sûkê nas bike, Leto, xelkê nas bike, bêtir li çî dipirsin. Li çî miqate ne. Meselen, niha kitêb yan sol, mirov bê kitêb dikare bimeşe, lê bêyî sol kî dikare bimeşe?

Hemo: (Çayê tîne û bang dike.) Bavo, bavo, yek bang te dike.

Camo: Kî ye, kuro?

Hemo: Nizanim wa ye li serê kolanê ye, pir bi lez e.

Camo: Ez niha vedigerim. (Bi lez diçe. Hemo tê pişt masê, pera derdixîne, çav dide Xelefo û pera dixîne bin kumê xwe.)

Xelefo: Erê birrê min bi Xwedê te ji bavê xwe jî bêtir dunya fêm kiriye.

Leto: Min îro tu xwê nefirox Xelefo. (Hayê wê ji Hemo nîne.)

Xelefo: Dunya wilo ye Leto, tara bêjingê ye, digere digere, geh vîki vala digere, geh jî dişkê û dipelixe.

Camo: (Bi bez vedigere.) Min kes nedî jehro, Hemo.

Hemo: Ê, qey çû, li benda te nema, ma ez çî bikim? (Vedigere karê xwe.)

Camo: Wî, îca min ji we re negot. Ez gelek mêran nas dikim ji bo solekê jinên xwe berdane. Ji eşîra me deh mêr ji bo solekê hatin kuştin û di wê navê re du sê cîranên wan jî birîndar bûn. Heta niha salê yek ji me û yek ji eşîra din ji bo wê solê tê kuştin. Ka bêje, kî guh dide pirtûkan û kî ji bo kitêban serê xwe jî wek vî birayê min ê ker diêşîne. Ma ne xebera jina wî ye?

Leto: Tê bihêlî ez solan jî bi xwê re bifiroşim ha.

Camo: Sûk têra me tevan dike. Lê serê du beranan di beroşekê de nakelin, Leto.

Xelefo: Erê, birrê min, ma encex serê te tenê di du beroşan hiltê. Bi Xwedê te tenê dunya fêm kiriye. Dunya ev e, birrê min, soleke nû

ye, dibiriqîne. Piştre kevn dibe. Piştre jî berî mirov wê biavêje ew mirov diavêje. Ji xwe ferqa di navbera solê û dunyayê de jî ev e.

Camo: Min nizanîbû tu feylesofî jî Xelefo.

Xelefo: Erê, birrê min, min jî wek te felsefa solan xwendiyê. Erê birrê min, qazî mazî qilopazî, ne ez ji te, ne tu ji min û ne kes ji kesî dibe razî. Qazî mazî qilopazî. Dunya ev e, birrê min, ew jî weke me, kerê nizm e. Hinek siwar tên, hinek jî dadikevin. Jixwe kesî li vî welatî kêf nekiriye ji pêvî keran. Ma ev hal e, birrê min ku mirov xweziya xwe bi halê keran bîne. Ker, heyfa keran, çiqasî kêfa min ji keran re tê. Lê eybek wan tenê heye ku ker in, ka em herin Leto, te wilo cihê qûna xweş xwe kiriye!

Leto: (Radibe.) Erê, wele, bes e.

Xelefo: Bi xatirê te birrê min.

Leto: Bi xatirê te, Camo.

Xelefo: (Nêzîkî Hemo dibe.) Ew ê di bin kumê te de, bi nêvî ne ha, yan na ez ê jê re bêjim. (Hemo bi tirs serê xwe dihejîne. Xelefo û Leto derdikevin...)

Xelefo: (Distirê.) Leto, Leto, Leto, ez mirim. Por spî bû, ez kal kirim. Dêrê eşqê pir giran e... Rê nema, bi ku de herim. Sebir nema bisebirim.

## **Dîmenê çaremîn**

(Xemlêya kinik, jina Xamo, rahiştiye beroşa vala û ji xwe re distirê û li binê beroşê dixîne. Bi dengê bilind bi kasetê re distirê. Stran ya Mehmûd Ezîz e.)

Bejna te ji dara rimê, yarê min, mêrê min.

Tilî ji mûm û findê, mêrê min, Xamoyê min.

Wê xwarinek xweş bîne, mêrê min,

Bero vala namîne, mêrê min, Xamoyê min.

(Xamo bi pirtûk û rojnameyên xwe ve dikeve hundir. Xweziya xemlê di ber de dimîne û dike qerebalix.)

Xemlê: Bêhna xwarina cîranan her roj bi ser me de difûre û wê Xamo axa rojê kitêbeke nû bi xwe re bîne mal.

Xamo: Ev baş, jina min... îhî, îhî.

Xemlê: Ka te çi ji bo şîvê anî îro mêro? Em ê kitêb û pel melên te bixwin.

Xamo: Hemo, bi telaq, Bernard Shaw heq pê re hebû, gava li ser jinê digot.

Xemlê: Bernard mernardo ez nizanim, lê xweska ji pêvî quretiyar tiştekî din ji te bihata.

Xamo: Bi rastî xebera Nîetzche bû, gava li ser zimanê Zara digot.

Xemlê: Digot çi, Xamo? Digot eger xwarin li malê tunebe kitêban bixwin.

Xamo: Na, na, digot, filan bêvan, eger jin bilind bilind bû digihê sewiya çêlekê.

(Xemlê êrîş dike, kitêb û rojnameyên wî belav dike û bi sola xwe bi nav serê wî dikeve.)

Xemlê: Ê, ne ez ê te û vî Nîetzcheyê te herduyan bi qurbana serê çêlekê kim. Hema tu bi kêrhatî ba, te yê lingekî çêlekê, ji bo xwarinê, anîba malê.

Xamo: Keçê îro kesî kitêb nekirin filan bêvan, yek kitêb nehat firotin, ma sûcê min e, ma ez ê bi sipiyên serê xwe xwarinê ji te re bînim.

Xemlê: Ê, ne tu zilamê malêyî qaşo.

Xamo: Xuya ye filan bêvan, ji vê lêxistina ku min xwar xuya dike. Zilam ji ku mane filan bêvan tenê mane.

Xemlê: Filan bêvan kî ne, Xamo?

Xamo: Zilamok in, zilamok tenê mane vî zemanî.

Xemlê: Çima wa Camo, mane birayê te ye û nîvê te nayê, heta qirika xwe di nav peran de maye.

Xamo: Na, qirika Camo ji ku heye îca?

Xemlê: Ma wê ji ku wek qirika te wilo vezilandî be.

Xamo: Keçê Xamo serê xwe ji lingê xwe nas nake. Felsefê ji siyasetê ji filan bêvan ji kultûr û çandê dernaxîne ha.

Xemlê: Ê, ne mala minê te kiriye çerx. Te kiriye şorbe. Ax, serê min diêşe, serê min ji min ket.

Xamo: Sibê, sibê, em ê herin ser dixtor, filan bêvan, a niha rabe şorbenîskêkê ji me re çêke.

Xemlê: Ertekî min heye.

Xamo: Wey ser serê min, ser çavê min. Hema filan bêvan, ku ez karibim.

Xemlê: Erê, erê, tu dikar î.

Xamo: De ka bêje çi ye? Filan bêvanê te.

Xemlê: Ez şorbê çênakim, ku tu vê kitêbê pel bi pel navêjî nav.

Xamo: Keçê, tu dîn bûyî, Xemlê. Tu yê kitêbê têxînî nav nîskê.

Xemlê: Ê, naxwe ez çênakim.

Xamo: Ê, tu yê çêbikî.

Xemlê: Binêre, ez ê dîsa rabim te ha.

Xamo: (Serê xwe dihejîne û kufkuf jê tê.)

Xemlê: Tew deng jî nabe xwe.

Xamo: Eger van kûçikbavên lêkolîner, sosyolog û jinparêzan jina min nas bikirana gelo wê ji wan dîtinên xwe venegeriyana. Ji sedî sed wê filan bêvan bûbûna. Min jî hemû feylesof, zana, arkeolog. Filan bêvan, sosyolog, fizyolog, dîroknas, biyolog û astrologan tevdan fêm kir û min qet tiştek ji vê jina xwe fêm nekir.

(Xemlê radibe, gazê vêdixîne û beroşa avê datîne ser û kitêbê ji bo kelandinê amade dike. Xamo bi tenê dihêle û derdikeve.)

### **Dîmenê pêncemîn**

(Cemo, jina Camo ya dirêj û Leto rûniştîne, çayê vedixwin. Ji hev nêzîk weke ku qala tiştên taybet dikin. Leto xwiya xwe daniye ber xwe.)

Leto: Mêrê te niha nayê porkurê, Cemo.

Cemo: Wî qurbana Camoyê xwe. Gerek niha Xemlê bihata.

(Li derî dikeve. Cemo vedike. Xemlê bilez tê.)



Xemlê: We behsa çi dikir hê? We qala çi dikir?

Leto: Me qala mêrê Cemo dikir. Me go hingî feqîro bi firotina sol molan da ketiye. Kar marê Cemo ji bîr kiriye.

Cemo: Weleh, yadê na. (Destê xwe datîne ser zikê xwe.) Va ye dîsa zik li min werimandiye. (Dikene.)

Xemlê: Wî pepûkê, tu dîsa bi heml î?

Cemo: Erê, weleh, bereketa Xwedê li mêrê min be. Hema dibê kurp, te dî derbê cihê xwe girt. Bi yek derbê re zarok çêdike. Ne wek mêrê hinekên din (Li Xemlê dinêre.)

Xemlê: Wey qurbana Xwedê bim. Hema çilo be mêrê min hinekî di-keve çavê mirov de, ne wek mêrê te, nîv mitro ye.

Cemo: Tu nizanî çi qasî Xwedê hostaye keçko. Xwedê teala deverekê kin dike devereke din dirêj dike, bi Xwedê maşelle têra heft jinan dike, elhemdulillah.

Leto: Xwedê hemû deverên mêrê te dirêj bike, Cemo.

Cemo: Elhemdulillah tiştê ji min re lazim heta tu bê bes dirêj e. Ne wek hinekên din ku ji derve de dirêj dirêj û ji hundir de bê hêz, nikarin zarokêkî çêkin.

Xemlê: Ê, bi serê te heta berî sibehê xirecira wî ye.

Cemo: Bi berçavk yan bê berçavk bi te re radizê.

Xemlê: Ew çima?

Cemo: Belkî heta sibê dike xirtepirot, ji ber ku li te digere te nabîne keçê. (Mîna koran dike.)

Xemlê: Ê, tu bawer nakî, were rojekê biceribîne naxwe.

Leto: Ê, Cemo jî heta sibê li sola wê digere.

(Hemû dikenin. Camo derbas dibe. Civat sar dibe.)

Camo: Êvara we bi xêr.

Xemlê: Ser çavan.

Leto: Wey, ser seran, Camo.

(Cemîla diçe ber bi mêrê xwe de. Camo xwe wek dîk dinepixîne. Hemo jî bin kumê xwe dixurîne û bêdeng dide bende.)

Cemo: Wey, qurbana mêrkê xwe bim. Wî Camoyê min ê xweşik.  
(Qurîncokê dide gepa Camo, Camo wê dide alî.)

Camo: Xelefo çawa ye, Leto.

Leto: Silavan li jina te dike, Camo. Min serê Xelefo bi jina te ya har vekirî. Rab keçê rab. (Ji Xemlê re dibêje.) Em herin berî şerekî.

Camo: Wê hesretê ji dilê Xelefo derxîne, ma wê çi bi te bê Leto?

Leto: Weleh, tu kes ji jina te çêtir tune ku vê hesretê ji dilê Xelefo derxîne. Hema şevêkê jina xwe bidê, wê Xelefo sipîsax bibe.

(Dengê Xelefo ji dûr de tê. Tevde disekinin.)

Deng: Dunya tara bêjingê ye, birrê min. Digere, digere û di gwîzeka mirovê bê pişt de lêdikeve, birrê min. Dunya ji solên Camo buhatir e û ji xwêya Leto erzantir e, ax, ez bimirim, Leto.

(Leto pê re derdikeve û Xemlê dide dû. Hemo dixwaze biçe razê.)

Hemo: Xewa min tê, ez ê herim razê, bavo.

Camo: Erê, lawê min, lê ma tê tevî kum razê. (Destê xwe diavêje kumê wî, Hemo direve.)

Hemo: Ez ê deynim.

(Camo herdu destên xwe vedike û li benda Cemo dimîne da ku çakêtê wî jêbike. Cemo xwe ji bîr dike. Piştî vediciniqê û tê çakêtê wî jê dike û dadiliqîne. Wisa gerefêta wî jî.)

Camo: Keçê bilive.

Cemo: Xuya dike xelkên vê derê ne xerab in, Camo, yan na?

Camo: Erê, erê, tevde ji te çêtir in û zimankintir in. We qala çi dikir îro... Hê?

Cemo: Me qala dunyayê dikir, ma em ê qala çi bikin?

Camo: Yanî îro binê lingê te naxure, mane wê xuya bike. Tu wî darî dibînî, ne?

(Tiliya xwe ber bi darê daleqandî ve dike.)

Cemo. Erê, çawa?

Camo: Çawa bi çûkanî mamosteyên min yê dibistanê nimreya lingê min kirin çelûpênc, ez ê jî nimreya lingê te bikim şêst. Îca kêfa te ye.

Cemo: Ê, tu bêkêr bûyî, te nizanîbû dersên xwe bixwendana, ma a min çi ye?

Camo: Ez rabim qey? Yaho hîn bi zimanê xwe jî nikare, wax, wax, wax... qey te radyo daqurtandiyê keçê?

Cemo: Na, çavê min, min sol daqurtandine.

Camo: Dibê wer û kirasê xwe neçirîn, ha.

Cemo: Te divê sola xwe jî biçirîn.

Camo: Nifira herî xerab mirov li yekî bike, mirov bêje Xwedê te di yekî zimandirêj de bigerîne.

Cemo: Na, wele, bê Xwedê kesî di yekî bejinqut de negerîne.

Camo: Îro ji min nayê ez li te xînim, were gorê min ji lingê min bike were. Qey wê li min û te nebe sibe, wan bişo, haa. (Cemo, bêdilê xwe, radibe tê gorê wî jêdike. Xuya ye bêhna nexweş ji goreyên wî tê.)

Cemo: Ez nema di ber te û goran re digihêm heyran. Ewqas solên te hene û tu nikarî solekê di lingê xwe ke. Dibê were û deng neke. Ma mirov çilo wê bi zimanê xwe karibe?

Camo: Xuya ye ciwamêrî bi vê jinikê re nameşe... Ya Xwedê.  
(Berê xwe dide dar, Cemo direve.)

### **Dîmenê şeşemîn**

(Xamo dixwîne. Mêş nahêle. Di bin simbêlan re dikene û radihêje mêşkuja lastîkî. Jê we ye ku mêş kuşt, lê dîsa dibe pingînî. Xelefo jî sekiniye, geh lê dinêre û geh li Camoyê dûr.)

Xelefo: Ev dunya çi ecêb e. Îca ev ê ewqas dirêj birayê ew ê ewqas kin e. Xebera bavê min bû, rehmetî digot mirov ku di îşê Xwedê de bifikire wê here ser kufrê. Ma eger hinek ji dirêjbûna Xamo têketa ser kinbûna Camo ne çêtir bû gelo? Wê ev hinekî kin bûba û wê ew jî hinekî dirêj bûba, weha baş dibû, lê... Erê, birrê min, dunya telomelo çêbûye, wê telomelo bimîne û hey bimîne, birrê min. (Xamo carê li Xelefo dinêre...)

Xamo: Xelef, were cem min hinekî, lo!

(Xelefo tê cem Xamo. Ziq li Xamo dinêre.)

Xelefo: Çi ye birrê min, tu hinekî ji dirêjbûna xwe bidî min qey? A niha tu ji vê dirêjbûnê aciz î, ne?

Xamo: Tu bikî nekî, filan bêvan, mirov hinekî aciz dibe. Tu dizanî, Xelefo, ez dihisim yê di vê sûkê de herî nêzîkî min filan bêvan tu yî.

Xelefo: Îca me kêf kir. Çima, birrê min, te kes ji min bi aqiltir nedît qey?

Xamo: Di pêvajoya pêşketina qonaxên dîrokê de, filan bêvan, dîn-bûn qonaxa berî rizgariya milî ye. Yanî filan bêvan...

Xelefo: Ê, birrê min, berê serê min li hev ketiye. Şeş kêm ribeke ha û min qatê jor jî daye bi kirê. Kurt-kurmancî, tu dixwazî çi bêjî, bêje û me xelas ke, birrê min. Xulqê min ne ewqasî firehe ha.

Xamo: Xelefo, a niha tu nikaî hinek pere bi deyn ji min re peyda bikî. Piştî demeke kin filan bêvan, ez ê li te vegeînim.

Xelefo: Xwedê te ji diya te re bihêle, lo. Tu çiqasî biaqilî maşele. Birrê min, tu dixwazî masiyan li çolê bigirî... Te kesek ji min halxweştir nedîtiye qey? Çima birrê te?

Xamo: Birayê kesî, vî zamanî bi kêrî wî nayê, Xelefo. Dunya bûye filan bêvan...

Xelefo: Dunya bûye tara bêjingê, birrê min. Hema dizîvire, dizîvire û ne genim û ne ceh, tenê zîwan digihê me, birrê min.

Xamo: Ez nizamim ne Sokrates, ne Hegel bû ne jî Kant bû digot...

Xelefo: Îcar li me û li van nav mavên qelew ha. Dunya kurtanê kerê boz e, birrê min, carê li piştta yekî ji me ye. A niha tu ji min re na-bêjî, ev çi kitêb in, kê xêr ji wan dîtiye, heta tu bibînî, birrê min?

Xamo: Na, Xelefo na, hemû pêmayiyên mirovayetiye filan bêvan, ji hezaran salan de, di nav van pel melan de veşartî ne. Filan bêvan, kitêb bingeha têgihîştin û zanîne ye.

Xelefo: Ê, çima solên birrê te ji wan bêtir tèn firotin, birrê min?

Xamo: Civaka me, dîroka me, rewşa me, filan bêvanê me, sewiya têgihîştina me, jiyana me, aqilê me...

Xelefo: (Aciz dibe.) Guhê me, serê me, bêvila me, teriya me, şimka me, kurtanê me...

Xamo: Ax, wa te got, filan bêvan, tevde sedemin bingehîn in ji paş-demayîna me re.

Xelefo: Bi serê diya min, emşoka dîn, min tiştêk ji te fêm nekir. Ping pinga wê mêşê nahêle tu tiştêkî ji xwendinê fêm bikî û filan bêvanê te jî nahêle mirov tiştêkî ji te fêm bike. Ez ê rabim herim, birrê min, berî ku ez qatê jêr jî bidim bi kirê. Bi xatirê te, birrê min. Silavan li mêşa xwe bike, birrê min. Bi Xwedê halê te ne tu hal e, li vir pingîna mêşê û li mal vizîna sola Xemlê.

(Xelefo diçe. Xamo hinekî li dora xwe diçe û tê. Çeka xwe -dijî mêşê-datîne ber xwe û dixwîne.)

### **Dîmenê heftemîn**

(Hemo di nava xirecira çûn û hatinê de ye. Camo kêfxweş li ber kasê ye. Leto ji wir de tê cem.)

Leto: Xwê, xwê, werin xwê. Xwiya ji berfê spîtir, xwê. Xwarin bêxwê nabe. Xwê jiyan e. Xwê derman e.

(Lawikek ji wir de tê, dixwaze bikire.)

Lawik: Tu şekir difroşî Xaltîkê?

Leto: (Bi hêrs.) Ez çîçîkê diya xwe difroşim.

(Lawik şaş û mat bi riya xwe de çû.)

Leto: Merheba ji te re, Camo.

Camo: Wey, serçavê min, kerem ke.

Leto: Ev tu zanî çima xelk wilo kelê bûne û tev weha mane bêxwê weke ku Xwedê ji wan stendibe.

Camo: Qey xwêya te şêrîn bûye.

Leto: Na wele, ji ber ku kes nema xwê dikire. Qey kes nema xwarina bi xwê li vî welatî dixwe, Camo?

Camo: Hema ez dibêm qey jina min tenê xwêya te dixwe, ewqas şor e malnexerabê.

Leto: Min got, berî çend rojan birayê te yê kinik Xamo hate cem min, min xatirê wî neşkênand û min hinek pere bi deyn danê.

Camo: Ê, ya min çi ye yadê?

Leto: Yanî me got birayê te ye.

Camo: Erê, lê bizin bi lingê xwe ye, mîh bi lingê xwe ye ha, ne wilo dibêjin?

Leto: Belê, lê...

Camo: Bi rastî hat cem min, min nedayê ji ber ku serhişk e, sed carî ez jê re dibêjim dev ji van kitêb mitêban û dev ji van qerwerk merwerkên vala berde, ew bi ya min nake, ma ez wî bikujim?

Leto: Wele, xuya ye bi hemû tiştî tu ji birê xwe jîrtir î.

Camo: Ma ne wilo ye?

Leto: Yanî di te de xuya ye ku heta di karê şevê de jî tu zîrek î.

Camo: Hema bi Xwedê hebe tunebe Cemoka min a dînik tiştin ji te re gotine.

Leto: Naxwe rast e, ne? (Biken.) Ez ê rabim herim xwêya xwe bifroşim çêtir e. De bi xatirê te yabo bes e.

Camo: Çayekê... qehwakê.

Leto: Xwê, xwê, xwê jiyane, xwê derman e, xwê dijminê nexweşiyane. Werin xwê, werin xwê, xwêya xweş, xwêya şor.

(Lawik ji wir de tê...)

Lawik: Şekir bi te re heye Metê?

Leto: Ma şekir şor e lawo?

Lawik: Na wele şekir şêrîn e.

Leto: Weke xwîna te şêrîn e, ne?

Lawik: Na weke lêvên te şêrîn e. (Lawik direve.)

Camo: (Bi hêrs, her tiştê di destê xwe de dihêle, gefan li jina xwe dixwe.) Ê, ma ez ê te negrim Cemo, jehrê, weleh wê ev jînik tisqa li min xîne. Dermanê wê dar e, dar, weleh xebera bav û kalan e, dar ji cenetê hatiye.

(Bi lez û bez derdikeve. Pê re Hemo tê pişt masê. Bin kumê xwe mişt pere dike. Xelefo xuya dike. Wî dibîne.)

Xelefo: Erê, birrê min, dunya kumê Hemo ye, birrê min, bê pere li ser serê mirov nasekine. Dunya ev e birrê min. Tara bêjingê ye,

birrê min. Hemo, ka hela were bi vir de. Tê para min bidî min an ez ji bavê te yî bejinzirav re bêjim birrê min.

Hemo: Te çiqas divê, Xelefo, ez ê bidim te?

Xelefo: Fiftî fiftî, birrê min. Nîv bi nîv. Nîvê perê wê carê û nîvê perê îro.

Hemo: Erê, yanî çiqas? Karê min heye. Dûre yê min jin û mal û zarok, sed tişt ji min tê xwestin yaho, ma çi li dû te heye?

Xelefo: (Behetiye.) Jin û zarokên çi, birrê min? Jina te û zarokên te hene yanî?

Hemo: (Mîna zilaman.) Erê, xelk tevde li van deran jinên wan yên bi dizî hene. Ma çima ji xelkê re adet e ji min re qebhet e.

Xelefo: Na, birrê min na, wilo be. Naxwe, kanî nîvê perên îro tenê, ê din ji zarokên te û jina te re. Lê jina te çend saliye, birrê min?

Hemo: (Aciz) Qala namûsê meke, Xelefo. Tu zanî namûs giran e (Nîvê pera dide wî.) Ji te heqê te û hew. Naxweş, a niha ez qala te û Leto bikim, hê?

Xelefo: (Pera dixîne bêrika xwe.) Ev çi bela ye, birrê min. Welehî tu wek xwe di bin erdê jî de yî. Birrê min! Tu jî bîra van tiştan dibî, birrê min?

Hemo: (Matmayî) Ez, himm, te wek min mesûliyet neceribandîye, Xelefo, hîn ji te re divê. Ji te re gelek divê heta tu dunyayê nas bikî. (Diçe bi yekî re, gulê datîne ber lingê wî. Xelefo jî dimeşe.)

Xelefo: Erê, birrê min, dunya dunya ye dizane, birrê min. Dunya emir û demê didize. Dem mirov didize, mirov jî ji hev didizin. (Destê xwe davêje bêrika xwe, perê Hemo derdixîne. Li wan dinêre. Li pera dinêre.) Erê, birrê min. Diza ji dizan dizî, erd û ezman lê pirsî.

### **Dîmenê heştemîn**

(Bi hêrs û bi lez Camo dikeve hundir. Çakêt davêje ser kursî û berê xwe dide dar û li Cemo digere. Wê dikişîne ser text. Bi text ve girê dide. Herdu lingên wê dimînin li derve, him binê lingên wê dixurîne û him dide ber daran.)

Camo: Keçê sed carî min ji te re gotiye, Cemo, bi zimanê xwe karibe.

Cemo, çênabe tiştê ku di nav her jin û mêrî de hene tu derxînî nav xelkê. Cemo, yek ji ya din re dibêje. Cemo, taxa me teng e û tiştek veşartî namîne. Cemo, te em rezîl û riswa kirine, Keçê. Wele, ez ê rojekê vî zimanê te jêkim.

Cemo: Çi bûye, Camo? Min çi kiriye, kuro? Xelk bêbextiyan dikin. Wele, min tiştek ji kesî re negotiye.

Camo: Keçê, ma Leto ji ku zane ez bi şev li ser text çi dikim, te serê min xwarê? Ma ev bêbextî ye, Cemo?

Cemo: Naxwe min berde, lingên min veke, ez ji te re bêjim, bê Leto û Xelefo çi dikirin wê rojê.

Camo: Îcar ev ji me kêma maye ku ez zanibim Xelefo çawa li Leto siwar tê yan nayê. Keçê, ev ne karê meriva ye, ne karê însana ye. Keçê, fêma bike. Ma Xwedê wextê aqil belav kir tu di ku de bûyî, Cemo?

Cemo: Ez li cem te bûm. Ma ez li ku bûm? Mala min ê, ew serê te yê mezin tevde aqil e.

Camo: Fêde tune ye wey. Fêde tune. Wele dawiya dawî ez ê talaqê te rojekê di destê te xînim û hew.

Cemo: Tu yê piştî vî emrî min berdî, Camo? Ê, ne heyfa nan û xwê. Heyfa rojên feqîrtî û qiriktaliyê Cemo. Naxwe wilo Camo?

(Piştî girî û gazinên wê, hêdî hêdî Camo dest û lingên wê vedike.)

Camo: Erê, wilo naxwe Cemo? Heta zimanê te ev ziman be. Wê ev dar jî tim lîngan biwerimîne. Îca tu zanî.

Cemo: Ê, ne heqê qenciye ye, Camo. Bi roj pê de ez pesnê te û mêraniya te ji pîrekan re didim, tu jî tê li jinika xwe ya delalî dixînî.

Camo: Wey, jinika min a delalî ji nav jinikan hilîne rebî. Keçê ev mêraniya wilo ji min re ne lazim e, ne lazim e hurmet. Fêma bike, keçê, ez pîreeeeek, ez pîrek. (Pentelonê xwe jê re dadixîne. Cemo rûyê xwe diguhere.) Ez çi bikim ji bo tu bawer bikî, hê? Ez nemêr im, ez pîrek im hi, va ye binêr...



## **Dîmenê nehemîn**

(Xemlê birçî û bi hêrs, di hundir de diçe û tê. Li beroşê dixîne û distirê.)

*Bejna te ji dara rimê mêrê min, mêrê min.*

*Tilî ji mûm û findê mêrê min, mêrê min.*

*Wê xwarinê îro bîne, mêrê min, mêrê min.*

*Beroş vala namîne, mêrê min, mêrê min.*

*Beroşê datîne û bi xwe re dipeyive.)*

Ê, ne eger Xamo îro jî tiştêkî bi xwe re neyne, wele ez ê wî bikim kebab, ez ê wî hûr hûrî bikim. Ev sed roj in dibê sibe û sibe, sibe û sibe. (Pê re taybê vêdixîne û strana “Sibe, sibe” ya Ciwan Haco bilind dibe.) Ew ji piştê bavê xwe ye wê îro jî bêje sibe. (Li saetê dinêre.) A niha dema hatina wî ye. (Xwe bi lez di piştê derî de vedişêre. Xamo dev bi ken tê. Kîs di dest de ye.)

Xamo: Baş e, jina min ne li mal e.

Xemlê: (Ji nişka ve) Na, na, ez li mal im, Xwediyê namûsa giran.

Xamo: Bismila, bismila.

Xemlê: Ka hela bê te çî aniyê, ka. Xuya ye ku te dawî fêm kir ku tu tiştêkî ji bo xwarinê neynî lingê te li vê malê nakeve.

Xamo: Keçê, filan bêvan, qîza ciwamêran, qîza deh mêran.

(Xamo dikeve hev. Xemlê kîs dibe, datîne ser masê. Destê xwe dirêjî kîs dike, kitêbek mezin derdikeve, çavsor dibin, kîs dirijîne erdê. Kitêb diqulipin ser hev.)

Xemlê: Em ê kitêban bixwin, Xamo?

Xamo: Afirandin, çand û kultûr xwarina aqil û dil e filan bêvan.

Xemlê: Ê, ne ez ê îro te biafirînim. Ez ê hestiyên te û kultûr multûra te biçînim nîskê.

(Kitêbekê diavêje, Xamo hildigire.)

Xamo: Filan bêvan, ev romanên herî nû derketî ne, keçko.

Xemlê: Ê, eger min fermana te di Romanya re dernexist bera ez ne Xemlê bim.

Xamo: Bêhna xwe fireh bike filan bêvan, ev çîrokên nû derketine, kurteçîrok in.

(Xemlê sola xwe ji lingê xwe derdixîne û dide dû pişta Xamoyê beziyayî.)

Xemlê: Ê, ne eger min tu li ser hemû zimanan nekir çîrok bela ez ne ji pişta Hisoyê pişturmî bim.

Xamo: Dema me dema diyalogê ye Xemlê, filan bêvan.

Xemlê: Ez ê diyaloga te di cihê berê kim, îca diyalog miyalog ji riya bavê min kê maye. Em ê diyalogê bixwin, ne?

Xamo: Keçê, ev sedsala bîst û yekê ye filan bêvan, aqil maqil...

Xemlê: Ev bîst û yek roj xwarin nehatiye hundir û tu hîn dipeyivî jî. Ma aqil hebûya tu yê ji ku wilo dirêj bûbûya.

Xamo: Ê, ne mala minê tu dara sipîndarê yî.

Xemlê: Ez darê ser serê te yî şimamokî me, korê xerabeyê heram.

Xamo: Keçê, filan bêvan, wê cîran me bihetikînin sibe, sibe.

(Pê re dîsa strana sibe bilind dibe.)

Xemlê: Dîsa got sibe, dîsa got sibe. Eger min serê te bi vê solê neşîkand heta sibê, bera ez jina te bim.

Xamo: Hihim. Jixwe berê tu jina min î filan bêvan, qey tu jina kê yî?

Xemlê: Ez jina xwe, Xamo ji îro pê ve. Ez jina xwe. Jina ku mêrê wek te qebûl bike ez ê porê wê bi ser de kurr bikim. Ez ê sibeha eydê gulî û keziyên wê bidim ber meqes û kêran Xamoyê xiloxavî û xerabe, ma ez ê te negrim qey?

(Bi solê êrîşî Xamo dike. Xamo direve vî alî, wî alî.)

### **Dîmenê dehemîn**

(Hemo bi muşteriyên solan da ketiye. Xelefo dunyayê dikire û difroşe, siloganên xwe diavêje. Leto xwê digerîne, dîsa yek tê şekir jê dixwaze. Xamo dipeyive û Camo bi hêrs lê guhdarî dike.)

Xamo: Divê tu jî xwe piçekî bilivînî, birê min. Filan bêvan, destê min teng e. Xemlê û filanbêvan, serê min gêj kirine.

Camo: Tu yê bibêjî, pera bi deyn bide min, ne?

Xamo: Maşele çiqasî birayê min bi aqil e. Filan bêvan, te ji ku zanibû?

Camo: Birayê te ji te aqil girtiye. Bi ya min bike û dev ji van kitêb mitêban berde, hûn ji wan re dibêjin çi? Pirtûk, dev ji van pirtûkan berde û ji xwe re tiştekî din bikire û bifroşe.

Xamo: Filan bêvan, ma tu karî bê xwarin bijî, Camo?

Camo: Ma pirtûkên te tên xwarin?

Xamo: Erê, çawa ku zik nan dixwaze, wilo jî rih, giyan filan bêvan, xwendin û zanînê dixwaze. Ev xwarina rih e, ya can e.

Camo: Îca wer û kirasê xwe neqetîne ha. Kî bîra vê dibe? Rih xwarinê dixwe? Wele te jî hişê xwe xwariye lo. Here karekî bike lo.

Xamo: Ê, va ye ez kar dikim. Ma ez çend karan bikim?

Camo: Karê bêpere, karê betalan.

Xamo: Ê, ma sûcê min e xelk naxwînin wey? Pêvajoya dîrokî dibêje wê filan bêvan rojek bê û wê xelkên me li pirtûkên xwe xwedî derkevin.

Camo: Ê, heta ew roj bê wê hestiyê te di bin erdê de birizin.

Xamo: Ez zanim ev zivirandin mivirandina te, filan bêvan tev de ji bo ku tu pera bi deyn nedî min. De bêje ez pera nadim û hew, Camo.

Camo: Ez ne ji bo wilo van tiştan dibêjim.

Xamo: Yanî tê peran bidî min?

Camo: Min negotiye ez ê bidim te.

Xamo: Naxwe ev çi filan bêvanî, yanî tu nadî?

Camo: Jixwe ez nadim.

Xamo: Kuro, ji pêşî de wilo bêj û bêyî filan bêvan û nizanîm çi.

Camo: Pere tune ne.

Xamo: Wey têr xwarina te tune be rebî.

Camo: Ji ber çavê min here çêtir e ku...

(Camo destê xwe diavêje solekê...)

Xamo: Îcar ha. Li malê sol û li vir sol, ez vê dema sol û şimikan protesto dikim. Ez ne şaş im, filan bêvan, ez ne xerab im, zeman xerab e.

Hemû sûcê filan bêvan e, xweska min zanibûya bê sûcê kê ye û ne sûcê kê ye.

(Keçek tê pirtûkxana wî, ew jî pê ve diçe.)

### **Dîmenê yazdemîn**

(Keç bi germayî dipirse. Xamo maddayî û xemgîn e.)

Keç: Tu çawa yî, mamoste?

Xamo: Kêf kêfa cîrana ye. Xelk roj bi roj halxweş dibin filan bêvan, ez jî, dûr be ji te, rûreş dibim, Baş im, baş im. Xwedê teala jî -es-texfîrullah- hema hestiyên min vedizilîne û hew, li qisurê nenêre min ji te nepirsî, filan bêvan, tu çi dixwazî filan bêvan?

Keç: Ez pirtûkên li ser pirsî jinê dixwazim. Li ser bindestiya jinê.

Xamo: Te go çi? Te go çi? Bindestiya kê? (Matmayî) Ya jinê? Yanî jin bindest e? Filan bêvan.

Keç: Bindestiya jinê du qat e. Him bindestiya dijmin û him jî bindestiya mêr.

Xamo: Yanî jin di bin destê mêr de ye? Yanî filan bêvan a niha Xemlê di bin destê min de ye? (Dikene û hey dikene.)

Keç: Kî? Xemlê pîreka te ye?

Xamo: Erê, erê, hema bi Xwedê te jina min nas kiribaya filan bêvan, te tu carî nedigot jin bindest e.

Keç: Çima Xemlê çi dike qey?

Xamo: Ne wilo tenê. Bi namûs te yê filan bêvan şerekî mezin dijî hemû jinên cîhanê bida destpêkirin.

Keç: A niha pirtûkên li ser doza jinê û rizgariya wê hene yan na?

Xamo: Tu li min negrî xwişkê. Bi Xwedê berî zewacê û filan bêvan ez jî wek te difikirîm, lê piştî min jin ji nêzîkayî nas kir, ez gihîştim vê baweriyê, her kesê ku li ser bindestiya jinê û filan bêvanê wê lêkolîn çêkirine wan bi xwe jin nas nekirine. Tim min di dilê xwe de digot, xwezî filan bêvan li yeke wek jina min rast bihatana, da ku xweşik jin nas bikirana.

Keç: (Bêsebirbûna wê diyar dibe.) Mamoste, min pirtûk xwestin.

Xamo: Bi Xwedê, hemû pirtûkên ku pesnê jinê û bindestiya jinê û filan bêvan di wan de hebûn, min hemû şewitandin.

Keç: Ew çima?

Xamo: Ji qehra jina xwe re, ma çima?

Keç: Naxwe ji pêşî de bêje tune û hew.

Xamo: Ê, ne tune ne, filan bêvan, tenê dilê min hênik nedikir. Erê, ji ava di beroşê de re gotin, ev çi peqpeqok in, filan bêvan? Got, li agirê bin min binêrin? Îcar yê min jî ev mesele ye.

Keç: Naxwe silavan li Xemlê û filan bêvan bike. (Bi ken dibêje û diçe.) Tu ji bîr nekî.

Xamo: Bi Xwedê, du jinên din wek jina min li dunyayê hebûna, niha dunya wê serobinoyî hev bûbûya.

### **Dîmenê duwazdemîn**

(Li hundir, Camo û Hemo karê xwe dikirin. Xelefo û Leto di nav gerebalixa sûkê re xwe li hev digirtin. Xelefo dihat û distira.)

Xelefo: Leto:, Leto, Leto, ez mirim.

Por spî bû, te ez kal kirim.

Derdê eşqê pir giran e.

Derdê eşqê pir giran e.

Dengê Leto: Xwê, xwê, werin xwê derman e. Xwê jiyar e.

Xelefo: Sebir nema bisebirim.

Ax, ez bimrim, Letoka xwê.

(Hinekê difikire. Leto xuya dike. Xelefo bi destê xwe digire û dike hawar.)

Xelefo: Ûyûyûy, ez mirim, Leto, ax, ez mirim.

Leto. Te çi kiriye, Xelefo? Te kêr li tiliya xwe xistiye qey?

Xelefo: Birîn e, Leto, birîna min xedar e, aaax, ez bimrim. Ka hinek xwê deyne ser birînê, Leto.

Leto: Kuro, wê xwê bêtir bişewitîne pepûko.

Lawik: (Tê cem Leto.) Xaltîkê ka kîloyek şeker.

Leto: Şeker mekir yan xwê.

Lawik: Bi gumana min bi kurmançî got şeker.

Leto. (Kulma xwe lê hildide.) Wa şeker bi çîçîkê diya te ve ye, şîrheram, jixwe aniha wextê te ye.

Xelefo: Ax, ez bimrim, Leto.

Leto: Wî mala min şewitî. (Hinek xwê derdixîne û bi destê Xelefo digre. Lê dinêre. Ji nişka ve berdide.)

Leto: Ka birîn, Xelefo. Tiştêk bi destê te nehatiye.

Xelefo: Erê, keçê, tiştêk bi dilê min hatiye. (Destê xwe li sînga xwe, aliyê rastê dixîne.) Aha va ye birîn, Leto, ax ez bimrim.

Leto: (Destê wî datîne ser dilê wî, aliyê çepê.) Dil li vir e pepûko. Wele dermanê te zewac e, Xelefo. Ya baş, em te bi zewicînin.

Xelefo: (Bi kêf) Erê, bi Xwedê. Tê min bikî, Leto. Ma çî bi min hatiye, hê? Bi Xwedê ne ji van sed û eybeke min bana mêr di ser min re tunebûn. Lê çî fêde dunya li serê Xelefo bûye tara bêjingê, Leto. Ax, ez bimrim, Leto.

Leto: Wî wey tu nefilitî rebî. Ma tê çî bikî ji min, Kuro, ez belengaza Xwedê.

Xelefo: Ez ê çî bikim ji te? (Behetî ye)

Leto: Erê, erê, tê çî bikî ji min ma wey?

Xelefo: Ku em bizewicin?

Leto: Erê, erê, ku em bizewicin.

Xelefo: (Dikene) Ma ez bêjim, Leto, hê? Ka ji van bipirs (li haziran dinêre) bê jin û mêr çî dikin, wê ji te re bêjin. Ma çîma wilo hê. Ka em dest pê bikin û tê bi çavê serê xwe derbê Xelefo bibînî, Leto, ax, ez mirim, Leto, hawar, ax.

Leto: Kuro, bes hawar hawara te, te em hetikandin.

Xelefo: (Weke ku di xewnekê de be û li dengê bilûrê guhdarî bike.) Wê dunya wekî din bigere, Leto. Wê zarokên me çêbibin. Bavo va ez hatim. Dayê va ez çûm. Tê serê wan bişo û ez ê wan bibim xwendinê û...

Leto: Wê tevde wek bavê xwe maşele bi aqil derkevin.

Xelefo: Erê, Leto erê. Wê aqilê bavê wan jî vegere.

Leto: Ma qey çûye ku heta ku vegere? Dû re ji ku heye heta ku here  
û bê Xelefo, wele tu îro bûyî Memê Alan.

Xelefo: Keçê Memê Alan çi bû? Romeo çi bû û Derwêşê Evdî çi bû?  
Bi Xwedê evîndar ne di ser min re û ne jî di bin min re tune ne û  
ne jî wê hebin. Ax, bes te bi agirê kezeba min zanîba, Leto, ax,  
ez bimirim.

Leto: Wele, wilo nabe, Xelefo.

Xelefo: Erê, bi Xwedê, jixwe wilo nabe. Divê carna mirov bê cil bi  
hev re bide û bistîne, Leto. (Dixwaze xwe tazî bike.) Ax, ez mirim,  
Leto. Bi Xwedê xebera te ye. Wilo nabe.

Leto: Kuro, yanî bê firotina xwê nabe kurîkemo. Yanî her ez digihêm  
te ez ji bîr dikim ku divê ez xwê bifroşim.

Xelefo: Hemo, Hemo. (Hemo bi lez tê cem.) Here pereyan werîne û  
wer kîloyek xwê ji xaltîka xwe bikire zû.

Hemo: Ma ez ê çi bikim ji xwê, Xelefo?

Xelefo: (Destê xwe datîne ser kumê wî.) Bi Xwedê tu nekirî ez ê kumê  
te hildim û ez ê bang bavê te kim.

Hemo: (Ditirse) Erê, erê, ez ê ji bavê xwe re bêjim diya min gotiye  
xwê li malê nemaye. (Diçe cem bavê xwe. Pera jê dixwaze. Piştî  
kurtepiştê, bi hêrs pera dixîne destê wî. Hemo bi lez vedigere.)

Hemo: Ji te re buhayê kîloyek xwê. (Dide Leto û kîsê xwê ji dest wê  
digire.) Şekir jî bi te re tune.

Leto: Berê wa di nav çiçikê diya te de ye li malê, bera bavê te yî bi  
namûs jê bixwe heta bimre. (Hemo diçe.)

Xelefo: (Çavan digre, dev vedike.) Va min girt û va min vekir.

Leto: (Xwê davê devê wî û dimeşe.) Xwê, xwê, xwiya spî weke berfê.

Xelefo: (Dike inte int, dibîne ku Leto diçe, ew jî paş de vedigere.) Erê,  
birrê min, dunya bê evîn şor e şor e, birrê min. Ji xwêya Leto şortir  
e, birrê min. Bê evîn dunya jehr û ziqûm û quzelqurt e, birrê min.

## Dîmenê sêzdemîn

(Xelefo lingên xwe bi dû xwe de dikişîne û bi xwe re dipeyive. Her guhekî xwe cixareyek xistiye pişt. Du cixareyan bi hev re vedixwe. Dûman bi ser serê wî de ketiye. Xamo dixwaze bixwîne, mêş nahêlin.)

Xelefo: Erê berrê min, dunya ev e, cixare ye, ew saet e, ew deqe û kêlik e. Hema te dî ewitî û... çû. Ha ha ha, însan jî wilo çêdibe, yan wek Xamo dirêj dibe, yan jî wek Camo kin dimîne û hêdî hêdî li xwe dişikîne û... vedimire. Cixare ye cixare berrê min. (Hinekî difikire) Erê berrê min, bi Xwedê ji Camo çêtir tune ye ku em ji xwe re qala dunyayê bikin. (Diçe cem Xamo). Merheba berrê min, tu çawa yî Xamo efendî. Ma kesek ji pêvî mêşan derbasî pirtûkxana te dibe? Bi Xwedê xuya ye ez û mêş tenê tèn dora te mamoste.

Xamo: (Bi kêf pê ve radibe û kursî dide Xelefo.) Ka were rûne, were.

*Çibkim ku qewî kesad e bazar*

*Nînin ji qumaşê re xerîdar*

*Ger ilmê tamam bidî bi pûlek*

*Bifroşî tu hikmetê bi solek*

Tu dizanî, Xelefo, sûc sûcê dîrokê ye, filan bêvan, sûcê her tiştî ye, ji rewşa jeopolîtîkî ya welatê me bigire heta rewşa sosyolojîk û filan bêvan.

Xelefo: A, bi Xwedê dîsa ket nav. Ev çi ye îca, berrê min. Jixwe kesî mala me xera nekiriye ji pêvî jeopolîtîk û sosyolojîkan. Van tenê dunya li me kirine tara bêjingê, berrê min. Erê, berrê min, ev dirêjbûna te jî ne bi derewa ye, Xwedê hoste ye û dizane çi dike, berrê min.

Xamo: Ez ji dil dibêjim, Xelefo, sosyologan û filanbêvan gotine mirov heywanekî bi aqil e.

Xelefo: Ev çilo ye îca, berrê min? Heywan û bi aqil ha! Îcar wer û fêm bike îca ha.

Xamo: Lê însanê me, di vê pêvajoya dirêj ya dîrokê de, filan bêvan, nîvê vê peyvê tenê ji bo wî rast e, ha ha ha.



Xelefo: Ê, îcar sosyologan çiyê din digot, birrê min?

Xamo: Erê, filan bêvan, yanî însanê me dixwaze zikê xwe û bin zikê xwe têt bike û hew yanî.

Xelefo: Erê, birrê min, filan bêvan.

Xamo: Yanî însanê me heywan e, an weke heywan e, lê bê aqil e.

Xelefo: Yanî niha tu heywan î, birrê min.

Xamo: Kuro, ji min fêm bike, filan bêvan, ferqa însan û heywan xwendin e. De ka bêje filabêvan kî ji mirovên me dixwîne. Ez tenê dixwînim, ew jî filan bêvan û mêş nahêlin.

Xelefo: Ez ê pirsekê ji te bikim, birrê min.

Xamo: Belê, filanbêvan bila ne dirêj be.

Xelefo: Na, na, birrê min. Tu ne însan î?

Xamo. Belê.

Xelefo: Naxwe tu heywanekî bi aqil an bê aqil î, birrê min?

Xamo: Bi aqil, ji kerema xwe.

Xelefo: Bi aqil an bê aqil, birrê min, yanî tu heywan î?

Xamo: Weleh, xebera te ye. Filan bêvan, eger ez ne heywan bama ez bi dînekî re li ser felsefê dipeyvîm?

Xelefo: A niha ez dîn im û tu bi aqil î, birrê min?

Xamo: Herkes vê yekê dizane filan bêvan.

Xelefo: Erê, birrê min, Xemlê jî dizane. Ji loma Xemlê rojê carekê felsefa te bi sol û şimika xwe dixwîne. Erê, birrê min, dunya jî wek sola Xemlê ye, tim li nava serê mirov dikeve. (Ji ba Xamo dimeşe.) Li vê dunyaya wek sola Xemlê vala û qetiyayî, wê kî yê dîn ji yê bi aqil nas bike, ez ê xelatekê pê vekim, birrê min. Ê, dizane bera bê cem Xelefo, aqilmendê vê sûkê û vî welatî. (Xelefo derdikeve. Xamo vedigere, dixwîne û mêş nahêle.)

### **Dîmenê çardemîn**

(Sîgarê Camo di devê wî de ye. Derî vedike, radihêje qayîşa ku ji bo Cemo daliqandiye û bi nêta lêxistinê berê xwe dide Cemo. Cemo qutifî. Mîna pisîk û mişkekî tirsiyayî li ber hev didin.)

Cemo: Çi bi te hatiye dîsa Camo? Te çi bihîstiye?

Camo: Jixwe ji bo ku ez tişteki nû ji devê tu pîrekan li ser xwe nebihîzim ez ê heqê te bi te dim.

Cemo: Wele, tu çavsoyîyan li min dikî, Camo. Ma ne va ye ez xwarinê ji te re çêdikim.

Camo: Tu sê carî min xwarinê dixwî. Xwe ne tu yê ji min tenê re çêbikî?

Cemo: Ma mêraniyeke yanî ku yek karibe bi jina xwe?

Camo: Hooh, jixwe mêraniya herî mezin ew e ku yek vî zamanî karibe bi jina xwe, ma kes dikare bi pîrekan? Berê tenûr hebûn bêhna xwe li ser tenûran derdixistin, a niha ew jî neman.

Cemo: Karê mala te niha jî ji yê heft malan bêtir e.

Camo: Jixwe di ber re jî jinên vê taxê, eger ez nebêjim yên vî welatî tevde zanin bê şev çi li ser textê me û di bin me de tê gotin.

Cemo: Bi serê te. Bi tirba bavê min. Ev deh roj in devê min venebûye.

Camo: Jixwe ji bo ku heta hetayê, nema devê te vebe, ez dermanê te zanim.

(Bi qayîşê berdide dû Cemo. Ew jî direve.)

## **Dîmenê pazdemîn**

(Li derî dikeve. Xemlê vedike. Kes (1) derbas dibe.)

Kes (1): Merheba.

Xemlê: Ser çavan.

Kes (1): Xamo li mal e?

Xemlê: Na, li kar e.

Kes (1): (Rûdinê) Xamo deyndarê min ê du hezarî ye. Soz da min deh rojan de vegeirîne, va ye bû mehek.

(Dîsa li derî dikeve. Xemlê vedike.)

Kes (2): Merheba.

Xemlê: Ser çavan.

Kes (2): Xamo li mal e?

Xemlê: Na, derbas be, wexta bê.

Kes (2): Xamo deyndarê min ê çar hezaran e. Soz da min deh rojan de bide, va ye du meh derbas bûn.

(Derbas dibe, silavê li yê din dike û rûdinê. Dîsa li derî dikeve. Xemlê vedike.

Kes (3): Merheba.

Xemlê: Serçavan, derbas be Xamo wextî bê. Xamo deyndarê te ye çend hezara ye?

Kes (3): Pênc. (Behetî dibêje).

Xemlê: Pênc hezar ji te deyn kirin. Soz da te ku deh rojan de li te vegeirîne, va ye bû...

Kes (3): Sê meh. Sê meh derbas bûn û soza xwe bi cih nanî.

Kes (3): Te ji ku zanibû? Va ye ciwamêro ji te re jî gotiye, tew min digot qey mesele tevde jibîrkiriye.

(Li cem herduyên din rûdine. Silav li hev dikin. Xemlê ji hêrsan re diheje.)

Kes (1): Yaho mirov vî zemanî nema diwêre qencyê bi tu kesî bike. Weleh mirov nema li birayê xwe amîn dibe.

Xemlê: Xem nake, a niha bê, divê bi hev re hûn heqê xwe jê bistînin, ne?

(Li derî dikeve. Xemlê vedike. Xamo bi lez derbas dibe, komek pirtûk û rojname di dest de ne. Bi kêf tê, Xemlê kêfa wî lê dişkîne. Bi destê wî digire û wî dibe cem mêvanan.

Xemlê: Dîsa pirtûk û rojname û pel mel anîne ji bo xwarinê. Ji her yekî ji we re gotiye deh roj, ê min roj bi roj dibêje sibe ez ê xwarinê bînim malê. Pirtûkan ji min re tîne. Ma ez kirasê xwe bi ser rihê te de biçirînim, Xamo?

Xamo: Hûn tevde çawa gihan hev? Filan bêvan yanî...

Kes (1): Te got deh rojan ez ê vegeirînim, va ye zêdeyî mehekê çê bû.

Kes (2): Yê min du meh bi ser ketin.

Kes (3): Ji xwe yê min bû sê meh.

Xamo: Yaho, filan bêvan, ez ji ber we nereviyame, ez ê bi we dim, lê niha bi min re tune ha.

Xemlê: Tim tune, tim.

(Xemlê, bi mêvanan re êrîş dike. Xemlê destê wî ditewîne. Yên din li bêrîkên wî digerin. Kes (3) pelan ji bêrîka wî derdixîne.)

Kes (3): Ev çi pel mel in?

Xamo: Filan bêvan, ev ne pel mel in, ev helbesteke Melayê Cizîrî ye.

Kes (1): Weleh heqê te lêxistineke baş e ku tu pê re bifire Cezîra Botan.

Xamo: Hûn tevde nexweş in nexweş. Filan bêvan, her yek ji we sed psîkolog jê re divê heta jê fêm bikin.

Xemlê: (Bi sola xwe pê dikeve.) Jixwe ji pêvî quretiyan tiştêk ji te nayê.

Xamo: Ev çi bela ye? Filan bêvan, bela mirov ji ber lingên mirov tê.

(Xamo xwe ji destê wan difilitîne, tevde bera dû didin.)

### **Dîmenê şazdemîn**

(Hemo kumê xwe xwar kiriye û dixebite. Camo li pişt qasê kêfxweş e. Xamo benê sola xwe avêtiye ser qirika xwe. Herdu ferên sola wî bi sînga wî ve daleqayîne.)

Camo: Ev çi ye Xamo, tu çima xwas î, kuro?

Xamo: Min got filan bêvan, bi sol an bê sol, her mirov dikare bimeşe.

Camo: Min zanîbû rojekê tuyê aqilê xwe bixwî.

Xamo: Ma ji ku heye heta ez bixwim, Camo, te serê min xwaro. Tu zanî, Camo, te tim digot filan bêvan, sola te xweşik e. Te çavê xwe berdabûyê. Ez sola xwe difroşim tu yê bikirî?

Camo: Erê, weleh, ev sol hesreteke û di dilê min de ye. Ez çawa nakirim. Ka deyne ser masê. Tu yê bi çiqasî bidî?

Xamo: (Datine ser masê) Hema tu û wijdanê xwe. Bi Xwedê ez zanim wijdan filan bêvan tune ye jî, lê xem nake.

Camo: (Pera dihejmêre û dixê destê wî) Ev buhayê sola herî buha ye li cem me, Xamo, qet xema nexwe û nebêje, birrê min, bi min keniya.

Xamo: (Bi kêf li pera dinêre.) Naxwe ka soleke nû bi van pera bide min.

Camo: (Behetî dimîne). Te go xwas jî dimeşe?

Xamo: Ji kerema xwe re bera sola ku tu bidî min xweş be û bê hestî be.

Camo: Xweş be yan xweşik be.

Xamo: Xweş û bê hestî, nerm nerm wek hevirmêş.

Camo: Bi Xwedê vî zilamî piçka aqilê ku mabû jî winda kiriye. Hemo... Hemo.

Hemo: (Bi lez tê) Weke teyarê ez hatim. Belê, bavo.

Camo: Nimra lingên te çend e, Xamo?

Xamo: Bela xweş û nerm û bê hestî be.

Hem: Tu yê solê bixwê yan bikirî.

Xamo: Ez ê wî di nav serê te de lêxim qemer filan bêvan. (Bi ser Hemo de radibe. Hemo diçe solê tîne.)

Hemo: Ditirsim jina te wê di nav serê te de lêxîne, apo.

Xamo: Kanî pîçê heram. Jixwe ez kêmkî te mame.

Camo: Ka wan pera ka, berî tu xwe ji bîr bikî.

Xamo: (Perê wî lê vedigerîne.) Ji te bi wan têr bixwe. (Solê dixîne lingê xwe. Razî serê xwe hildibe ber bi Hemo de.) Ev pîçê ha? Tu dibê qey bi nimra lingê min zanibû heta ev sol anî.

Hemo: (Ji dûr kumê xwe xwar dike.) Ji xwe, birê min, ma em li vir hêka diqelînin yan kar dikin. Ez li qiyasa serê yekî dinêrim ez dizanim nimra lingê wî çiqas e.

Xamo: (Li serê Camo dinêre). Eger serê min ev be nimre çil û çar e. Naxwe nimra lingê bavê te heftê û çar e.

Hemo: Na, na, ê bavê min lingên wî hemû dirêj in dirêj, ne pan in.

Xamo: Çima çend lingên bavê te hene filan bêvan?

Hemo: Sisê ne, sisê, diya min tim dibêje û lingê wî yê sisiyan ya sitar ji te dirêjtir e.

Xamo: Wele, madem diya te dibêje, filan bêvan, rast e. Naxwe bêje diya xwe bila hinekî jê jêke ha. Bila hinekî kin bike. (...û diçe)

Hemo: Erê, erê, yan jî bera ji xwe re bike têla cilan. Wê rojê têla wê qetiyabû, nizanîbû cilê xwe bi ku de daleqîne.

Camo: Kuro, qurmiçyo, karê xwe bike, karê xwe bike, çêtir e ez te jî pê ve daleqînim ha?

### **Dîmenê hivdemîn**

(Kes (1), (2), (3) xwas in û bi hev re, her yek beşek pirtûk ji pirtûkxana Xamo dibin û komek sol tînin dewsa wan. Dixwazin cihê pirtûkan bikin cihekî solan ji cihê Camo mezintir û firehtir. Hêdî hêdî solên nû ji yên Camo pirtir dibin. Li pêşiya pirtûkxanê Leto û Xelefo digihên hev.)

Xelefo: (Strana xwe dubare dike.)

Leto, Leto, Leto ez mirim.

Por spî bû, te ez kal kirim.

Sebir nema bisebirim

(Leto ji wir de tê...) Ax, ez bimrim, Leto.

Leto: Şekir, şekir ji dimsa Entabê şêrîntir e. Ji birinca Qerejdaxê spîtir e.

Lawik: Xaltîka Leto ka kîlok xwê.

Leto: Kuro, ez dibêm şekir tu dibê xwê?

Lawik: Em bi te re man heyirî. Cara din min go ka şekir tu xeyidî û navê te Letoka xwê ye?

Leto: Tu dizanî?

Lawik: Na, weleh ez nizanim, çi?

Leto: Te çîçkê diya xwe dîtine? Di nav wan de bavê te her roj xwê derdixîne.

Lawik: Ê, bavê min go, xwêya me nemaye!

Leto: Bêjê, bêjê, bê Leto wilo dibêje.

(Lawik nerazî diçe. Xelefo pê ve tê.)

Xelefo: Ax, Leto, ez bimrim. Kî bîra vê dibe îca ha, birrê min, lêvşekirê şekir difroşe. Keçê ez muşteriyê te û şekirê te me, Leto, tu yê kengî fêm bikî?

Leto: Wey, Xelefo, tu jî perê te hebûna te wilo nedigot.

Xelefo, Keçê pere qirêja destan e Leto... Weleh tu min bikî tu qet poşman nabî Leto.

Leto: Ne min got, ma tu yê çî bikî ji min Xelefo?

Xelefo: Na, na, eyb e. Xelk li dora te hene, yan na minê a niha ji te re bigota bê ez ê çî bikim. Mala te xera nebe. Hîn te fêm nekiriye, qey? Wele, ne meseleyeke ewqasî zehmet e, birrê min.

Leto: Ne min fêm kiriye, ne jî dixwazim fêm bikim. Lê tu ji min re nabêjî ev çî dikin? (Li birina pirtûkan û anîna solan dinêre.)

Xelefo: (Li lingên wan yên xwas dinêre.) Evqas solên wan hene û hîn jî xwas in, birrê min. Xwediyên solan xwas in û xwediyên evîne çî ne Leto, hê?

Leto: Jehr û ziqûm in, ez ji ku zanim. Ez li ber vî belengazê Camo dikevim. Wê kî ji nû ve solan ji wî bikire.

Xelefo: Erê, wele Leto, ez jî li ber pepûkê Hemo dikevim ku çawa wê bin kumê wî vala bimîne û rizqê me jî qut bibe Leto.

Leto: Tu çî xwe dixî nav her tiştî lo. Weke kevçiyê nav hemû xwarina ye, ne bi xêr.

Xelefo: Erê, birrê min, (Li Leto dizîvire). Erê dilê min, tenê ji xwarina ku ez dixwazim bê par dimînim.

Leto: (Dimee...) Wey tu têr nexwî, Xelefo, me îro jî tişteke nefiro.

Xelefo: Li vî welatî divê mirov serê xwe bifroşe, Leto, hişê xwe, hiş. (Leto dizîvire, awiran tê vedide.) Erê, eger hiş hebe.

Leto: Ê, ne maşele hişê te bi kîlwa ye! (Derdikeve)

Xelefo: Hiş, li vî welatî wê çî bike? Ne gerek e, birrê min. (Li hersê kesên xwas û tevgera dikana solan dinêre.) Li welatekî wilo baş e ku sola mirov hebe sol. Lê yê min ew jî ji dînekî wek min re ne lazim e, birrê min. (Sola xwe ji lingê xwe dike. Diavêje ji her sê kesan re û diçe). Ez ê ji serê xwe re li solekê bigerim, birrê min.

## **Dîmenê hijdemîn**

(Xemlê li pişt masê rûniştiye. Kêf kêfa wê ye. Xamo li ber agir xwarinê hazir dike.)

Xemlê. Lîlîlî (dilîlîne û bi kêf dibêje) Dawet e li vir îro dawet e. Berî mirinekê wê carekê mêrê min ji min re xwarinê çêke.

Xamo: Keçê wê cîran û filan bêvan bi ser dengê te de bîn porkurê, te em hetikandin.

Xemlê: Cîran neyên jî sibe ez ê ji her kesî re bêjim. Mêrê min dawiya dawî hat ser riya rast. Ez qebûl nakim ji nû ve yek bêje sîka mêrê te xwar e.

Xamo: Ez ji berê de ev im Xemlê, ez ji berê de xwe bi filan û bêvan nadim. Yanî dîkê qenc di hêkê de bang dide ha.

Xemlê: Wey ez qurbana dîkê xwe bim. Ka xwarina te çênebû, ma bû goştê ga?

Xamo: Wê çêbibe, min nizanîbû wê ewqas kêfa te bê, gava ez dev ji pirtûk mirtûkan û filan bêvan berdim.

Xemlê: Wî ma kêfa min tê û hew. (Pê re diçe ji bo maç bike, nagihîje wî. Kursî tîne, hildikişe ser û mirçîniyê ji rûyê wî tîne.) Erê, weleh, dev ji kitêb mitêban berde tê filan bêvan, na. (dikene, dadikeve, diçe cihê xwe)

Xamo: Ne tu zanî Ehmedê Xanî berî zêdeyî sêsed salî çî gotiye li ser pirtûk û solê û filan û bêvan.

Ger ilmê تمام bidî bi pûlek,  
Bifiroşî tu hikmetê bi solek.

Xemlê: De dev ji me û van çîrokan berde, lo. (bi ken) Tu zanî dilê min li Camo jî rehet bû. Ax, Xwedê, tu çiqas baş î. Tu çiqas mezin î û zana yî. Derîkê wî jî hat girtin. Kes nema solan jê dikire û te jî dev ji wî karê bê xêr û bê pere berda.

Xamo: ( Ji nişka ve û bi kêf) Xwarin amade ye, xwarin hazireeee.

Xemlê: (Bi kêf du sêniyan datîne. Nan û hûrmûrên xwarinê ser masê datîne û bi germayî rûdine.) Wî, bila kes nebêje min mêrekî qenc kiriye ji te pê ve Xemlê. Wîîî, çî mêrê xweşik. Bejn zirav. Qurbano beştê mino, mircaq û stûna mala mino. Îro xwarin ji min re çêkiriye, xwarin.

Xamo: (Bi paçik radihêje beroşa germ û datine ser masê, qapaxê hiltîne. Keldûman bilind dibe. Radihêje du çetelan). Tê tiliyên



xwe pê re bixwe hingê xwarina min xweş e. Ev xwarin filanbêvan e, ne henek menekeee.

Xemlê: (Destê xwe bi hev re difirkîne). Ev sê salin min têr nexwariye. Yanî ji gava ku em zewicî ne, şeva ewil ne tê de, jê pê ve, heta niha, min rojekê têr nexwariye.

Xamo: Naxwe niha têêr bixwe. (Bi herdu çetelan soleke kelandî datîne ber Xemlê. Û sola din datîne ber xwe). Min xwarinek li gor dilê te çêkir. Kêfa te ji solan re tê, min jî go...

Xemlê: (Ji cih çeng dibe. Sola xwe ji lingê xwe derdixîne û êrîşî mêrê xwe dike). Erê wele, kêfa min pir ji solan re tê. Nexasim wextê ku li nav serê te kevin. Mircaqê bê hiş. (Xamo direve û piştê winda dibe. Xemlê bêhn çikiyayî û tenê dimîne.) Wî waweylê li şensê te be Xemlê, li bextê te yê reş be. Wey Xwedê te bike du qet Xamo, qetekî hîn jî bilind bike û bibe ezmanê heftan û qetê dî jî di bin heft tebeqê erdê keve. Xwedê mêrê te di kabokê de biqurmiçîne û tu kin kin kin bikî ku tu negihê navika Camo.

### **Dîmenê nozdemîn**

(Cemo diçe û tê. Hemo û Camo rahiştine solan û dikevin hindur. Solên dikana xwe dikişandin malê.)

Cemo: Ev çi sol in, Camo? Çavê te lê ye tu malê jî tije sol bikî?

Camo: Bes e lê, sol bûn, ew jî çûn. Xêr di wan de jî nema.

Cemo: Xêr di te de nema yan di solan de nema.

Hemo: (Kumê xwe hildide û bin dixurîne.) Na, wele. Xêr di wan de nema. (Hêdî, hêdî diçe.)

Cemo: Jixwe tu ji bavê xwe quretîrî wey!

Camo: Qey te bêriya dar kiriye dîsa, Cemo? Bihêle em bifikirin, em çareyekê ji vê rewşa xwe re bibînin.

Cemo: Ma ku sol tiştan çareser nekin wê çi bikin gelo?

Camo: Jixwe yan divê ez cihekî din bibînim, yan jî ez ê malê bikim dikan.

Cemo: Çi, çi? Ka dîsa bêje. Malê bike dikan. Tu çima min jî nafiroşî, Camo?

Camo: (Bi hêrs) Keçê, kes te nakire. Ma hema minê berî çend salan tu bifrota. Wê kî mala xwe xera bike, ma? Wê kî mala xwe li malan bigerîne û te bikire?

Cemo: Ê, ne xem nake, Camo. Heyfa qiriktaliyê.

Camo: Ev bela hemû sûcê zimanê te yê dirêj e û sûcê Xamoyê dirêj e. Hûn herdu jî ji pêvî zirarê, bi kêrî tişteki nayên.

Cemo: Em ê bê sol çawa bikin Camo? Em ê ji nêza û birçîna bimrin.

Camo: Na, na baş e. Carna serê te dixebite. Baweriya min jî ew e ku hêviya me di vê jiyanê de sol in, sol in sol.

(Ji nişka ve soleke mezin di pencerê re kete hundir.)

Cemo: Sol e, sol hêviya me ya dawî.

(Camo û Cemo bi hev re mîna ku li hêviyeke dûr binêrin. Çar çavên matmayî û bi hesret li sola bilind dinêrîn. Sol dikeve navbera herduyan.)

### **Dîmenê bîstemîn**

Seranserê cihê pirtûkxaneyê sol in. Tevgerêke bi lez û bez heye. Xelk hemû xwas in. Solan dikirin û difiroşin. Hinekan solên xwe bi qeytanan girêdabûn û bi ser sîngên xwe de berda bûn. Muzîk û stranên li ser solan dihatin bihîstin. Li kêlekê du lingên hildayî, yên jinikê ku sola mêran di lingan de ye, tên dîtîn li ser 'solên welat' bi xeteke qalind nivîsandiye. Xelefo vaja vaja dimeşe.

Xelefo: Erê, birrê min. Zeman zemanê sola ye. Ê ku sola wî tunebe ji xwe tirên panikî li diya wî qelibî. Dunya weke xwe ye, birrê min. Em jî sol in. Zeman me dixîne lingê xwe de heta em kevn dibin û piştê... ji xwe sola kevn, kevn e û ji avêtinê re ye. (Leto dibîne) Ma ne wilo ye, Leto? Ax, ez bimrim, Leto, ax.

Leto: Ma çawa ne wilo ye, Xelefo. Gotinên te zêr in zêr.

(Lawik ber bi Leto ve tê. Leto bi hêrs lê disekine.)

Lawik: Xaltîka Leto, tu şekir difroşî yan xwê?

Leto: Çima qey çî ji bavê te re lazim e.

Lawik: Şekir, bavê min go şekirê me nemaye.

Leto: Naxwe ez xwê difroşim.

Lawik: Ê, xwêya me jî nema bû. Ka nîv kîlo xwê.

Leto: Naxwe ez şekir difroşim.

Lawik: Ê, ka nîv kîlo şekir.

Leto: Ez guharan difroşim. Guhar ji bavê te re ne lazim in.

Lawik: Berê wele, ji diya min re lazim in. Duh diya min digot, bavê te bêyî min guharê min firotine û dane deynan, deyn li bavê min bûn.

Leto: Kuro, here bi riya xwe de çêtir e ez kerbê xwe di serê te û bavê te re derxim.

Xelefo: Ê, fêm bike birrê min. Jinik tiştêkî ne dide te û ne jî dide min.  
(Bi destê lawik digire û lawik xeyidî diçe.)

Lawik: Ev çi bi vî xelkî hatiye yaho.

Xelefo: (Li solan û tevgera ji bo wan dinêre ). Te jî solek navê Leto, hê? Ez solekê ji te re bikirim?

Leto: Jixwe ji van xelkan tevde ez bi sol im. Ha wa ye tevde xwas in.

Xelefo: Ê min jî, dilê min xwas maye, Leto. Heta kengî wê... ax, ez bimrim, Leto.

Leto: Naxwe ji dilê xwe re li solekê bigere. (Û diçe. Hemo tê.)

Xelefo: Ha, birrê min, bavê te û solên xwe li kû man, lo?

Hemo: Li mal e. Ez li ber xwe û te ketime berî bavê xwe. Rizqê me jî qut bû.

Xelefo: Erê, birrê min, bin kumê te jî, berê tim bi pere bû, a niha vala ye.


Hemo: Na, Xelefo, ez birakê te me. Na çêdibe kumê min vala bimîne.

Xelefo: Ka were vir de ka. (Kumê wî bilind dike sol xuyanî dike.) Erê birrê min kumê te mabû, va ye te ew jî ji solê bêpar nehişt.

Hemo: Divê mirov li xwe neheyire Xelefo. Vî zemanî yek bi kêrî xwe neyê wê li ber lingan here, birrê min. (Ew jî diçe, xelefo tenê dimîne. Li derdorê dinêre. Leto tenê bi tirs ber bi wî ve tê, dinya xeniqîbû, rûyê ezmên tirs bûbû.)

Xelefo jî behetî mabû. Xelk tevde xwas li bin guhê hev diketin. Ji bilî solan jî li wê derdorê tişteki xuya nedikir. Jinên xwas, mênên xwas, zarokên xwas destên xwe dipelandin û mîna koran li pey solan dibezîyan. Ezmanê wî bajarokê biçûk ji vê dunyaya fireh û bê dawî reş bûbû wê rojê. Teqereqa ewran xelk xistibûn nava saweke mezin de. Cara yekem bû ku Leto weha xwe dixîne bin baskê Xelefo yê şaş mayî. Herkes bi xwe daketibû, ew jî bi evîna xwe, wê rewşê dirêj nekir, ji nişka ve bû reperepa solan û ji ezmanan ve hatin xwar. Xelkê, destpêkê ji çavên xwe bawer nekirin, lê dema xirecir, lez û beza kolanan naskirin ku ji dêvla baranê ve sol dibarin. Solên reş, kevn, nû, biçûk, mezin, qetyayî, bi qeytan, bê qeytan. Tofana solan bû, kolan û mal û seriyên mirovan jî tevde winda kirin. Herkesî li ber xwe dida, da ku karibe serê xwe ji nav solan derxîne, lê her seriyek di bin sê hezar lib sol de mabû.


ÇÎROKÊN HELÎM YÛSIV ÊN KU  
JI PEYWENDÊ DERKETINE



“Cîhana Helîm Yûsiv a ekspresyonîst, cîhana nakokî û paradoksan e, cîhana xewn, binhişî û taswaseyê ye. Ji aliyekî ve realist e û ji aliyê din ve surrealîst e. Nivîskar wan aliyan ji realîzmê dibe, ew ên ku xizmeta mecaz û fantazyên cîhana wî dikin, wisa jî dest davêje wan aliyan surrealîzmê, ew ên ku xizmeta nakokî û paradoksên wê cîhanê dikin.”

Ji pirtûka *Cîhana Helîm Yûsiv a Expressionismî*  
ya Mihemed Mihyedîn Mîno, Sûriyê, 2004

ÇÎROKÊN HELÎM YÛSIV ÊN KU  
JI PEYWENDÊ DERKETINE




“Di *Mêrê Avis* de Helîm Yûsiv heykel û avahiya çîroka kevneşop dirûxîne, wan çîrokên ku tişteki li çîrokên heyî zêde nakin, li paş xwe dihêle û çîrokeke nû ava dike.

Selah Dawud-El-Isbû El-Edebî,  
hejmar 317, Şam, 1992

“Di *Mêrê Avis* de Helîm Yûsiv karekterekî nû derbasî nav cîhana çîrokê dike. Ev karakter ji karakterê sofiyê ku em wî di çand û wêjeya erebî de nas dikin, pir cuda ye.”

Ehmed Umer,  
rojnameya El-Îttihad a Îmaratî, 1992

ÇÎROKÊN HELÎM YÛSIV ÊN KU  
JI PEYWENDÊ DERKETINE



“Di pirtûka *Mirî Ranazîn* de mirî xweşik in, siwarê ku dijî ajovan derkeve guhê wî jêdibe, ciwanek gava ku can dide, namire, dibe çiyayek û roj bi roj çiyayên vî welatî zêdetir dibin, sînor mirovan dixwin, dil bê derî ne, mejî di tehtîlê de ne, reşikên şevê xwe li şermola, goristana Amûdê digrin. Şermola berfireh dibe, dibe welatek û li vî welatî dîn komaran ava dikin... Pê re jî çîrok kirasên nûjeniyê li xwe dikin û berê xwe didin jiyanê.”

**PEYWEND**

Tel: 0532 176 93 64

e-mail: [peywend@hotmail.com](mailto:peywend@hotmail.com)

[www.peywend.com](http://www.peywend.com)

[www.facebook.com/wesanxaneyapeywend](https://www.facebook.com/wesanxaneyapeywend)

[www.twitter.com/peywendkitab](https://www.twitter.com/peywendkitab)